**Mihemedê Mele Ehmed**

# XOYBÛN

## Civata «Serxwebûn» a Kurdî

## (1927 - 1946)



wergerandina

**Keça Kurd**

**Mihemedê Mele Ehmed**

# Xoybûn


## Civata «Serxwebûn» a Kurdî
## (1927 - 1946)

**Wergerandina**
**Keça Kurd**

**çapa yekê - Şam**
**1500. 1. 1993**

**ji weşanên Kovara «Zanîn» - 7 -**

**Sûriya - Qamişlo**



Durişma cıvata xoybûna Niştimanîya Kurdî

# Pêrist


- pêşgotin — 6
- Beşê yekê
Komelê Kurdistan Li dema Osmanîyan — 12
1 - ji rexê Siyasî — 14
2 - ji rexê abûrî — 24
- Beşê dudoyan:
civata Xoybûnê «Serxwebûn» Çirîya pêşî /1927/
- Despêk: — 30
1) - Qûnaxa darê siltan Evdilhemîdê didoyan. — 33
2) - Qûnaxa darê «Ettîhad û Tereqî» ya Tirkî — 36
3) - Qûnaxa darê Mistefa Kemal. — 39
- Serhildana Sasonê — 48
- Xoybûn — 58
- Çawa civata Xoybûnê Çêbû. — 61
- Damezrênerên Xoybûnê. — 66
- Biryarên Komgira damezrandina civata Xoybûnê. — 72
- Li ser cihê girêdana Komgirê. — 75
- Tevgera Xoybûnê: — 77
1 - Şoreşa Agrî «Erarat» — 86
2 - pirojeya Şoreşekê ji başûr — 93
- Destpêkirin — 98
- Gunehkarîyên toranîyan di pey herivandina Şoreşê re — 100
- Navneteweyîya dudoyan û kêşa kurdî — 115
- Şêx Evdirehmanê Garisî — 120
- Nelevkirin û guherînên di hundurê civata xoybûnê de Çêbûn — 130

- civata alîkarîya belengazên Kurd li Hisiça —— 140
- cevangeha (Nadî) Amûdê —— 141
- Nadîya Kurdistan li Şamê —— 143
- Toşa Amûdê. —— 144

# PÊŞGOTIN

Dîroka Kurdan a nû, xebata wan a bêvebir, dîroka serhildan û şoreşên waye. Ev nêzîkî du sedeyan heye ku tevgera azadî xwazî bê rawestan dibizive. Raste li destpê kê bîreke neteweyî rastûrê nebû û ji xwe radibûn û serê xwe ji darê dijmin re ne didanîn. lê di pey re tevgera wan bi pêş ve çû, serhildanên gelêrî rabûn û ev serhildanên ha ferehbûn û li çarkenarên Kurdistan û li ser kopên bilindên çiyayên wê agirê şoreşan pêxistin. Belê yek li pey yekê diherivîn û di bin pêyên sitemkaran de dipelixîn. Ji ber ku mercên alîkarî ji serketina wan şoreşan re peydanebûbû.

Û dîroka gelê mr hrwekî me got ku dîroka tevgera me ye. Û min ji ev karê ha kir da dîroka yek ji van tevgeran ku parçek ji tevgera azadîxwazîya kurdîye, ronîbikim û min xwest dîroka gelê me a xebatgêrî di tevgera (Civata Xoybûnê) de bidim xuyanikirin, ewa ku di maweya (çaryeka didoyan ji vi sedî) bi tevgereka siyasî û şoreşgêrî rabû û kartêkirineke baş li ser tevgera me a giştî hebû.

Û ji bo nivîsandina dîroka tevgerekê, pêdivê ku nivîsname û belgenameyên bi wî babetî ve girêdayîne hebin. Û min di vî karê xwe de, li ser (Civata Xoybûnê) bi hoya nebûna nivîsname û belgenameyan, renckêşî dît.

Li dawîyê û piştî ku min hinekî xwe westand û bi dîkarîya heval û dostan, ez bi ser hinek nivîsname ve bûn û min palda ser wan, da ez şopedîroka vê civatê rûnîbikin.

Di sala /1970/ de min xwest ku bi vî karî rabim û dîroka - Civata Xoybûnê - binivîsim û min peywendî bi hinek ji pêşewayên (Xoybûnê) re kir ku wê çaxê saxbûn, ji bo pêkanîna vî pirojeyî, min alîkarî ji wan xwest. Mixabin ku kes alîkarî bi min re nekir. Û ev nivîsnameyên ku niha peyda dibin, li wê çaxê nebûn. Ji ber vê yekê destê min lê sistbû û ez rûniştim. Nemaze, bilî wan kesên ku havpişkî di serkêşîya - Civata Xoybûnê - de kiribûn, tutişt nebû weku serçavîyek piştpêgirê dim.

Ev babetê ha bi vî rengî di bîra min de ma, ta ku li dawî min karî çend nivîsnameyek peydabikim û di rêya wan de min karî ez vî babetî - Dîroka civata xoybûnê - binivîsim. Û ji van nivîsnameyan:

1 - Bîranînên Qedrî begê Cemîlê paşê binavê (Di rêya Kurdistan de, Zinar Silopî). Ji weşanên civata Kawa a roşenbîrîya kurdî, çapnama Darilkatib, sala /1987/.

2 - Bîranînên mela Ehmedê Şûzî, bi zimanê kurdî (nehatîye çapkirin).

3 - Hin ji danraweyên ku li ser kêşa kurdî derketinę û li ser Civata Xoybûnê di nav de heye.

4 - Çavpêketin bi hin ji wan kesan re, ewên ku di nav bûyerên xoybûnê de bûn.

5 - Di vê maweya dawî de pertoka (Serhildana Agrî)

bîranînên Ihsan Nûrî paşa, derket.

Wergerandina Selah Berwarî.

Em dikarin bêjin ku - Civata Xoybûnê - a dawîbû ji civat û partîyên Kurdî ên siyasî ku di rêxistina xwe de li ser rêbazeke teqlîdî a kevin diçû. Yanî civata ku paldabû hin ji wan kesên xuyayî û her yekî cihê xwe di nav komel de hebû, wek: Serokên eşîra, Zilamên ayînî û roşenbîrên Kurd û ewên ku ji malmezinan bûn (ji malbatên xuyakirî).

Xoybûnê binkeyeke civakî wekû niha li rex me hatîye naskirin, nebû. Binkeya vê civatê ji serokên eşîra û malmezinan pêkhatibû. Eger pêşekêşên wê dostanî bidana serokê eşîretekê peyayên eşîrê bi çekên xwe ve hêzek pêktanîn û lagirîya civatê dikirin. Û ew eşîret li ser hêza civatê dihate hejimartin. Belê evaha ji li gora berjewendîya serokê eşîrê û guherînên bi ser pirgala wî de rûdidan. Û mînek li ser vê yekê pirin.

Û mîneka li vekolîna me nêzîk, xwe karkirina serkirdayetîya civata xoybûnê, gava xwestin ji xwarê Kurdistana Tirkîyê, ango sînorê (Tirkîyê - Sûrîyê) agirê serhildanekê pêxin. Divîbû serokên her herêmekî rê li pêşyê xwe vewejêrê, di nav serokên eşîran de dostan peydakin û pêkhatîbin, piştgirîya şervanên Kurd bikin, ewên ku ji Sûrîyê dê rabin. Lê mixabin gava zengilê şer lêda serokên eşêra, xwe kerkirin. Ekremê cemîlê paşê, (jibo mînek) rabû û pêre Qedrîyê Cemîlê paşê berbi Tirkîyê çûn, da êrîşbikin ser bajarê Mêrdînê û herêmê wê. Serokên eşî-

ran ewên ku berê bi bev re sozdabûn, kes nehate cevanê xwe.. Tenha mirovek hat da ji wan re bêje ku kes alîkarîya wan nake û hemî ji gotina xwe vegeran. Û eva ha ji hişt ku ew şivîla wan ji xwe re danîbûn neçû serî. Û berê şer yê ku ji serhildanê re bijartibûn şikest û jibinî herifî. Paşê ew kesên ku bi serkêşîya şer rabûbûn kuçê xwe di ber xwe de berdan û bi şûn de li melbenda xwe a pêşî vegerhan.

Ji ber ku Serok û mezinên eşîra û ew kesên bi kar rabûbûn di Kurdistana Tirkîyê de, hilanîn û danîn, dîtin ku hisabê mal û bazarê (Sûkê) li hev dernakeve.. bê çi ji civata xoybûnê re gotibûn û çi soz dabûn jê vegeran û bê ku bîr li wê bikin ku şoreşek heye û çarenûsa hezaran xelk, pêve girêdayîye, weku li ser agirin, çavenêrî encamên tevgera xwe dikin, hêvîya wan heye ku barê welatê xwe pê biguherînin.

Mixabin ew şivîla kevnare ya ku civata xoybûnê di pêkanîna hêzên xwe de, ji çek û peya bikarani, hokarekî serekî bû, hişt ku şoreş sernekevê û agirê wê vemire.

Piştire, ji bo lêgerîna li - civata xoybûnê - vekolînek li ser peywendîyên - civatê - bi partîya Taşnaka Ermenî re pêdivê, ku çi roleke bikêr û giring di xebata - xoybûnê - de hebû.

Û tişta ji mere hatîye xuyakirin: ev peywendîya ha gelek xurtbû' li radeyekê em dikarin bêjin ku hemû ew biryarên çarenûsî yên - xoybûnê - wek: damezrandna wê û pêxistina agirê şoreşê, destekî Ermenîyan ê bilind tê de hebû.

Ez lêgereham, min xwest ku vê peywendîya ku li navbera rêkxirawên Kurd û Ermenîyan ku şûnkarekî çarenûsîbû ji herdû gelan re; li ser astê sijasî û di maweya sed salî de, baş bêxim rû.

Herweha ew rola herivênî ku dardestên Osmanîyan û dewletên Evropî pê radibûn.. nepakî û jehra dijminahî di coka biratî de dirijandin da werîsê wê dostanî û cîrantiya dirokî a dirêj bibirin.

Û li dawîyê ez supasîya hemû dost û hevalên xwe dikim ewên ku arîkarîya min kirin di vî karê piçûk de ji dîroka gelê me a xebutgêrî.

Mihemedê mela Ehmed

# BIRÊ YEKÊ

# KOMELÊ KURDISTAN LI DEMA OSMANIYAN

Kurdistan - welatê Kurdan - ya ku di roj helata - navî de cihekî cuxrafi, siyasî giring heye. Bi çiya, deşt û newalên xwe ve hemû bi samanên xweristî gelek dewlemende wek: Nift, hasinê xav, kûmira kevirî, fosfat, risas, zêr, zîv, zernîx û komir... t.d.

Bilî vê jî sedema ku Kurdistan li ser rêya baziraganî a kevin, li navbera rojhelat û rojava diket, dibû cihê gelek pirojeyên dagîrkerî. Ev cihê giring, ev samanên xweristî ên zehr, hiŝtin ku Kurdistan di nav xîşkebazên koledarî de giringîyeke mezin bigre. Û ew dewletên ku tihnîyê serdestî, dagîrkerî û sûdmendîya xwe bûn; av bi devê wan diket.

Ji vî cihê (ciyo - siyasî) giring ta ji me bêt emê komelê Kurdistanî ji gelek layan ve vekolin.

Şerê (çildêran) yê ku li /23/ yê·tebaxê li sala /1541/ an, li navbera şah simayilê sefewî û siltan Selîmê yekê ê Osmanî ku çêbû, di diroka Kurdi de gelekî giringe. Çûnke di pey vê bûyera dîrokî de guherîneke mezin bi ser komelê Kurdistanî de hat.

Di pey vî şerî de Kurdistan li ser du parçeyan leva kirin:

1 - Parçeyek sefewîyan destê xwe danî ser û kete bin darê dewleta Farisan.

2 - Parçê diduyan Osmanîyan destê xwe danîne ser û kete bin darê dewleta wan.

Di rêkevtinekê de ku li navbera Osmanîyan û sefewîyan li sala /1639/ an, di navbera siltan Miradê çaran û şah Ebasê sefewî de hate morkirin.

Di vê lêgerînê de ta ji me bê em dê komelê Kurdistanî ji rexê abûrî, civakî, siyasî, bi kurtî bidin naskirin. Ev lêgerîn ji demê levakirina Kurdistan a pêşî ve destpê dike û ta naverasta sedê nozdehan dê bigire. Herçende ev lêgerîna ha giringî dide bi wî rexê dikeve bin darê dewleta Osmanî û li gora ev lêkolîn bidê xuyakirin bi wî rengê ku gelê kurd hemûyî bigre, yani rexê dikeve li bindarê Farisan jî her bi vî awayî bû, sedema ku rewşa komelê Kurdî li her du rexan wek hev bû.

# REXÊ SIYASÎ

Piştî şerê (çildêranê) li roja /23/ yê tebaxê ji sala / 1514/ an gava siltan Selimê yekê ê Osmanî û şah Simayilê Sefewî Kurdistan di nav xwe de levakirin.

Ev levkirin di rêkevtinekê de li sala /1639/ an di navbera Şah Ebasê Sefewî û siltan Miradê çaran ê Osmanî de biryar pêdan û bû rastîyek. Ev jî li pey tevgereke bê vebir ji her du rexan, her yek ji wan dixwest ku Kurdistanê gişî dagîrbike.

Lê gelo herdî dewletan dikarîn birastî Kurdistanê li bin darê xwe kin? Û komelê kurdî bi xwe bindarîya wan dikir? Yanî çil û şeş /46/ Mîrnişînên kurdî (yên ku berî levakirina bi destê Osmanî û sefewîyan ku Kurdistan ji wan pêk hatibû, herwekî Mihemed Emîn zekî di dîroka kurd û Kurdistan de dibêje). Herweha hemû serokên Qebayil û eşîrên Kurd, serê xwe ji darê wan re danîbûn? Em bawer nakin... çunke li encamê ravekirin û lêgerinên rojhelatnas û zanûyan li ser komelê Kurdistan di wê quanaxê de kirine, jê ve nexuyaye. Ji ber ku em dibînin bihtirên serokên Qebayil û Eşîrên Kurdan wek xwe man û li tevger û guhestinên xwe, di nav herdû parçên Kurdistanê de serbest bûn û di herdu dewletan de li gora berjewendîya xwe peywendî peyda dikirin û bi heve girêdidan.

Herdû dewletan hêvîyên xwe bi Kurdan ve girêdidan, herwekû (celîlê celîl) dibêje: «çunke hêzeke çekdarî xurt hebûn û destê wan dirêjbû dikarîn ziyanê bigehênin vî rexî yan wî rexî».

Bi xurtî li dostanîya wan digeran û gelekî giringî bi layengirîya Kurdan didan. Nemaze dewleta Osmanî. Sedema vêye em dibînin siltan Selîmê yekê şêx Hekîmedînê Idrîsî yê Bedlisî rêdike ji bo rewşa birêveberî di Kurdistan de rêkbixe û serokên Qebîle û Eşîrên bi dewleta Osmanî ve girêde. Û di rêya peymanekê di nav kurd û Tirkan de ku bi /23/ ê Mîrnişînên kurdî re girêdan. Li gora Basîl Nîkîtîn dibêje û wijî ji rex «Biriston» guhestiye.

Mihemed Emin zekî di pertoka xwe de «dîroka kurd û Kurdistan» dibêje: «Gelek bi dijwarî û piştî westeke mezin (Idrisî) karî vî welatê asêgeh bêne rayê, û kurd serê xwe bikin dibin îdarû dewleta Osmanî de û ji ber vê bû neçar bûn dam û dezgayeke birêveverî, serbi xwe ji dewleta Osmanî cihê, di Kurdistan de damezrênin». Herweha Mihemed Emîn Zekî dise dibêje, Hekîm Idrîsî bi navê siltan ji serokên Kurdistanê re gelek soz dan û peyman name nivîsîn ku van xalên xwarê bi parêzin:

1 - Parastina serbixweyî û serbestîya Mîrnişînên Kurdî.

2 - Mîrnişînî «malbatî» pêmayî be.

3 - Di şer de kurd arîkarîya Tirkan bikin.

4 - Eger ji derveyî Tirkiyê êriş hatin ser kurdan tirk piştgirîya wan bikin.

5 - Kurd bêşû «sedeqeyên xwe bi diravgeha Osmanî «Beytilmal» bidin.

Hekîmê Idrîsî karî Mîrek û serdarên kurd ji bajarê Wanê ta bigyhê pişt Meletiyê û paşê giha Şehrzorê ev hemû bi Osmanîyan ve girêdan.

Em dibînin ji bo rêkxistina birêveberîyê di Kurdistanê de û girêdana wê bi dewleta Osmanî ve bi rengekî xurt; Kurdistan bi ser çend welayetan levakirin û ji wan Welayetan: Welayeta Diyarbekirê ya ku nozdeh /19/ senceq bû. Yanî Mîrnişînên Kurdî pêmayî bûn. Heft Hikumet hebûn, û bi siltan ve girêdayî bûn. Her hikûmetek ji wan Mîrê Mîran hikim lê dikir û di karên navxweyî de ser bixwe bûn û ew Hikûmet, evên ha bûn:

Hikûmeta Ekîl, hikûmeta Palo, hikûmeta cizîra Botan, hikûmeta Hezo, hikûmeta Kinc, hikûmeta Xabûr, û hikûmeta Elşkurd.

Herweha Wilayeta Wanê li ser /37/ senceqan parkirin û Mîrnişînên kurdî pêmayîbûn. Çar hikûmet jî hebûn û ewjî evên habûn: Hikûmeta Hekarî, hikûmeta Bedlîsê û ya Mehmûdî «di rojhelatê Wanê de» û hikûmeta Binayaniş di rex hikûmeta Mehmûdî de bû.

Herwekû Emîn Zekî dibêje ku hin ji van hikûmetan wek: «Hikûmeta Bedlîsê, hikûmeta Amêdîyê û Hekarî» bi temamî serbixwebûn û bi Asitana ve ne girêdayî bûn. Lê em dibînin li ser gotina kendal, pirofêsorê Tirkî (sirivtan toran) dibêje ku duwazde /12/ navçeyên birêveberî, yên kurdi «Kurd hikûmetlerî» dihêjmêre û ji wan: Sêzer,

Hêzo, Ikîl, Betlîs, Hîzan, Hekarî, Mehmûdî, Şehrzor û Meyherêxane, Yamadya, Astê, Tersê, Meyherîbiyan.

Belê hin ji wan di rêxistina karên navxweyî de gelek fereh kirin û di çarçêweya dewleta Osmanî de gelek serbest dijîn. Û hin ji wan, gihane radeyek ku pere jî li sekeh dan û di xwendinnama roja înê de navê wan dihate xwendin û gelek, huhdane pirgala gelê xwe û pîşesazîyê taybetî ji xwe re damezrandin. Belê dîse di rûyê siltanê Osmanî de neçarbûn ku ji sînorê derebegîya xwe dernekevin. Li dijê siltanî pişta hev ne girin û arîkarîya hev nedin (wekû kendal dibêjê).

Me dît, li tenişt wan hemû Mînişînên ku me navên wan bir, gelek mîrnişînên kurdî hebûn û serbixwebûn û li radeyek bilind bûn, wek; Mîrnişîna Serdarê Mukrî û Mîrnişîna Rewanduzê û Mîrnişîna Hekarîya û ya Behdînan û ya Botan û yên din.

Li ser vê yeka ha Efriyanof dibêje: «Piştî demek pêve çû Kurdan karîn di astek bilind de xwe serbestkin û ji bin darê Firs û tirkan xwe rizgarkin, nemaze Kurdên ku dibin destê tirkan de bûn».

Û ji vir em dikarin bêjin derebeg yan serokên mezin gava di xwe de xurtî didîtin û di dijminê xwe siltan de lawazî didîtin, serhildanek çekdarî aşkere dikirin ya ku bi xwe armaca wan du tiştbûn:

1 - Derbeg, serokên qebîle û eşîran dixwestin mafên xwe yên ku bi destê siltan hatine xwarin bistênin, çunke siltan herdemê dixwest sînorek ji wan mafan re deyne.

2 - Derebegên Kurd «paşa, beg» di nav komelê kurdî de xwe ji telaşê têgehiştî didîtin, liber bayê kartêkirina bîrên Evropî û xebata gelên din yên ku ji bo serbestî û rizgarîya xwe dikirin. Herweha hest bi wê kiribûn ku dibin zordarî û çewandineke neteweyî de dijîn û pêdivê xwe ji bin vê sitemê rizgarkin û ji wan re belo bûbû û hest pê dikirin ku ew ji tuxmekî dîne û ne ji tuxmê gelê tirkin. Û ji mafên waye dibin siha dewleta xwe a serbixwe de serbest bijîn û bi vêya ha serhildana derebeg jêre du destxist pêk di anîn:

1 - Berjewendîya wî a derbegî.

2 - Dewleta wî a kurdî û neteweyî «eger em bikarin bêjin» di komelekî derebegî de wekû dewletên wê demê di deverê de. Çunkî burjewazîya kurdî hîn mercên geşbûna hebûna wê pêk ne hatibûn.

Bi vî rengî em dibînin serhildan, yek di pey a dî re agir pêdixistin û li dijê dewleta Osmanî bizava kurd xurt dibû. Û gava komel pêşdikeve û bi rexê sermeyedarî de diçe hestê neteweyî belo dibe û bihtir gurdibe. Xebata gelê kurd jî rengê xwe yê neteweyî ê roşin girt, nemaze di şoreş û serhildanên ku li sedê nozdehan rûdan. Taybetî nivê diduwan ji wî sedî. Ta ku em digehin sedê bistan. Di vê çaxê de berberîtî di rûyê rojê de xuyaye. Û li navbera du neteweyan, neteweyekî biçûk «Kurd» ku dixwest hebûna xwe dîberke, bi destxistina mafên xwe yên neteweyî badikir. Herweha jibo dewleta xwe ya azad kardikir. Lê neteweyê mezin ku tirke dixwest neteweyê

biçûk tevlî xwe bike û di qewara toranî de biheşêfe.

Di gura vê berberîyê de, em dibînin ku roşinbîrên kurd roleke wan a mezin hebû «ew bixwe zaroyên van derebegan bûn û dewlemendên bajêr û hin ji wan rihsipîyên qebîlan» ewên ku di nav dilê tevgera xebatgêrî de bûn. Çunke bi bîrên azadîxwazî yên Evropî re peywendi her hebûn û pêre avcobûn.

Em dibînin ku wan gelek dixwest ku di singê de serkêşîya tevgera kurdî û serhildanên wê bikin, belê di nav komelekî derebegî û eşîrtî, nepêşketî de. Rola burjiwazî a xurt û benkêş nebû ji lewra rê bi wan ne didan ku bi tena xwe serkirdayetîya tevgera kurdî bikin. Ji ber vê bû serkirdayetîya bizava neteweyî a kurdî bi serokên din re havpişkî dikirin û rola wan tenha agir tevdan û geşkirin û şarandin û perwerdekirin bû. Lê kargêrîya rastî û biryara çarenivîsî herdem vedgera ser serokên eşîrê, tîre û hozan. Herweha zilamên ayînî ji rola wan hebû. Sedama vê bû neserketina serhildanan bi serokên wê ve girêdayî bû. Bi çûna serok, serhildan dişikest an jî eger şerokê eşirê pişta serhildanê an ya şoreşê ne digirt, komelê hoz û eşîrê hemû li tayê serokê xwe radiwestan û arîkarî bi tevgerê re ne dikirin.

Serhildan û şoreşên gelê me bi vî rengî û di vê rewşê de man. Ta sihan ji sedê bîstan, gava rêkxirawên gelêrî xuyabûn û bizivîn û xwestin naveroka tevgera neteweyî a kurdî biguherin.

# REXÊ CIVAKÎ

Li encamê parçekirina Kurdistanê di sedê şazdehan /16/ de, li rêkevtina ku li navbera herdu dewletan (Osmanî û sefewî) li sala /1639/ di Qesra Şêrîn de hate morkirin.

Me dît ew xîşke sînorê ku Kurdistan kire du parçe nekarî wek dîwarekî di singa hozên kurdan de raweste û nehêle, çûn û hatin bikin yan jî nehêle li navbera çêregehên zivistanî û yên havînî «zozan û germîyan» xwe biguhêzin. Tire û hozên kurdan ji bo çêregehên xwe ketin singa herdu dewletan û şerê wan dikirin, çunke di wan deveran de ji berpirsiyarên cih re ji fermanên wan re serê xwe ne danîn. Herweha li herdu rexên sînorî, hest pêdikirin ku di welatê xwe de dijîn, herwekî «taylor» qunsilê ingilîzî li rojhelatê tirkîyê dibêne: «... li herdu parçên kurdistanê wekû di welatê xwe de ne, kengî dixwazin sînor dibirin, li gora dibînin û li gora bi berjewendîya wan re rêdikeve».

Lê belê tu pêneçû gelek ji tîre û hozan cihgîrbûn (Dêmanî) û hin ji yên din li ser herdu aliyên sînor li nav herdu dewletan koçer man û hinê din bûne bi du bir, wek: celalî û şikakî û hevgirtina cafan.

Osmanîyan ji eşîre û hoz û tîreyan re zevîyek fereh terxan kirin; ji bo çêrîya terşê wan û pêwistiyên çandinîyê hemû ji wan re amade kirin û eva ha jî beramberî

wan zevîyên ku li rexê wîlalî sînor mabûn û ji bo eşîr li ser wî zevîyê ku dewletê jê re terxankiribû rûne û cihbigre û ji wir, bi karê xwe rabe û ji dewletê re sînor bi parêze. Dardestên Osmanî li gora dilê wan dixwest, rengek birêveberî rêxistin û ji destpêkê gava ku xwestin van eşîran bi dewleta navendî ve girêdin.

Ev kargêriya ha, gavek bû di rêya guherîn de. Û dev ji jiyana koçerî û guhestina herdemî berdan û bûne dêmanî, çandinî kirin, li gel xwedîkirina pez û dewaran.

Eva ha jî hokarekî arîkarîbû ji bo ragirtina sitûnên derebegî di kurdistan de, li sedê şazdehan /16/. Peywendiyên derebegî belobûn, herwekî Dr. Qasimlo dibêje. Di komelê kurdî de despêkir ji berê bihtir û bi rengekî eşkere guhdane çandinî. Û pêre xwedîkirina pez û jiyana koçerî jî dikirin. Weha lê hat ku hoz û tîreyên kurdî ji berê gelektir guhdane çandinî, nemaze piştî ku bûn dêmanî û cihgirtin. Li deşt û newal û di pêpelûkên çiyan de çandinî dikirin, ta ku dibû demê guhestin; bi ajelên xwe re koçdikirin, diçûne çêregehên çiya (Zozan), paşê vedigerihane germiyanan ji bo çandiniya xwe biçinin û berhevên xwe hilênin.

Serokên hoz û tîran bûne derebegên mezin, zevîyên ku yên eşîra derebeg bûn, hemû pê man û bi kotekîya xwe ferehdikirin. Bilî vê jî hin caran wekû perûwek ji derebeg re parçe zevîyek diyarî dihat, ev jî bi yên pêşî hemû ji wî re diman, diçand û li gor ku dixwest ji xwe re bi kardanî. Herweha şivanê kurd ew jî dibe cotyarekî

biçûk û parek ji berhevên xwe bi serokê eşîrê dida. Bi vê ya ha cotyar ji rexê serokê eşîrê û ji rexê dewletê dihate çewsandin.

Me dît herdu dewletan «Tirk, Faris» berê xwe didane van eşîran, her yek dixwest wan eşîran nêzîkî xwe bike û wan bi xwe ve girêde û wan bike ji destê xwe da bi fermanên wî rabin, rûnin û wê hêza çekdarî û zilamên wan ên gelek ji bo xwe di sînor de û li cihên din bi karbêne, Û eva ha ji hişt ku gelek pileyên bilind û cihên kargêrî ên corbicor di nav komelê kurdî de belo bûn, wek paşa û beg û yên din. Siltan ev pile û kargêrî bi van serokan didan li encamê wî karê ku li destpêkê siltan pêrabû û eşîre di rêverberîyên dewletê de rêxistin û bi dewleta navendî ve girêdan «ya ku di karên xwe yên navxweyî de serbixwe bûn. Û di vî barî de Basîl Nîkîtîn dibêje: «Dardestîya zo bû, ji rexekî serokên eşîrên koçerî serbixwe bûn û ji rexekî din kargêr û leşkerê siltan bûn». Belê girêdana wan bi siltan ve ne xurtbû, çûnke serokên eşîre û Mîrekên kurd tu carî dinan bi wê ne dan ku divê bi dardestên dewletê ve girêdayîbin. Û eger kiribin jî gelekî hindikbûn. Û piştî rêxistina Kurdistanê ya birêveberî gelek pê ne çû, li dema siltan Selîmê yekê, gelek deveran ji Kurdistanê ji bin darê Firs û Tirkian xwe rizgar kirin. Eva ha jî li demekê rûda; gava ku derebegan hêza xwe xurt didîtin, nema guh li fermanên siltan digirtin. Herçende «Babilalî» melbenda xwe ya bi rengê fermandarî bi ser wan de diçespand, lê derebeg û serokên eşîran guh

ne didan wê melbendiyê û li gora berjewendîya xwe ya taybetî rêbazek digirtin. Hemû destûr û bendên hikim guherandin, herwekî «irîyanof» dibêje: «Destûr û rijîmên birêveberî yên ku bi rijîma derbegî û berjewendîyên began ve girêdayî bûn û yên ku li bayê wan bûn; xurtkirin û guhdane wan» û bi ví rengî ev rewşa ha bi rêve dibirin û berdewamdikir, ta lawazî li rexê siltan didîtin agirê serhildanekê pêdixistin.

# REXÊ ABÛRÎ

Li çaxê herdu dewletan, dewleta osmanî û ya sefewî di rûyê hozên koçerî yên kurdî de, li encamê du parçebûna Kurdistanê sînor girtin, û gelek ji wan di rêya çêregehên xwe de, neçarê ser dibûn, bi vê dewletê re yan jî bi ya din re. û piştî demekê, gelek ji eşîrên kurd neçar dibûn di hundurê dewletek ji wan herdu dewletan de cih bigrin û di peyre dibûn dêmanî, û li encamê vê bû komelê kurd bû, du bir û du rengê jiyana civakî belobû hinek ji wan rûniştin û çandinî kirin û bi çandinîyê re pez û dewar jî xwedîdikirin û yên din koçer man. Eva ha jî guherînek bû ji rengê jiyana koçerî û ya gerokî, ber bi jiyana dêmanî û çandinî ve çûn. Û serokên van hozan ên koçerî li tenişt serokatîya eşîrê, bûne derebeg û xwedîgên zevî. Ev jî hokarekî arîkarîbû da rijîma eşîtî bi herife û sedema wan guherînên civakî û abûrî yên ku di hundirê wê de çêbûn, hişt ku di nav komelê kurdî de, rê ji peywendiyên derebegî re vebe û bi vî awayî belabûn.

Ji bo xwedîkirina pez neçarê guhestin dibûn, li gora du nîrên salê û ji bo peydakirina çêregehan dihişt eşîrên kurdan cihguhêzbin, li navbera deşt û çiyan (zozan û germîyan) çûn û hatin dikirin.

Di çaxê guhestin de kirîn û firotin dikirin. Pîşeyên xwemalî peydabûn û berhevên heywanî; (hirî, pêst û rûn) li melbendên bazarganî bajaryên ku li ser rêyan avabûn

têde bazarên ji xwemalî vebûn, difirotin. Û di pey re pêguherîn bi dirav peydabû û peywendiyên (riba yê) çêbûn û di nav de pîşedest gelek xuyakirin û pîşesazîyên jixwemalî çêbûn wek, hasinkerî, tevin (çinîna konan, merş û mafûr). Sedema vê bû rê ji bazirganî re vebû, ji bo firotina van pîşeyan û berhevên çandinî û yên heywanî, wan melbendan bi bazarên derveyî re peywendî kirin. Û wan melbendan berhevên wek; hirî, çerm, rûn, pez, sîrêz, dar, pembû mafûr û tiştên din, rêdikirin bazarên derveyî, mîna, Bexda û Heleb, Sitembol, Tevlis û bajarên din. Herwekî Dr. Qasimlo dibêje[1].

Û van hokaran arîkarîkir ji bo berhevê pîşesazî katbide û kirîn û firotin pirbibe, dirav belabibe û bajar li ser rêyên bazirganî avabibin, di navlde sîsika tovê Birjewazîya kurdî, ji nû kurhikda û karê bazarganî despêkir. Basîl nîkîtîn[1] di vî warî de dibêje: «Di Kurdistan de rengekî rijîma sermeyedarî hate naskirin, çunke melbendeke giring bû ji bo Bexdayê, Qestentîniya û sûrîyê. Pez ji wan re rêdikirin. Herweha hirî, hingiv, debax, bihin û hin ji dermanên debaxê jî rêdikirin û li beramberî van; Kurdistanê ji wan deveran çek tanîn, herweha kirtê pembûyî û hevrîşim, şekir û çi renge tiştên ku di hatin mezaxtin û pêwistibûn dikirî».

Herweha hin ji derebeg û xwdîsemyanan pirgala wan a civakî hate guhertin û bûne sermeyedar, û di zikê

---

1 - Dr. Qasimlo Kurdistan û kurd lêgerîneke abûri.

komelê derebegî de tovê sermeyedarî şînbû, da ku rijîma derebegî bi herife û sermeyedarî pêçve bide û li ser rêya guherîneke xwesristî de biçe.

Hebûna tiştên pêşînî di Kurdistanê de û pêwistîya kargeyên Evropayî bi van tiştan, û cihê Kurdistan li ser rêya bazarganî ya kevin ku li navbera rojhelat û rojava diket û ji bo fêlbazîyên siyasît d. ji bo wan hoyan Dewletên rojavayî temahî li wan destda û berê xwe dane Kurdistanê û di nav wan de li ser tiştên (mewad) pêşînî di bazarên Kurdî de kiberînek çêbû. Û kirt û tiştên biyanî di bazarên Kurdistanê de fûrîn. Lewra çar ji pîşedestên xwemalî kirin û lawazkirin û herwa nehiştin. Di vi barî de (celîlê celî) di pertoka xwe de «dîroka Mîrnişînên Kurdî, di imberaterîya Osmanî de» dibêje: «Engilîzan, ji bazara rojhelata navin, Ros ji pêşya xwe dane alî. Tiştên pîşesazî yên Engilîzî li Tirkîyê zehfbûn û gelek ji bajarên Enedolê ku li ser rêya karwanên bazarganî diketin hatin guhertin û bûne melbendên jîndar û cihê tevgerê. Û bazara pîşeyen xwedestî hino hino hervî ji ber ku li pêşya kirtên Evropî nekarî xwe ser piyê xwe bigre».

Bi vî rengî Kurdistan, ewa ku di rêya pêşketina xwe a xweristî de bû û bi tiştên xwe yên pêşînî dewlemendbû, bişûnde ma, da bibe bazarek, duhn bide pîşegehên rojavayî yên serdest ku bi tiştên pêşînî yên rojhelatî kardikirin. Hr weha Kurdistan bû bazarek, ji wan pişegehan re da berhevên xwe têde bifroşin.

---

1 - Basîl Nîkîtîn (Kurd).

Fîlcfiskî dibêje: «Serdestiya Kolekarî bêgane di rêya pêşketina Komelayetî, di Kurdistan de bû Kelemek. Ev hêz û ew hêza nûjen ya Ku dixwest kat bide; li hev Ketin»

Herweha em dibînin dewleta Osmanî roleke herifandin û rêgir, li pêşya vê pêşketina xweristî, ya abûrîya kurdistan hebû Ew jî di rêyên wan êrîşên leşkerî de yên ku dibirin ser Mîrekên Kurdan. Van jî dijê îranîyan dikirin. Sedema ku Kudistan dibû binke şanoyek ji van Şeran re û abûrîya welat dibin piyên wan de dimir. Belê dipeyre jî talankirin û malwêrankirin û tişta nebûyî bi serê wan dihat, li ser destê mûçexwer û berpirsiyarên dewletê. Herweha badêrana Tirsek bêsînor û nebûna parëzgêrî, ev hemû li qewara Kavilkirina şer, ya berê Temam dikir.

Ji dîroka peywendîyên li navbera Kurdan û Osmanîyan û pêşketina Komelê Kurd di Kurdistana Osmanî de encam dide ku gelek ho hebûn hiştin abûrîya Kurdisan li paş bimîne û nekarî di rêça pêşketina xwe a xweristî de biçe. Û ji van hoyan:

1 - Dardestîya hişkû dijwar, birêvebirineke çewt ya ku abûrî dikuşt.

2 - Berberîtîya li nav began û şerên çêdibûn

3 - Serdestîya Koledar bi ser abûrîya dewleta Osmanî de ku hîn ew abûrî nûkat bû, destpêkiribû gavên pêşî davêtin.

Bi vî awayî em dibînin Komelê Kurdistan di rêça pêşketina xwe a xweristî de diçû, ji jiyaneke koçerî û

gerok xwe diguheste jiyaneke dêmanî û cih, ji xwedîkirina pez û terş û jiyana guhestin, ber bi jiyana çandinî diçûn. Li cih man û guhdane zevî û dezgehên pîşesazî yên xwemalî. Melbendên bazirganî û bazarên navxweyi peydabûn û bi deverên çarnikarên xwe re peywendî kirin. Kirîn û firotin dikirin û karên bazirganî bi bajarên derveyî Kurdistan re dikirin û bi awayeki sûdmendî.

Basîl Nîkîtîn di pertoka xwe de (Kurd) di vî barî de dibêje: «Em dikarin bêjin ku tiştên ji Kurdistan ji wan tiştên ku dihatin bihtirbûn, û vê ya ha hişt ku semyanek baş di destê Kurdên bajarî de kom bibe». Û vêya ha arîkarî kir ku komelê Komelê Kurdî gavekê bi pêşve bavêje, û ji komelekî derebegî xwe biguhêze komelê sermeyedarî yê ku di hundurê komelê derebegî de sewihabû, destpêkir xirabû, herifî û li encamê wê berberîtîya ka li navbera herdu rêjîman hebû; rijîma derebegî a kawî ku banekî bê sitûn mabû û rêjîma sermeyedari a nû ku lê digera binkeyên xwe tekûs bigrê, lê tevlibûna Evropayî a Koledarî û «istixlalî» bi wê bazirganî û pîşesazîya xwe a pêşketî di rûyê pîşesazîya xwemalî de rawesta, ewa ku hîn gavên xwe ên pêşî davêtin û di rêya kurhikdan de bû. Ew pin giyayê ku hîn pel ne dabû gerzik girt û hişkbû. Sedema vê bû rêbaza pêşveçûna civakî a xweristî rawesta û Kurdistan jî bi mêtengehên xwe ve girêdan û semyanê bin zevî ê xweristî ji tiştên xav ên pîşînî hemûyî talankin û di pîşesazîyên sermeyedarî de bikarbînin û gelê Kurd

biwerêvin, ta ku ji dest xwe here û bi vê yekê çar ji berjiwazîya Kurdî bike an ji ev birjewazîya Kurdî ya ku ji nû Kurhikdabû xwe bide ber siha bazirganîya Koledarî, herwekî bi hemû wan gelên bindest re ev rêbaz girtibûn.

Nîqola îvanof dibje: «Ew gelên ku ne Evrobûn bêvê, benê dûv hebanê bûn û bi rengekî bê destû pê peyçokê Evropa sermeyedarî bûn. û di rêya hemû rengên dagîkirina Leşkerî û ya abûrî û dibin Siha çavdêrî de gelê bindest neçar dibûn û serê wan dikete hevsarê peyçokî û ew rengê berê yê ku havilekî di rêya sermeyedarî de bûn kete ber şeka, û bi xurtî raheja. Dîwarên vê sermeyedarîyê hevberdan û paşê herifîn, jiber ku neçarbû ji nêzîk û dûr; rê bide berhevê sermeyedarî yê ku ji Evropa ve dixiriqî, dihat.

---

1 - Nîqola îvnof «Govara yekêtî» ya ku li Ribat derdiçû. Jimara /48/ sala 1988.

# Xoybûn

## DESTPÊK

Berî em dest bi vê lêgerînê bikin yanî civata xoybûnê, divê em çavekî li xebata gelê Kurd li Tirkiyê bidin, di çaryeka pêşî ji sedê bîstan û hinekî berî wê jî bikin. yanî dema di pey damezrandina civata xoybûnê re û ji ber vêjî, maweya xebata gelê xwe li ser sê qûnaxan bi kurtî emê binivîsin:

1 - Qûnaxa darê Siltan Ebdulhemîdê diduyan.

2 - Qûnaxa civata (itîhad û tereqî) ya tirkî.

3 - Qûnaxa darê Mistefa Kemal.



Seyid Evdil-Qadir (Kurê Şêx Ebîdelahê Nehrî)



Emîn Alî Beg Bedirxan

# QÛNAXA DARÊ SILTAN EBDILHEMÎDÊ DIDUYAN

Osmanîyan şoreş û Serhildanên Kurdî gelek bi hişkî û bi bêdadî vedimiandin, kuştin û wêrankîrin û talankirin û şewitandin û çi tişta bi dest wan ve dihat dikirin. Lê dîse eger bi dîtineke kûr em li wê demê binêrin; ya ku dikevê li navbera şoreşa şêx ubeydullahê şemzînî (Nehrî) di sala /1880/ tû rabûna (itîhadîyan) li sala /1908/ dijî Siltanê Osmanî Ebdilhemîdê diduyan, em dibînin li hemûyê Kurdistana Tirkîyê reweşeke hinekî bêdengî hebû. li gel wêjî serhildonin li vir û li dera ha hebûn, mîna: rabûna (Osman beg û Hisênê Kinan beg, ji kurên Bedirxan beg yên ku agirê Raperîneke berfereh li Cezîra Botan di sala /1879/ de pêxistin. Herweha Emîn Alî û Midhet Bedirxan beg li Terabzonê li sala /1989/ dîse Serhildanek eşkerekirin. Lê ev Serhildan hemû jî ne bi wê hêz û xurtî û berferehbûna şoreşa şêx ubeydillahê Nehrî bûn, ya ku di sala /1880/ de rabû, yan ji wek şoreşa yezdan şêr ya sala /1855/ an bûn, yan weke şoreşa Bedirxanê mezin bûn ya ku li sala /1843/ rabû.

Em dikarin wê bêdengîyê vegerênin ser hoyekê, ku Ebdilhemîdê diduyan rêbaza xwe ya siyasî bi Kurdan re û bi dirêjahîya vê demê, guherand. Piştî ew û yên berî wî jî nekarîn bi kotekî serê gelê Kurd mivzkin û devê wan bi xurtîya xwe bigrin û dengê wan bibirin. Ji ber vê

bû pena bire rêbazeke diblomasî, hêminî, siyasta nerm bi wan re bi karanî. Û em dikarin bi kurtî bêjin ku wi dixwest bi vê siyaseta nerm bikare pêşevanên siyasî û serokên eşîrên Kurd li xwe nêzîk bike û paşê wan ji xwe re bike destik, û ya dilê xwe pêkbîne û bi vê siyaseta ha hişt ku:

1 - Kurd bêdeng bibin û doza mafên xwe yên neteweyî nekin, bikêmahî ta demekî din.

2 - Hinek ji wan weke hêzeke cengawerî û siwarên Hemêdîyan û hinkesên din, bikaribin di singa dijminê tirkan de rawestin, mîna: Ros û gelên Embiratorîya Osmanî, wek Ereb, Ermenî û yên din.

3 - Bihêzkirina melbendîyê di Kurdistanê de û bi kedîkirina begên Kurd.

Vêce ji bo pêkanîna vêyekê şivîleyeke fêlbazî bikaranî, diyarîyên siltanî bi ser serokên eşîran û bi ser pêşevanên siyasî de rijandin. Herweha nîşan û pileyên leşkerî gelek dan, ji bo mînek em dibînin (Behrî) yê bedirxan beg(1) kiribû arîderê serokê dîwana siltan. Bedirxan Beg(2) demekê di koçika siltan de dibe serokê teşrîftan. Dîse hinek ji malbata Ebdirehmanê Baban kiribûn serokên gelek cihên mezin û bilind, mîna (zihnî paşa) ku li zangoya sitembolê, di kolîca mafeberî de istaz bû. Paşê em dibînin şêx Ebdilqadirê kurê şêx ubeydillahê şemzînî

---

1 - Kendal (lêkolîna Fetih)

2 - Celîlê celîl Heşyarbûna Kurd a roşibîrîû neteweyî.

(Nehrî) li despêkê dibe endamê (Komîta êyan) yanî yê perlemanê, di pe re dibe serokê civata dewletî. Herweha Siltan, nemerdî nedikir, gelek nîşan û pileyên bilind li ser serokên qebîle û eşîran de dirjandin. Ev xêr û bêra siltan dibarand, dikarî maweyekê wan kesan bêpêjinke. Ji ber wan qenciyan bû yan ji ji tirsa direndîya siltan bû.

## 2 - QÛNAXA DARÊ CIVATA (ETÎHAD Û TERQÎ) YA TIRKÎ

Di qûnaxa hevgirtîyan de, ewên ku li destpêkê danexuyakirin ku mirovne dîmuqratîne û bi navê biratî û wekhevî bakirin, li gora durişmên pê bakirin: (serbestî, dadmendî û wek hevî. Destûr dane gelek gelan û kurd ji Neteweyek ji wan bû ku civatên siysî û xêrxwazî û cevangeh (Nadî) vekirin. Û sozdan, piştî ceng rawestê hikmê zatî bi Kurdistanê bidin. Belê gava şer nema, sozên dabûn lê poşman bûn, derew kirin û hemû tiştên ku canê welatperwerî pesend dikir û rêya xebatkarî roşindikir qedexe kirin. Û evaha bi neteweyên din re jî kirin. Dijê Kurd rawestan û direndayîya xwe di serê wan de peqandin û bi destek hovîtî li wan dan. Zangoya Misilmanî (Osmanî) bi Tuximperestîyeke Toranî guherandin û her tiştê ku ne tirkî bû di rûyê wê de rawestan û siyasetek girtin, da hemû neteweyên din, di nav qewara ku hevgirtiyan li sala /1917/ an (1) derêxistin, ji dûr û nêzîk ew gelên di nav dewleta Osmanî dene gereke bibin bi Osmanî. Û evaha jî, bi devnermî pêknayê, divê em bi xurtî û kotekî bikarbînin. Lewra em dibînin li gor biryara dabûn, penabirin darê zorê, pêşî li Ermenîyan dan û ji rêya xwe dane puş, ew ji bi arîkarîya hinek eşîrên Kurd û hinek ji Belqan û Elban jî, havpişkî di gurandina Ermenîyan de kirin.

Lê Kurd hiştin ta roja wan ji bêt. Û destpêkirin ji cihên wan derêxistin û li gora biryara Siltan Reşadê pênca derêxistibû, bihtir ji /700/ hezar mirov awarekirin.

Li gel vê qasê jî Kudan tobe nekirin û di cenga yekê de mil bi milê Osmanîyan re şer kirin û ji bo kilê çavê Hevgirtîyên Osmanî gelek qurbanî dan, xwîna xortên hêja û mêrxasan ji bo tirkan rijandin[1].

Dektor Kemal Mezher ji rex Basîl Nîkîtîn diguhêze: (careke din û dîse di bin perda Misilmanî yê de karîn hêza çekdarî di warekî re bibin ku Tucaran bi berjewendîya niştîmanîya vî gelê bindest re rênediket).

(cîhad Salih) li ser gotina (Hebîb Şaril Ro2) dibêje qurbanîya Kurdan ji nîv melyon Şehîd ne kêmtibû.

Di vê qunaxê de rûyekî nû ji bizava Kurdî re belobû. Bernameyên siyasî û civakî hatin danîn û li navbera xebata siysî û ya komelayetî ji hemû rengên hêza siysî a Kurdî havpişkî peydabû. Dostanî û /biratî/ bi gelên din re (Tirk, Ereb) û ev dostanîya biratî di peywendîyên siyasî û civakî de xuyakirin.

Belê dijayetîya bi Tirkên Toranî re Kûrtir dibû û berê xwe di naverasta siyasî de sitand. peywedîyên biratî û hevaltî bû bi dijmenahî, dijê Kurd, Ereb û Ermenîyan û bi êrîşên direndayetî, Tirkan domahî pê anîn. Û direx vêre jî li nav hêzên siyasî yên Evropayî, weke: Rosya, Ferensa Engiltera û Elemanya berberîyeke xurt û

1 - Kemal Mezher (Kurdistan).

kêberîneke dijwar hebû. Ev kîberîn li ser /rê vekirin/ di nav tirkîyê de bû.

Neynika van rewşan ronahî da barê siyasî yê Kurd. û me dît bê çawe siyasîyên Kurd nemaze serokên siyasî di çend rûyan de belabûn:

1 - Hinan rûkir Rosya, ji Bedirxanîyan mîna Ebdirezaq Beg û Kamil beg.

2 - Hinan berê xwe da Osmanîyan, mîna şêx Ebdilqadirê Şemzînî.

3 - Hinan rûkir Berîtanya, mîna Şerîf paşa û hin ji Bedirxanîyan û gelek ji roşinbîran û civata dostanîya (Kurd û Berîtanya) li Sitembo ê damezrandin.

Û ev rûyên siyasî yên ne wekhev, hoyeke bingehî bû ku hişt hêza wan ji hev bikeve, yekîtîya wan lawaz bibe, û pişt re Mistefa Kimal ji bo xwe ew ajotin û Komara tirkî pêkanîn. Ew Komara ku paşê, ew hemû bi werîsê sêpîyan ve girêdan.

Hozanvanê bi nav û deng (Arnold Tiwînbî)(1) Têbînîyek li ser Kurdan, piştî, cenga yekê: (taniha nêşanek nîne bid exuyakirin ku hevgirtinek li nav hêzên neteweyî yên kurd de heye, bikare bi rengê siysî xwe bide naskirin).

---

1 - Kemal Mezher (Kurdistan).

1 - Kovara lêkolînên Kurdî, gotarek (siyamend Osman)

# 3 - QÛNAXA DARÊ MISTEFA KEMAL

Cenga cîhanî a peşî li sala /1918/ an kotahî pêhat û Embiratorîya Osmanî herifî. piştî ku hevpişkî di şer de kir; çirîya paşî sala /1914/ an ta sihê (30) çirîya pêşî ji sala /1918/ an gava li şerwestek (Modirs) li ser belgenama xwesipartin morkirin.

Dewletên koledarî xwestin ku movikên pişta (zilamê nexweş) bibirin. Kîberînek li navbera wan de hebû, her yek ji wan dewletan dixwest çawe bikare para mezin ji talanên cingê yên Embiratorîya Osmanî ber xwe bêxe. Û bicarekê xwe ji kêşa rojhelatî xelaske.

Hêvîya Kurdan di arîkarîya hevpeymanan de hebû jibo damezrandina dewleta wan a serbixwe, nemaze piştî gotinên aşkere yên ku ji devê pêşevanên dewletên hevpeyman derketin, mîna (Liwîd Corc) yê Engilîzî û (Kilîmanso) yê Ferensî û (Wilson) yê Emerîkî[2] Lê serokên siyasî ageh lê nebûn ku peymadaran ji siltanên osmanî û hevgirtîyên Toranî bihtir nadin. peymandaran kurd agehdarkirin û qewêtîya wan ew bû ku bêdengbin çunke rêkevtina (Sêverê) li ber derîye û di nav de hemû mafên kurdan biryar pê didin û pêktînin. Belê li dawî Kurdan zanî ku hatin xapandin yanî bi gotin û sozên mêrnexasên Evropayî hatin xapandin. Mistefa kemal xwe hildigre û diçe kurdistan û bê ku guhbide raya dewletên

rojavayî, Kurdan li xwe komdike û soz ji wan re dan û bi hemû şivîlan serê wan dadigre û dilê dilê wan teserdike.

(Qedrî begê Cemîlê paşê) di bîranînên xwe de dibêje: «Mistefa Kemal di nameyekê de ku jibo civata jiyaneweya kurdî, liqê Diyarbekirê re rêkiribû, eşkere got: «ku piştî welat ji koledarê dagîrker paqijke; hemû mafên neteweyî bi birayên xwe yên kurd dide».

Belê sozên wî gotinên hingivkirî bûn gotinên Mistefa Kemal û sozên wî her û her şivîleyek bû ji bo mebestekê û uştiyek bû ta bi armanca xwe bighe. Herwekû «H.S Armistirong» dibêje Ligel wê ji kurd lê komdibûn û arîkarî pêre dikirin û (Kemal) di rûyê peymandaran de rawesta bi arîkarîya Kurdan serket.

Peymana «Sêverê» ku li dehê (10) tebaxa /1920/ an derket, hîn ji dema morkirinê ve tîpin mirîbûn çûnke dirok bi rûyekî din li ser destê Mistefa Kemal hate nivîsandin, herwekû (Wîlyam îkitin) dibêje.

(Bankaryê) ewê Ferensî dibêje: «Rêkevtina Tirkan di kargeha (sêverê) a navneteweyî de hate morkirin, (ya ku

---

1 - Xiyaneta Berîtanya bi Aşûrîyankire, danîna (ûsivê Melek): xala duwazdihan ji piroja (Wilson) lêgerînek jibo deverên ku ne yên Tirkan bûn di hundirê Embiratorîya Osmanî de û bi destxistina darê li xwe (Hikmê zatî) û pêşvebirina wî darî li gora xwastên azad ji gelên cih re, û gava axayê (Liwîdê corc) siyasîyê Berîtanî got ku xala duwazdihan ji piroja (Wilson) li babetê darê. xwebixwetî (Hikmê zatî) li wan deverên ku di pirojê de navbirî û dilsozî bi karbînin.

kargehek bû di sêverê de û firaxên xezefî çêdikir) û ev Rêkevtin şikandina wê hesanî ye wekû çawe guldanek xezefî bişke». Di rastî de wehabû, pexoxbû şikandina wê hesanîbû û ev rastîya ha (peymana Lozan) eşkere kir, ya ku li (24) ê tîrmehê li sala /1923/ rûnişt; ew tişta ku di (peymana Sêverê) de hatibû, pûçkir û gelek bi hesanî mezaxt.

Kurdan ji nezanî û bi çavgirtî arîkarîya tevgera Hevgirtîyên toranî ên kevin û bi Mistefa Kemal re dikirin, ji ber ku bi navê ayîna Misilmanî û bi navê xelafetê, hatin xapandin, ew misilmanîya ku rojekê li naveroka wê ne gehan. Kurdan li devera corciya û Ermenîya, Kilîkya, Yûnan û cihên din, bi arzanî xwîna xwe rijandin, hemû jibo xurtkirina darê Mistefa Kemal lê perûya wî ya ku li wan kir; bi darê Sêpîyan ve helawistin, li sala /1925/ an û piştî ku hemû rêkxiraw û civat û cevangeh (Nadî) yên kurdan hilandin û li soz û peymanên ji Kurdan re dabûn lê poşman bûn û jê vegera, û mafên Kurdan yên neteweyî nedan. Her wekû hevalê wî (Esmet îneno) di civînên komgira Lozanê de li sala /1923/ ê jêre got: «Gelê Kurd ji weke hemû gelên li deverê mafê wan heye ku dewleta wan hebe û tirk û Kurd di hundirê dewleta tirkî de havpişkin».

Û bi vî awayî (Dilxweşîya kurdan bi mafên wan ên neteweyî û havpişkiya wan di şer de) dadgehên tirkan li du mehan bir bi bir ew hikim kirin û bi darên sêpîyan ve girêdan.

Li bîst û heftê (27) gulanê sala /1920/ an li Diyarbekirê not û yek /91/ welatperwerên Kurd bi sêdaran ve girêdan, û ji wan: kemal Fewzî, Hacî Extîyê ebûqat, şêx Ebdilqadirê şemzînî, kor Ebdillahê (Siade) û xoce Eskerî[1].

Herweha li bîstû heftê /27/ cezeran ji sala /1925/ an dise li Diyarbekirê birê diduwan ku pêncî û yek /5/ Dwelatperwerên kurd li sêdaredan û ji berîya wan ji şêx seîd û Hacî xalid, ceneral Simayî û yûzbaşî Fexrî.

Herwekû Qedrî bigê cemîlê paşê dibêje ku hemû li sêdaredan û her li wê naverasta li pêşya Mizgevta mezin û li pişt dergehê (Dax qapî) dikeve bi hevre Kuştin.

Her li bihara wê salê bû li (xerpûtê) çar sed /400/ welatîyên kurd li sêdaredan û sed /100/ welatîyên din ji li /Hînê/ ew jî bi sêpîyan ve hilawistin. Herweha bi sedan gund ji ser axa kurdistanê mezaxtin. Herwekû Rojnama Dem ya tirkî gotibû: «Daku livir kêşa kurdî nemîne»

Pirêfêsor, M.A. Hesretyan[1,2] ji rojnama (Dem) guhestibû, gotina serokê dadgeha serxwebûnê, ewê ku bixwe biryara dadgehê di rûyê mehkûman de (ewên hikmê kuştin yan renckêşîya herdemî biwan dabûn) xwend û di gotina xweya dawî de got: «... hina ji we nebaşî bal desteka birêveberîya dewletê ve da û kirin mehane jibo agirê serheldanê pêxin û hina jî bergirîya

---

1 - Bîranînên Zinar silopî ji bo kurdistan

2 - M. A. Hesretyan (Serhildana kurdan ya sala 1925

xelafetê kir. Belê hun hemû li ser kêşekê bihevre rêdiketin, ku ew jî Kurdistana serbixwe bû» Herweha pirêfisor Hesertyan gotina cihgirê giştî yê ku di dadgeha serxwebûnê ya tirkî de kardikir, diguhêze: «jêder û hoyên şoreşa paşî ya ku di wilayetên rojhelat de ji welatê me tirkîya nemir, rabûn, jiyên ku li (Bosnê û Hersik) li raburduyekî nêzîk rûdan; cihênabin, ji ber ku armancên şoreşa Kurdî ji weke wan armancê ku hiştin Sûrîya û Felestîn ji hev cihêbibe».

H.K. Armistironx li ser hovîtîya tirkan ya dijê Kurdan ku di pey şoreşa şêx seîd re hat dibêje: (Kurdistan hemû bû şewate û bi keştinê kurd dikezaxtin, mêr dihatin azardan û paşê dihatin kuştin, gund dişewitandin, çandinî, dar û devî hildikirin. pîrek, zarok direvandin û dikuştin. tirkên Mistefa Kemal bi hovîtî Kurd serjêdikirin. û ji wê hovîtîya ku siltan, yûnanî, Eymenî û Belxarî pê serjêkirin dijwartirbû».

Ji ber ku Mistefa kemal, hevgirtîyê kevnar ewê ku destekî bilind di serguherina (inqilab) sala /1908/ an de hebû, wî ji weke hemû hevgirtîyan bawerîya wî ew bû ku jibo damezrandina neteweyê tirkî, kezaxa Ermenîyan û bişaftina Kurdan di nav neteweyê tirkî de pêwiste. Bi guhestina kurdan serdestî wan bibe û wan nehêle. Di berberîya xwe de ya li ser Kurd û Ermenîyan, ji yên berî xwe bihûrand.

Tirkên (Etaturk) piştî şikandina şoreşa sala /1925/ an û serketina wan bi ser Kurdan de, pertoka sor derêxistin û

têde gotin: «Bi xwedê Kurd şikestin û pêkarîneke gelekî bi tirs û sehwbû, firokan ji asmanan kavilkirin dirijandin û ji devê tivingan agir dibarî û ji Topan kûra agir diherikî û şûran serî dibirîn, xenceran zik didirandin, çil hezar leşkerên ku Etaturk bi gotinnameyan agirin gerim kiribûn, li welatê Kurdan xwe çenddikirin, ji sengerekî dibezîne yekî din, digihane kopên çiya û paşê ber bi newalan serberjên dibûn û mirov dihatin kuştin û gund dişewitîn».

Pêşewayê Hindî Bandêt Nehro di pertoka xwe de «Hinek ji diroka cîhanê» dibêje: (û bi vî rengî ew tirkên ku ji nêzîk ji bo serbestîya xwe şer dikirin, Kurdên ku ji bo azadkirina xwe dixebitin tirkan hemû kuştin. çiqasî xerîbe!? Neteweyek ji bergirîya xwe bête guhertin û bibe Neteweyekî êrîşker. û xebata ji bo azadî bibe xebatek ji bo li navbirina gelên din).

Şoreşa şêx seîk şikest, lê çirîskên şoreşgêrî destpêkirin geşdibûn û li Kurdistanê bela dibûn û ji bo bergirîya mufên xwe yên neteweyî bikin. Li çiyayê Cabikcor û fariqînê, sason, çiyayê Ararat û çiyayê botan agir pêket.

Lê li Araratê biserokatîya ceneral Ihsan Nûrî paşa agir gurtirbû.



Şêx seîdê pîran



Dr : Fûad



Hacî Mihemedê Axtî



Xalid Begê cibrî

# SERHILDANA SASONÊ

Di namêlkeyek de ebûqatê Kurd (xelîlê Mihemed Elîyê kurê Mihemedê kurê Elîyê ûnis ji devê wan kesên havpişkî di rûdawan de kiribûn nivîsîye.

Li ser çiyayê Sason ciyayê Toman) ji wilayeta (Sêrtê) qeza (Zoq), devera (Silîva), di sala (1926 - 1936) de zaroyên (Elîyê ûnis) Mihemed û Evdirehman serkeşîya serhildanê dikirin.

Gava hêzên Rosî di cenga yekê de berê xwe dane Kurdistan, serleşkerên Rosan peywendî bi serokên Eşîretû qebîlêņ Kurdan re kirin û ji wan xwestin; bi şoreşkê rabin û li tenişt leşkerê Rosî şerê Tirkan bikin û dewleteka Kurdistanî serbixwe damezrênin. Lê dema li hev civîn serokên hoz û tîran razî nebûn û jiya xwe nehatin xwar; ku divê (şerê pîrozî) Li dijê Rosan bikin. Û zaroyên Elîyê Ûnis, Mihemed û Evdirehman nekarîn bi serê wan bêxin û wan bînin rayê ku evaha ferzendeke û nabe ji dest xwe berdin da dewleta xwe a Kurdî damezrînin.

Şêx seîd gava bi şoreşe rabû peywendî bi van kesan re (Mihemed, Evdirehmanê Elîyê Ûnis) re kir jibo havpişkîyê di şoreşê de bikin. Lê nekarîn hin ji serokên Eşeran bênin rayê, mina (cimî ê çeto) serokê Eşîra (Binçinaran) ewê ku dijê şoreşê bi dewleta tirkan re rawesta. Lê

selîm axayê serokê eşîra (Mûsîyan) evên ha di şoreşê de pişikdarîkirin. Herweha eşîra (Motikan), wan jî di êrîşên ku birin ser du deverên (Hêzo) û (Milvana) pişikdarî kirin û piştî şoreşa Şêx seîd şikest, cihê xwe bernedan û di çiyayên xwe ên asêgeh de sê salan man û bi xurtî bergirîya xwe dikirin û ji Şerên wan ê nav û deng (Gurrê mehînan) ku dijê êrîşên Tirkan kirin, ew êrîşa dijwan ku hemû malwêrankirin û talankirin û kuştin û eger çi pêrgî wan tirkan bûba di rê de di şewitandin.

Piştî wê bi navê lêbihûrtin bakirin û dan û sitandin bi tirkan re çêbû û gotin ku Lêbihûrtineka giştîye û ji bo hemû wan kesên girtîne, dê wan azakin û dê vegerin cihên xwe û nav mala xwe. Û bi rastî dewleta tirkan li sala (1928) Lebihûrtinek derêxistin û gelek ji wan kesên bazdayî li derveyî tirkîyê bûn verehan weke: Ehmedê Îskan û Emînê Ehmed, ev herdu ji serokên eşîra Rima bûn û kesên din. Herweha yên dûrkirî ji geraneve. Û li deverê hêminî çêbû, hin ji efserên tirkan çûn serdana Mihemed kurê Elîyê Ûnis li gundê wî, ji bo dilxweşkirin û da ji xelkê re bidin xuya kirin ku çîrok raste.

Di sala (1934) de hêzeka leşkerî ji neh (9) (elwîye) pêkhatibû ber bi çiyayê Sasonê çûn û bi mehana (Munaweratên tektîkî). Walî doza serokê eşîrê (Evdirehmanê Elîyê Ûnis kir, ewê ku nexweşbû û jê xwest li rex wî amadebê. Evdirehman zanî ku vê carê mirine û hikûmet dixwazê wan biqelîne. û ew kesên hatibûn wî bi darê zorê bibin, ji ya xwe nahatin xwar û sedema nex-

weşîya wî, neçrbûn gotinek ji van û yek jî wan pevçûnik çêbû û birayê wî (sixo) kuştin, lê wan jî nemerkî nekirin leşkerek ji yê tirkan kuştin û yên mayî birîndarbûn û bêpirke revîn. Di pey re xwe dane çiya û şer destpêkir û ji şerên navdar, şerê (Erzîv û Qulensê).

Di sala /1930/ de çendekan berê xwe dane sûrîyê, ji wan Derwêşê Elîyê ûnis û Mihemed Elî kurê Mihemed kurê Elîyê ûnis û hinekên dîtir), sedema pirgala mirovên xwe ên berê hatibûn Sûrîyê bizanin, ev ji rexekî û ji rexêkî din ve ji bo amadakirina xwarin û hin alîkarî ji Kurdên Sûrîyê û ji Ferensayê bixwazin û ji bo wan çekdarên ku li çiya bûn rêkin, eva ha jî di rêya Ermenîyan re, (Mihemed Elî) bi Mifewedê Samî ê Ferensî re li Beyrûtê pêwendî kir, û soz jê re dan ku alîkarî bi firokan rêkin çiyayê Sasonê. Belê alîkarî heta piştî jî bi wan ne gihabû.

Lê piştî Evdirehman hêvîyên xwe birîn û tu xwarin û alîkarî bi hêzên wan negihan û hêzên tirkan rê li ber wan girtin. Li dawîya sala /1936/ an neçarbûn ew hêza sêkuçkî ya ku tirka li wan xelek dabû, qelaştin û pena birin sûrîyê. Bi vî rengê ha Serhildana (Sasonê) ya ku dirêj kirbû /1926 - 1936/ dawî pê hat.

pirgala gelê me yê Kurd ev bû, di qûnaxeke dirêj de ku xebata me nêzîkî li pêncî sal dike, dibin siha serokatîyeke ayînî û derebegî û birjiwazî û welatperwerî de rêça xwe diqelaşt.

Li gora rewşa civakî ya ku li Kurdistan hebû û li gora

nerîtîya vî komelî û roşînbîrîyeke ayînî ya birjewazî, ne karîn axeke baş peydakin û li ser wê axê tevgereke civakî damezrênin û tevgera xwe bi pêşve bidin ta ku bibe tevgereke gelêrî. Niwênerîya gel bike û ji bîra gel vexwe û ta dawî bergirê rastîbe, da bergirîya gel bike. Nebûna rengekî weha ji xebatê, me di dît serhildanek yan jî şoreşek, eger serkirdayetîya wê dûrketiba yekser dişkest.

Piştî ku birjiwazîya Kurd xwe kire nav serkirdayetîya siyasî li nav bizava niştîmanî a Kurdî, ya ku ji derebeg û zilamên ayînî tenê re bû (sedema lawazî ya birciwazîya Kurdî. Lê dîse derbeg mane serdert û bizava Kurdî dibin destên wan de ma û bi hêza xwe bi pêş de dehf lê didan, yan jî dibûne hoyên şikestina wê, ji ber ku hêza xurt ya tevgera Kurdî di gundan de bû û serokên eşîran bûn, û hêza hebû jî di bin fermana wan serokan de bû û li jêr kartêkirina berjewendî û sûdmendîya wan ya taybetî bû û eva ha jî roleke mezin hebû ku bi şoreşê re bikin yan jî dijê wê rawestin, ev jî hoyek bû ji bo serneketina şoreşê an serhildanê, ji ber ku partîyên siyasî dikarîna wan de nebû ku rayên xwe kûr berdin û di nav komelê eşîrê de rêkxistin û komik hebin, ji ber ku peywendîyên eşîrtî gên kevin her mabûn û di nav komelê derebegî de serdestbûn. Herçende partîyên siyasî destpêkiribû seretayê bernameyên siyasî û civakî danîbûn, lê gelek lawazbûn û nekarîn di şopa xwe ya ku ji bo wê hatibûn, da têre biçin û rewrewa jiyana siyasî bajon û bikarê serkirdayetîya komel ji destê serokên eşîrên derebesî û

ayînî derêxin û bi roşenbîr û birjiwazîyên bajarî bispêrin. ji lewra em dibînin karê van derebeg û rîsipiyên ayînî di xebata gelê me de û herweha di şikestin û herivandina şoreşan de rola wan gelek mezinbû.

Di serê van serokan de, ti bîrên ku pê bikarin, tevera kurdî bi pêşde bibin, me ne dît, bilî ramanên xilafeta misilmanî ku bi biratîya misilmanî kotahî pê tanî. Eva ha, me dît, gava bi siltan Hemîdre kirin, û darê xwe jêre danîn. û dîse bi Hevgirtîyan û Mistefa Kemal re kirin. Li gel ku hîn ji zû rûyê siyaseta wan û ya dilê wan nâskiribûn û helwesta wan ya tixumperestî dîtibûn di ser vêre jî me dît di (xebata pîroz) de pişikdar dibûn û bergirîya dewleta Hevgirtin kirin û dewleta mistefa Kemal pêkanîn yan ji gelek dilsozê dewleta Osmanî bûn, û xwe bi xwe bi hevdiketin. Û ji bo dibin siha dewleta Osmanî de bi mênin: (Ne babetê şerefa kurdaye, em derba kuştinê li tirkan bidin û em dest ji wan berdin û divî xewtê tirkan ê nexweş de, em doza kurdistaneke serbixwe bikin. Û ez bi xurtî raya xwe didim û jê nayême xwar, ku em niha arîkariya wan bikin) Ev ji gotinên Evdilqadirê şemzînî ne. ji ber ku wî dixwest ku dewleta kurdî darê xwebxwetî (Hikim zutî) û bi xelafeta Psmanî ve girêdayî be û ne dewletek serbixwe û ji tirkên Osmanî cihêbe. Ti pêve neçû, piştî maweyekê, Kurd rabûn û doza mufên gelê xwe yên neteweyî kirin, lê tirkan ew bi darê sêpîyan ve hilawistin û di nav wan de şêx Evdilqadirê şemzînî xwe ku dilpak û di sozê tirkan bû.

Bîr û rayên roşenbîrî ku ji rojava hatin, di Kurdistan de axeke baş ji xwere ne dîtin, sede ma ku pêşveçûna civakîya kurdî gelekî hêdîbû, û peywendîyên derebegî serdestbûn. ji lewra em dibînin tenha di nav roşinbîrên Sitembolê û hin ji bajarên hindur, weke Diyarbekir û Betlîsê û hinik ji kesên din jî hebûn, înan bi wan bîran anîbûn. van roşenbîran li tenişt beg û zilamên ayînî bi hevre serkirdayetîyeke siyasî ji tevgera Kurdî re pêkanîn. Lê dîse ev serkirdayetîya ha ne wek coyeke roşenbîrî ji kanîya roşenbîrîya Evropayî û birjiwazî lîbiralî av vexwaribû da ku vegere serkanîya wê felsefa Ewropî ya rojavayî, lê çavê pîrozî û şanazî lê dinerîn sedema ku bi navê dadperwerî û wekhevî û biratî, dîmuqratî û serbestîyê, badikirin. Lê tucaran tê negehiştin (meger li dawîbe) ku ev durişmê ha tenha ji bo Evropayê bû, ne ji bo gelên Embiratorîya Osmanî a kevnareye, ewa ku cihê neft û samanên jêr zevî û bazara ji bo bazirgonî û cihên istiratacî û giring ku av bi devê Koledarên rojavayî dixist. Dadperwerî û dimuqratî û serbestî, hemûyan ji bîrdikin. Bilî mihtin û talankirin tiştek li bîra wan nayêt. Li gel vêjî em dibînin piştî ku serkirdayetîya siyasî bi çavê serê xwe dît û barê tal û piropagindên dewletên Koledari yên rojavayî naskir jî, dîse nekarî li rastîya xwe şehrezabibe. Û lê xweşhat ku li nezanîya xwe bihêwire û di hêvîyên nependî. Beramber wan gotinên hingivînî yên ku dewletên rojavayî didêran, êşa wan dihedinand bi hoya sozên derew ên tirîsok, kurd nêzîkî xwe dikirin. Lê di rastî de

kêşa Kurdî di destê dewletên koledarî de kobek bû, ji bo çuvê Tirkan pê bişkênin û ya dilê xwe bibin serî lê a rast tucaran ne dixwestin, dewleteke kurdî damezre, wek helwesta wan li gulana sala /1921/ ê ku bi tevgera (Kotişgîrê) re girtin. Lord Dîkinz dibêje[1]: (wa bizanim Kurd pê dihesin ku bê arîkarîya hêzeke mezin nekarin hebûna xwe biparêzin, lê Beritanya û Ferensa vî karî bi xwe nagirin)[2]. Û bi rastî Ferensa di rêya damezrandina dewleta kurdî de radiwesta û heta di Kurdistana tirkîyê de, ew ji ne bi dilê wê bû. Herwekî Filcofiskî dibêje: (Hemû bi Kurdan mijûldibûn, belê mijûlkirinek sere sere bû, û kes ne bû bi rastî guhbide wan).

Herweh û serkirdayetîya birjiwazi û begîtî ya tevgera Kurdî, di wê çaxê de ne lî astê gihandineke (şiyarbûneke) siyasî de bû û wekû birjiwazîya tirkî negihabû. Gelo Mistefa Kemal ne bitena xwe bû? Lê wî pena bire kurdan (piştî wan bûyerên bihûrtî û tal ku Hevgirtîyan bi kurdan kiribûn) û karî careke din bi gotinên xwe ên hingivînî kurdan bixapîne, sedema gotibû ku: (Tirk û kurd birayên hevin û di rewşeke wekhevî de wê bijîn û mafên xwe ji wê bi destbêxin). Û kar ji bo berjewendîya Kurdan bikarbîne, û berê wan da Evropîyan û dijminên tirkan. Ji bo armancên xwe xwîna Kurdan rijand û paşê liwan zivirî û beramberê qencîya wan; bi darê sêpîyan ve hilawistin.

---

1 - Wezîre derveyî ê Berîtanya

2 - Siyamend Osman

Eger serkirdayetîya Kurdan nêrîneke baş li ser rewşa welat û cih hebaye û li ser rûdaw nêrîneke kûr hebaye û bi kariya biryareke siyasî serbixwe bide, bîreweriyeke siyasî û roşinbîrî, bilind, wek dihate xwestin hebaye; ji Mistefa Kemal bihtir û çêtir dikarîn tevgerbikin, sedema wan lêkarîn û hêza kû hebû, nemaze di nav dewlleteke lawaz û perîşan de ku ji cih rahejehabû, dîwarên herivî û hêzeke ji hevçûyî. Serkirdayetîya dewletê hemû revîn û hêza leşkerî şikest û cih ji xwere ne dit û nezanî çibike (Dewleta Osmanî ji laşê Enbiratorîyetê derket û di Sitembolê de xwe bi ser heve kire gavişk)[1]. û divê pirgala perîşan ya dewleta Osmanî ku wê çaxê têde dijî, eger serkirdayetîya siyasî a kurdî belên bida û yekêtîyek bikira û hêzên xwe bicivanda (li cihê ku bi Mistefa Kemal re arikarî kirin ta ku di şerê xwe de serket) û Kurdistan hemû dibin cengên xwe kira bê ku pal bidin ser berîtanya û peymandaran. û ji rexekî din dewletên mezin neçardidûr ji hêza wan re serê xwe didanîn, bê çawe ji Mistefa Kemal re danîn.

Lê wisa didê xuyakirin ku birjiwazîya tirkî ji birjiwazî û derebegîya Kurdî zanatirbû hişyartirbû, lewra dewleta Kurdî ya ku hêvîyek bû ji dest me çû, ferzendeyek bû di ji yana gelê Kurd de, belê çû û ta niha li me ne zivîrîve.

Wê serkirdayetîyê xwest ya çûyî vegerîne, bi rengekî

---

1 - Kendal

nû rabe, ew jî şoreşa ku şêx seîdê pîranî pê rabû li pêncê /5/ sibata /1925/ an. Kurd bi hêvî bûn ku bi armanca xwe bigihin, lê mixa bin tişta çû venegerandin. Ferzend carekê dêt û dijware eger dubare bizîvrêve. Birjiwazîya Tirkî ya ku giha ser hikim, ne a berêye, niha keça tuxumperestiya Toranîye û dewlet jî, ne dewleta (zilamê nexweşe).

Lê birjiwazîya me keça wê dewleta kevnare bû, bi hemû bîr û şivîleyên xwe li paş Tirkan mabû. ji bîrên eşîrtî û ayînî û ji ( misilmanî) ya hingê vexwaribû, hîn têrbû û neynika wî warê paşketî ronahiya dida hêza siyasî a Kurdî ya wê serdemê. Ji bo vê yekê mezintirîn belge gotinên şêx Evdilqadirê şemzînî yên bihûrtîbûn.

Kurdan arîkarîyeke mezin ji tirkan re (Mistefa Kemal) pêşkêşkirin. Û li berê Rosya û yûnanîyan û yên din mıl bi milê tirkan re şer kirin, ta serketin û ta dewleta Tirkan care ke din li ser piyên xwe rawesta. Gunehkarîya wan ji wek gunehê Sinmar bû? ji ber ku: (Gava rimên tirkan xuyabikin, Kêşa kurdî tineye), herwekû rojnama Dem ya tirkî gotibû.



Şoreşgêrên Serhildana Sasonê



Evdirehmanê Axayê Elî Yûnis

# CIVATA XOYBÛNÊ

Şoreşa gelê kurd ya ku şêx seîdê pîranî ala wê bilindkiribû, tirkan.bi destekî hasinî lêdan. Ligel ku bi dihan û sedan li sêdaran dan, yan jî bi gulebaran ew kuştin, xanî herivandin û gund ji ser rûyê hebûnê hilandin û ter û hişk şewitandin.

Piştî şikestina şoreşê ji ber hovîtîya tirkên toranî pêşekêşên siyasî û serokên eşîrtan ji hev bela bûn û her hinek bi welatekî ve çûn. Hin ji wan çûne (îraqê)- û hin ji wan çûne Sûrîyayê û Evropuyê û hin çûne (îranê). Kurd hemû bi hevre di çavên Tirkan de şoreşgêrbûn û dijê Tirkan rabûne û zordarîya toranîyan biçûkû mezin ji hev cuda nekirin û dasa cengê li hemûyan paleyî dikir. Ew kesên ku rojekê ji rojan hevalbendiya şoreşê nekiribûn û ewên xayin ji bûn, gelek poşman bûbûn lê poşmamî bêhode bû.

Herwekî berê me got; gelek ji serkêşên siyasî û ji serokên eşîran pena birin sûrîyê wê demê dewleta sûrîyê li bin çavdêrîya ferensayê de bû. ji ber sitema Kemaliyan bazdabûn, mîna celadetê Emîn Alî yê Bedirxan û birayê wî Kamîran û Ekremê Cemîlê paşê û Qedrîyê cemîlê paşê û Haco, herweha Osman Sebrî û Dextor Ehmed Nafiz, Arif Ebas û Evdirehmanê Elîyê ûnis, Hemza begê û Memdûhê Selîm û Emînê Ehmedê perîxanê û ji mareyeke din ji serokan.

Ti pê neçû tevgerek li navoera serokên siyasî de çêbû da ku xebata xwe ya siyasî bikin yek û rûyê wê bidin Kurdistana Tirkîyê. Û hemû bi hevre gihane rayekê; xebata xwe li bin siha rêxiraweke siyasî de kombikin.

Dr. Bileç Şêrko dibêje[1]: (Welatperwerên Kurd dîtin bê çi bi welatê wan ê hêja hat, ji wêrankirin û kuştin, ji ber vê qasê dilê xwe birin, ji bo girêdana komgirekî û di nav de niwênerên hemû civat û serokên eşîran û girgirekên melbendan û yên welat, bicivin û biryarên lez û bi kêr bidin, da xebata xwe ya dijê tirkan bizivirênin ve û Kurdistan ji nav neynokên tirkan derînin, ji berî ku eşîrên Kurdan ji hevbêxin û wan awarebikin û ji berya welatîyên çekdar ewên di çiyayê Kurdistanê de asêmabûn, wan ji bikezêxin.

Li ser vî bingehî, di Libnanê de li çirîya pêşî ji sala /1927/ an[2] li bajarê Beyrûtê, di mala yekî Ermenî de ji serokên partîya Taşnak yê ku navê wî (Fahan papaziyan) bû, civîna xwe kirin û paşê xwe guhestin (Bihemdûnê)[3] û Komgirê wan bi serokatîva Dektor Şakirî yê

---

1 - Kêşa Kurdî, Dr— Bilec Şêrko (Celadet Bedirxan)

2 - Qedrîyê cemîlê paşê di pirtoka xwe (jibo kurdistan) di pertoka Bîranînên Zinar silopî de vê dîrokê dibêje û herweha Basîl Nîkîtîn (Kurd) wîjî gotiye.

Li ser zimanê Sureya yê Bedirxan dîse bilec Şêr ko ev dîrok di pertoka (Kêşa Kurdî) de nivîsiye.

3 - Bîranînên Mela Ehmedê Şûzî.

Mihemedê Segvan hate girêdan û tevan ji bo damezrandina civateke siyasî. û bi navê (civata xoybûnê) yanî serxwêbûn, biryardan û hin biryarên ku peywendî bi xebata rêxirawa wan ve hebû tev derêxistin. Û li dawiya komgirê serokê Ermenî, ev karê wan ê mezin û ev destkevtinu hêja, pîrozkir û bi dilsozî ji wan re xwest ku di rêça xebaata xwe de serketîbin[1].

---

1 - Bîranînên Mela Ehmedê Şûzî.

# ÇAWE CIVATA XOYBÛNÊ ÇÊBÛ:

ji bo vê ravekirinê bê çawe civata xoybûnê damezraye, li ber ronahîya du rayan ez wê dixime rû:

1 - Qedrî begê cemîlê paşê di pertoka xwe de (Di rêya Kurdistan de, bîranînên zinar silop) nivîsîye.

2 - Ya diduyan Bîranînên Mela Ehmedê şûzî Ev pertok nehatîye çapkirin. Şûzî yek ji wan kesên ku li damezrana civata xoybûnê de havpişkî kiribû. Herweha di rêya hin çavpêketinên ku min pêre kiribûn.

Qedrîyê cemîlê paşê dibêje: (Ewê ku bi navê eskender beg bû bi hinek ji endamên serkirdayetîya kurdî re yên ku li îraqê û li cihên din bûn, peywendî kir, mîna (ihsan Nûrî paşa) û seyid Elî Rida Kurê şêx seîdê pîran û dektor şakirî yê Mihemedê segvan herweha serbazê yekê Rasim û serbazê yekê xorşîd û hinek ji welatperweran ji Kurdistana xwarê, li gel hin kesên din. Û bi hevre li ser rewşa giştî ya kurdistanê vekolan û ji bo kêşa xwe ya neteweyî, girêdaana komgirekî giştî bi pêw'stî zanîn. Herweha bi Ermenîyan re peywendî kirin û piştî dan û sitandin bi hevre gihane hin encfam û ev encamên ha ketin hundurê rêkevtina (xoybûnê)

pêşewayên siyasî piştî ku bi hevre dan û sitandin, li dawiyê bi hevre rêketin ku birengê ku hemû rêkxirawên

partîyeke siyasî damezrênin di xwe de bicivênê û serkêşîya bizava niştîmanî ya kurdî di hundurê tirkîyê û derveyî wê de bike û tevgera siyasî û ya piropagendî bigrê xwe û birêve bibe.

Bi Ermenîyan re raya wan yek bû, ku dewleta tirkan çewsêner û sitemkara gelê Kurd û Ermenîye û vê rewşa wan a taybetî ji xwe re bi kartêne ji bo lawazkirina xebata wan di rêya serbestî û serxwebûnê de. Û newenerê Ermenîyan got ku ev piropagenda Ermenîyan dijê kurdan dikir û li maweyeke dirêj, li encamê tênegihiştineke çewt ku di nav her du gelan de rûdabû, pêwiste raweste û gereke Ermenî di nivîsandinên xwe de yên ku li Evropa û li Emerîka beladikin, bergirîya kêşa kurdî bikin. Herweha ji bo berjewendîya kêşa Kurdî, piropakende belavkin. Ser vêre ji Ermenîyan re sozdan ku peywendî li navbera kurdan li hemû dewletan bikin û wan bigehênin hev ji bo ev rêkxirawa kurdî damezrê û ew bîra ku pê badikirin (Ermenîya mezin) devjêberdin, ew bîra ku li gora wê doza dikin, eger pêkhat, gelek parçên mezin û fereh ji kurdistanê vedigre).

Eva li jor hat, di bîranînên Qedrîyê cemîlê paşê de, didê xuyakirin ku ji naveroka wê rêkevtina Kurd û Ermenîyan bû ku alîkarîya hev bikin, dijê dewleta tirkî rawestin. Û dîse Qedrî beg dibêje: (Herdu alî bi hevre rêketin, li ser ku ew kêşa dahato ya ku li ser rastkirina sînorê kurdistan û Ermenîyan, bila li hêvîya herdu dewletan (kurd Ermenî) bimêne. Herweha alîkarîya Ermenîyan

ya destbidest ji Kurdan re wê jî, bi herdu dewletan bisipêrin)[1].

Raya diduyan ya Mela Ehmedê şûzîye[1] şûzî dibêje: Li dawiya sala /1926/ an bi hevalekî xwe re ku navê wî (Evdilayê cizîrî) bû, çû bû bexdayê, ji bo xwendina xwe a ayînî li ser destê şêx Berahîmê Rawî temam bike. Û li wir seyid Elî Rida Kurê şêx seîdê pîranî naskir, ewê ku bi herdu birayên xwe re (Selahedîn û xiyasedîn) penaberê dewleta îraqê bûn. Herduwan li kolîcê cengawerî dixwendin. Û Mela Ehmedê şûzî û hevalê xwe Feqe

---

1 - Li meye em bi pirsin: ka sinorê herdu dewletan li kûye? û gelo di rêkevtinê de sînorê Ermenîyan kîjane? Naskiriye ta başûrê Diyarbekerê dozdikirin. Gelo wekû di biryara sêverê de hatibû, yan wekû (Kendal) dibêje: (Dibê ku cihê sersûrman bê, û ne tekûsbû gava wefdê Ermenîyan yê neteweyî çûbû komgira parêzê li sala /1919/ an gotin (ku cihê Kurdan ji xwarê Diyarbekrê destpêdike û wilayetên mayîn ji rojhelatê tirkiyê, devereke Ermenîye).

1 - Mela Ehmedê şûzî: Navê wî Ehmede kurê Evdirehman axa serokê eşîra (Borduwa ye û ji gundê şûzê ye li cihê Botan. Piştî Kuştina bavê xwe rex xaltîka xwe, kebanîya şêx Hisên, bovê şêx birahîmê Heqî, şêxê Botan. Û li wir mezinbû û şehrezayê zanîna ayinî bû. Paşê çû bajarê Bexdayê ji bo li ser destê şêx Birahîmê Rawî xwendina xwe temamke. Li Bexdayê seyid Elî rida kurê şêx seîd yê ku penaberê îruqê bû, naskir û di guhê wî (şûzî) de got û ew di karê tevgera neteweyî ya kurdî de tûjkir û piştî wê di karê damezrandina (civata xoybûnê) de havpişkî kir. Di peyre şeş sal mil bi milê şehîdê nemir şêx Evdirehmanê Garisî re xebata neteweyî ji bo Kêşa xwe ya neteweyî û bi şêx re ma ta roja ku şêx şehîd bû. Di şopu xwe de berdewambû û li gora rêbazeke taybetî ya ku wî bawerî pê hebû rêya xwe temamkir.

Evdilayê cizêrî hemû wextê xwe li rex seyid Elî Rida dibûrandin. piştî çend mehan ji dostanîya wan seyid Elî Rida ji herduwan xwest; herin serdar û serokên eşîrên li cihê Botan û Behdînan bibînin û bi navê wî, dozê li wan bikin ku di tevgera neteweyî a Kurdî de bixebitin û bi wan bigehênin ku ji nêzîk û nedûr, partîyeke siyasî damezrênin ku hemû partîyên siyasî yên kevin di hundurê wê de kombibin û hemû serdar û serokên Kuran xwe lê bidin hev û ev partîya ha ji bo damezrandina dewleteke Kurdî serbixwe di hundurê tirkîyê de, wê xebat bike. Mela Ehmedê şûzî hevalê xwe birêketin, berê xwe dane zaxo, Dihok, Amêdîyê û Musilê; ew cihên ku hin ji zilamên ayînî û serokên eşîran yên ku ji tirkîyê bazdabûn û pena biribûn dewleta îraqê. Gelek ji wan serokan dîtin û daxwaza seyid Elî Rida bi wan gihandin û bi guhê wan êxistin. Û ji kesên ku li Mûsilê dîtin: Şêx Berahîmê Heqî û şêx Evdila kurê şêx Mihemedê Nûrî yê cizîrî û şêx Evdirehmanê Garisî, Elîxanê şernexî û yaqûbê Eruhî û cehfer axayê Eruhî, Gurgîn axayê Berwarî, simayil axayê Geravî û Hazim beg yek ji serdarên bajarê zaxo. Van kesan belêndan û bi hevre rêketin û xwe jêre amadekirin.

Herweha berhevê ger û dan û sitadin û peywendîyên bi wan kesan re kiribûn, hemû ji seyid Elî Rida re nivîsîn û herêkirina wan pê gehandin ku tev amadene. Lê careke din ji wan (Şûzî û Feqe xwest ku muhrên serdar û serokan bidinhev, da li ser herêkirina wan belgebêt. Wan şêx

û serokan nemerdî nekirin murên xwe bi herduwan sipartin.



Mele Ehmedê Şûzî

# DAMEZRÊNERÊN XOYBÛNÊ:

Seyid Elî Rida, Mela Ehmedê şûzî û Feqe Evdilayê cizerî rêkirin Sûrîyê, li Qamişlokê haco û serokên din agedarbikin ji bo herin Beyrûtê cevangeha destnîşan kirî, da li wir hev bibînin. Çûn Qamişlo û peywendî bi van kesên ha re kirin: Haco axa serokê eşîra Hevêrka û Emînê Ehmed serokê eşîra Rima û Bedredîn axayê Hebisbenî, serokê eşîra Hebisbenê, û herdu wan Feqe û şûzî encamê tevgera xwe li ser zimanê seyid Elî Rida hemû ji wan re guhestin û li ser girêdana komgirê agehdar kirin û dane xuyakirin ku herdu niwênerê eşîrên Botan û Behdînan di Komyirê de amade dibin[1].

piştî çend rojan rûkirin bajarê Beyrûtê. Di bajarê Hisiça re çûn û gihane bajarê Dêrezorê li wir serokên eşîrên Ereban ji Haco axa re şahîkirin, sedema ku haco Kabrtinê Ferensî (Rogan) li sala /1924/ an kuştibû* paşê di Helebê re bihûrtin, da li komgirê damezrandin de amade bibin û partîyekê damezrênin. Li çirîya pêşî ji sala

1 - Mela Ehmedê şûzî niwênerê eşîrên Botan bû. Feqê Evdileyê cizerî niwênerê eşîrên Behdînan bû.

* - Haco axa şerê Rogan kir, lê ewê ku Rogan kuşt.

/1927/ li bajarê Beyrûte[2] bi serokatîya Dektor şikrî yê mihemedê segvan civîna yekê kirin, û di mala Fahan papaziyanê Ermednî de hategirêdan. (Fahan) bi xwe yek ji endamê partîya taşnaka Ermenî bû. Û li dawîya civînê ji bo vê deskevta mezin û vî karê hêja pîrozî li wan kir.

Ew kesên di komgirê de amade bûbûn, evin[3]:

1 - celadetê Emîn Alî yê Bedirxan Beg.
2 - Elî Rida kurê şêx seîdê pîranî[4].
3 - Dektor şikrî yê Mihemedê Segvan.
4 - Haco axa serokê eşîra Hevêrka.
5 - Bozanê şahîn begê serokê eşîra Berazan.
6 - Mistefayê şahî begê serokê eşîra Berazan.
7 - Emînê Ehmed serokê eşîra Rima.
8 - Bedredîn axayê Hebisbenê serokê eşîra Hebisbenê.
9 - Memdûhê Selîm ji serdarên partîyên Kurdistana Tirkîyê.

---

2 - 3 - Mela Ehmedê şûzî di bîranînên xwe de dibêje. Herweha di pêşgotina pertoka (Serhildana Agrî) de selahê Berwarî dîroka girêdana komgirê di roja pêncê (5) ji çiriya pêşî nivîsiye.

4 - Mela Ehmedê şûzî berî ku bîranînên xwe binvîse di çavpêketinekê de ji min re gotibû: «Seyid Elî Rida di Komgirê de beşdarî nekir û amade nebû sedema ku Engilîzan nehişt, û li bihna dawî de ku ji Bexdayê derkeve, rûbike Beyrûtê; rê li ber girtin da li Komgirê damezrandina civata xoybûnê amade nebe. Û ji ber vê bû bêrayî li navbera wî û hevalên wî de çêbû. Û ew jê nedişuştin ku destê wî têde hebû, û ji lewra Engilîzan nehişt amade bibe. (Osman Sebrî) jî bi vê rayê re bû û dibêje dubirekî hebû. Herweha (şûzî) jî ji min re gotibû ku dektor Şikrî yê Mhemedê Segbvan, ew jî amade nebûbû. Lê di bîranînên xwe de navê herduwan di nav kesên amadebûyîn de dinivîse.

10 - Tewfîqê cemîl yê ku di leşkerê Tirkî û di şoreşa Aratê de efser bû.

11 - Fehmîyê Licî, nivîskarê Şêx Seîd bû.

12 - Kerîmê ku efserekî îraqî bû (navê wî ê diduwan, Mela Ehmedê şûzî ji bîrkiribû.

13 - Kamil ev jî di leşkerê (îrazqê) de efser bû. Navê wî ê diduwan, (şûzî) jibîrkiribû.

14 - Mela Ehmedê şûzî.

15 - Feqe Evdilayê cizerî.

Ew navên ha hemû di komîta navendîde, ji bo civata xoybûnê hatin helbijartin, tenha Mele Ehmedê şûzî û hevalê wî Feqe Evdilayê cizerî ne hatin helbijartin[1].

Piştî pênc rojan hemû vegeran. Mela Ehmedê Şûzî û hevalê xwe Feqe Evdila çûne Mûsilê û encamên Komgirê ji hevalên xwe re guhestin Nemaze Evdirehmanê Garisî yê ku di peyre li Mûsilê bû bi niwênerê (civata xoybûnê)[2].

---

1 - Mela Ehmedê şûzî bi xwe ji min re eva ha gotibû û bûyerên çêbûne dîse vê yekê dide xuyakirin.

2 - Bîranînên (Zinar silopî).



di kongira Xoybûnê de



Mistefayê Şahîn Beg



Bozanê Şahîn Beg



Ev fotograf di 1925'an de li Bexdad'ê hatiye kişandin. Yê runiştî: Şêx 'Elî Rıza (kurê Şêx Se'îdê Pîranê). Yên li piya (ji çepê ber bi rastê): zabitê Kurd Xurşîd Efendî, Fehmiyê Licî, Tewfiq Èfendî, Serokê Serhildana Agrîyê Îhsan Nûrî.

# BIRYARÊN KOMGIRÊ DAMEZRANDINA

# (CIVATA XOYBÛNÊ)[1]

Endamên Komgirê ev biryarên xwaré derêxistin:

1 - Herivandina (hel) hemû civatên kurdî yên hene, û ji bo pêkanîna civateke kurdî a mezin di nav de hemû endamên kevin kom bibin û bi wan re jî hin endamên nû hebin.

2 - Şoreşa dijê tirkan dirêjbikin, ta yek leşkerê tirkî di axa kurdan de nemîne.

3 - Berî pêxistina agirê şoreşa giştî, li ser van xalên xwarê biçin:

A - Ji bo hemû hêzên niştîmanî ên Kurdî, pêşewayê giştî destnîşanbikin.

B - Rêxistina hemû hêzên şoreşgêrî li rêbazên leşkerî û cengawerî de. Baştirîn çekên şervanî di destên şoreşgêran de bin.

C - Ji şoreşê re melbendeke giştî bê nîşankirin. Û ji bo hêza niştîmanî serkirdayetîyek bilind di çiyayekî ji çiyayên kurdistanê ên bilind de bê danîn.

4 - Li gel dewleta (îrnê) û bi gelê Faris re peywendiyên biratî û xweş girêdin.

---

1 - Dr. (Bilec Şêrko) Kêşa Kurdî.

5 - Bi herdu dewletan «sûrîyê, îraq» re peywendiyên xwe girêdin, û ew mafên li gora sekihên çavdêrî (intîdab) ku peyman û Rêkevtinên dewletî bi kurdan dabûn, besin û doza tu mafên siyasî yên din ji her du Dewletan nekin.

Mele Ehmedê şûzî dibêje, bi hevre rêketin ku bajarê Şamê (Dîmeşq) Melbenda serkirdaye tîya (civata xoybûnê) be û serokê civatê destnîşan nekirin[1]. Û durişmek ji civata xwe re danîn û li ser bergê pirtoka (Kêşa Kurdî) ya Dr. Bilec şêrko, em wî durişmî dibînin. Ew durişm bi vî rengê xwarêye: Xîşke gurovere, ji rexê rastê simbila genim, ji rexê çepê pirtika nivîsanê, ji xwar ve dûvikê pirtik û yê simbilê li hev siwarin û di nîvî de xencere û destikê wê jî ji xwar ve dighe dûvikê pirtik û simbilê, ji banî ve rojeke gur, xencer, simbil û pirtikê dinixumêne.

(Îhsan Nûrî paşa) serokê şoreşa Araratê, ev durişmê ha kiribû nîşana efserên xwe û çiyayê Agrî kiribû nîşana leşkeran[2].

Dr. Bileç şêrko û Qedrî begê cemîlê paşê dibêjin ku melbenda giştî ya (civata xoybûnê) bi ceneral îhsan Nûrî paşa sipratin da lekên leşkerî di ciyayê Agrî de damezrîne. Û ihsan Nûrî paşa kirin serdarê leşkerî ê giştî. Û (Xoybûnê) ala kurdî jêre rêkirin, û wî jî li ser kopê

---

1 - (Osman serbrî) dibêje: Li ser serokatîya civatê; li nav Bedirxanîyan û (Elî Rida) de kîberînek hebû.

2 - Biranînên ihsan Nûrî paşa.

çiyayê Agrî bilindkir. Herweha ji bo birêveberîya bajarî, damû dezgehên bajarî bi serokatîya Berahîm paşayê Hisikî damezrandin.

Bi vî rengî careke din em dibînin serkirdayetîya bizava kurdî wekû berê di destê derebeg û birciwazîyan de ma, û lebata bizava Kurdî li gor dîtina wan siyasî û rêbaza xebata berê de diçû, bi wî renyê ku tucarî serketin bi wan re nebûbû yar. Û komelê Kurd ji pêşevanîya tevgerê dûr ma, lê pêve girêdayî ma û li gora wan peywendîyên eşîrtî û begîtî dibin fermanên wan de, bikin yan nekin. Sedema gelek hoyan û ev komelê ha hîn ne gihabû û ne amadebû pêşkêşîya bizavê bi sipêrê xwe. Herçende li seretayan de û li nav wan rêkxirawên berî (xoybûnê) beloye herwekî me didît ku ku hin ji wan kesên gelek nêzîkî serkirdayetîya kurdî bûn; ji çînê navendî bûn û ji birjiwazîya biçûk bûn.

# LI SER CIHÊ GIRÊDANA KOMGIRÊ:

Mela Ehmedê şûzî û herweha Qasimlo û Kendal, dibêjin ku Komgire di Libnanê de hate girêdan. Lê Qedrî beg, civîngeha komgirê damezrandinê, li kûbû, binav nake. Lê em dibînin ku Bilec şêrko di pirtoka xwe de (kêşa Kurdî) belavoka pênca, ya civata xoybûnê, dibêje komgire di hundurê tirkîyê de rûnişt «Ev welatperwerên ha li sala /1927/ bi hevre biryar dan li hundurê tirkîyê Komgire, civîna damezrandinê bikin. Yanî di welatê Kurdan yê dibin darê tirkan deye. Û evaha berovajîyê, raya hin kesên din ku cihê civîna komgire nîşan dikin. Û li gora ez dibînim, gotina Mela Ehmedê şûzî, ya ku dektor Qasimlo Kendal bi wê rayê rene; ew raya raste û ji ber van hoyan:

1 - Mela Ehmedê şûzî di komgirê de beşdarîkiriye û ew bi xwe mirovekî bawer pêkirîbû.

2 - pertoka (Kêşa Kurdî) kû Dr. Bileç şêrko nivîsiye, ji weşanên (civata xoybûnê) bû herwekû ji bergê pertokê xuyaye û civata xoybûnê wekû em dizanin serokên wê di sûrîyê de dijîn û sûrîya li bin darê çavdêrîya Ferensayê de bû, û ev kesên ku penaberê (sûrîyê) bûn û Ferensa ew diparastin. Û li navbera Ferensa û dewleta Tirkan xweşboşî hebû, lewra ji kurdan re çênedibû bê dilîya Ferensa bikin û nexweşêyan ji wan re peydakin, nemaze piştî ku Ermenîyan di nav wan û Ferensayê de çûn û hatin kirin

û di rêya Ferensayê de karîn di libnanê de komgirê xwe girêdin. Û ji ber vê bû di pertoka Bileç şêrko de cevanyeha Komgirê a rastî ne hate nivîsandin û danerê pertokê ji (Bileç şêrko) dibêje ku li Tirkîyê Komgire girêdan û ducarîdikê «eva hajî cihê gumane». Di nav çend gotinên hindik de, li nav du rêzan, ji rûpele /90/ ji çapa /1930/ çapxana bextîyarî (Elseade) li Misrê derdiket, dibêje: (welatperwerên Kurd bi hevre rêketin vî komgirê Kurdî ê mezin sala /1927/ an di hundurê welatê Kurdan de yê ku li bin zordarîya tirkan deye). Wekû yekî bivê, ji tirkan re bibêje; di hundurê van herdû dewletan (Sûrîya û Libnan) yên ku di bin dardestî ya Ferensa de dijîn; me komgirê xwe girênedaye.

# TEVGERA XOYBÛNÊ:

1 - Şoreşa Agrî (Ararat):

Xoybûnê dest bi karê neteweyî kir û bi serokên eşêran û bi serdarên siyasî ên berê re têkili kirm û bi hevre dan û sitandin, da ku li dema pêwist amadebin. (Civata Xoybûnê) tevgera xwe ferehkir û bi Kurdên Evropayê û yên Emerîkan re dan û sitandin û li wan welatan di nav kurdan de hin liqê xoybûnê vekirin.

Şehîdê nemir Şêx Evdirehmanê Garisî[1] li Mûsilê, niwênerê (Xoybûnê) bû, xebateke neteweyî pesindar li navbera serokên hoz û melbenda serdariya (xoybûnê) dikir û tevgereke xurt û bêrawestan û gelek dilsoz li navbera sê dewletan (Tirkîyê, îranê û sûrîyê) û bi hevaltîya Mela Ehmedê şûzî dikir ji bo arîkarîya şoreşa Agrî bidin, ya ku bi serokatîya (Ihsan Nûrî) paşa bû.

Şêx Evdirehmanê Garisî û bi hevaltîya (şûzî) bê rawestan li nav kurdan digera, ji sala /1929/ ta cezeran li sala /1932/ şehîd bû.

piştî şoreşa şêx seîdê nemir herivî, «Ihsan Nûrî paşa»

---

1 - jiyana şêx Evdirehmanê Garisî.

pena bire îraqê. Lê ji ber ku çirîsokên agirê şoreşgêrî di (cabikcor û sason û Ararat û hin deverên din de mabûn, lewra ihsan Nûrî paşa û herdu hevalên xwe Rasim û Xorşîd (li gora Qedrî beg dibêje) biryar dan ku ji dewleta (îraqê) der kevin û xwe bavêjin hembêza şoreşgêran û di çiyayê Araratê de tevgerek bikin. Xwestin sînorê dewleta îranê bibirin, lê Rasim hate kuştin û xorşîd vegera (îraqê), belê ihsan Nûrî rêya xwe bire serî û bi canekî nebezîn hemû astengên bi tirs dane pişt xwe û giha çiyayê Agrî, û di maweyeke kurt de di nav xelkên Araratê de nav û dengê xwe derêxist, sedem ku mirovekî xwedî bawerî bû û di rêçikên rêxistin û yê birêveberî de gelek şehreza bû, dikarî şoreşgêran rêkbixe, û hêzeke bîrber û şehreza avake. Û gava (Xoybûnê) ageh lê bû ku Ihsan Nûrî paşa li nav ciyayê Araratê ye, yekser ew bi niwênerê xwe li wir destnîşankirin, û pêşewayê hêza Araratê danîn. Û wî jî dest bi xebata xwe kir û bi melbenda serkirdayetiya xoybûnê ya giştî ve xurtkir, û xebata xwe a çekdarî li gora ronahîya ku ji melbenda xoybûnê digihayê, li ser diçû û ne tenê hêza leşkerî pêkanî, belê bingehê hikumeta bajarî danî, ew jî bi serokatîya (Berahîmê paşê ê Hisikî). Û Qedrî beg dibêje: «civata xoybûnê» celalê Birahîm serokê eşîra Hisikê ji bo wilayeta Agrî (araratê) destnîşankir, piştî ku ew kire ceneral (paşa). Herweha kargêr û mûçexwer ji bo wilayeta (Agrî) danîn, ew jî evên ha bûn: Serokê cendirman di wilayetê de, teymû axa bû, Qaymeqamê devera korxanê:

Mela Hisênê efendî bû, Midîrê Nahiya Botê: Hesenê efendî bû, Midîrê Nahiya Korê: Mûsa axayê Birkelî bû, Qayimeqamê devera Koaxanê: Emrîn axa bû.

Û hêzên şoreşgêrî serdestbûn û devereke fereh vegirtin û wan cihên ku girtibûn: «Ararata mezin û ya biçûk û cihên torbaxû Kelhê, Kardok, Tendirok, Aldax, Mîlêc, Kêrik, Êrhebiş, Zilan, Eyaxa û Barkêrê û Diyadînê»

Di nav şoreşgêran de, bilî Ihsan Nûrî paşa û Birahîm paşayê Hiskî; serokê din ji ên naskirî hebûn, weku: Dîmêr paşa û Emîn paşa yê oxolar û Memo beg, Nezîr begê Heyderan, Ferzend beg û xalid ji Hesenan û seîdê Resûl axa û Hisên axa..»

Şoreşê piştî rewşa xwe rêxistin û bi ser û beer kirin, rojnameyek bi navê Agrî derêxistin û di nav jimarekê de marşa xwe ya leşkerî nivîsîn.

## AGRÎ

Agrî Agrî tu agrî bû
Nav dinyayê serbilindbû
Li Kurdistan tu çira bû
Hêlbe Agrî hêlbe Agrî
Ronahî direşand her deran
Agir dirijand ser seran
Erd dihejand car caran
Hêlbe Agrî hêlbe Agrî
Ji hêrsa te lav revîbû

Her kevirê te çon agrbû
Wê çaxê te dizanîbû
Toranî neyarê (Arî) bû
Hilbe Agrî hilbe Agrî
Bêşek dîse hirsa te hat
Ew agiran bûne kelat
Kombûn êdî ser te civat
Hêlbe Agrî hêlbe Agrî
Şerq û xerb basik girtîye
Ser singa xwe lav girtiye
Kurmanca ra sitarbûye
Helbe Agrî hêlbe agrî
Newalên te tijî xwîn bûn
Xilxil tijî cendek bûn
Raste berê agir tu bû
Îro agir lawê te bû
Hêlbe Agrî hêlbe Agrî
Roja azadî ser te hilat
Ronika te da Besra Reşat
Nav miletan azadî çand
Hilbe Agrî hilbe Agrî
Ser singa te sî girtîye
Ala Kurdan pêldidîye
Kurdan re tu Kawa bûye
Hêlbe Agrî hêlbe Agrî
Hêlbe Agrî hêlbe Agrî
Ji sawa te tirk digrî

Te dî çawa Rom revî
Hêlbe Agrî hîlbe Agrî[1]

Şoreş di xebata xwe ya leşkerî de berfereh bû, Leşkerên şoreşgêr di rûyê hêzên tirkî de rawestan, ew hêzên ku dixwestin Kurdan awarekin û wan bi guhêzin nav hundurê tirkîyê, li gora biryara dewleta tirkan dabû. Eva ha piştî şikandina şoreşa şêx seîdbû. Pêşewayê şoreşê destpekir li nav komelê kurdistan, rêxistina civata xoybûnê beladikir.

dewleta tirkan ageh li hêza wî hebû, li ser damezrandina xoybûnê jî bihêstibû. Herweha dewletê dizanî ku li cihên din jî, weke samson û cabikcor tifikên şoreşyêrî hene ku agirê wan hîn sarnebûye. Lewra li sala /1928/ an biryara lêbihûrtina giştî yan destûra «paşxistina ceza» derêxist. Û dewletê ji şoreşgêran xwest ku bi çekên xwe ve xwe bi tirkan bisipêrin, û hin kes ewên ku li derveyî tirkiyê bûn vegerehan, weke: Elî Rida Kurê şêx seîdê pîran, Ehmedê Emînê perîxanê serokê eşîra Reman, ev herdu endamên civata xoybûnê bûn. Ev lêbûrîna ha bi ferzend zanîn û vegerehan. Û ji Araratê hina ji xwere bi ferzend zanin, vegerehan, xwe dane ber siha Tirkan. Li ser vê demê Ihsan Nûrî paşa di bîranînên xwe de dinevîse û dibêje: «sedema vê destûra paşxistin bû ku hin ji awareyên Kurd vegeran û jimara hêza Agrî kêmbû û xwarin û arîkarî ji ser me girtin, lê dîse li me kar nekir û raya me li ser Roman (tirkan) nehate guhertin». Wî ji yani Ihsan kire ferezen, ji bo hêzên xwe xurtke, herwekû,

Qedri beg dibêje: (ji bo vê mebestê bû li sala /1928/ an li cihekî nêzîkî pira şêxlî ya ku ji melbenda wilayeta Bayezîdê (30 k.m) dûre, Ihsan Nûrî paşa û hin hevalên xwe bi hinek ji niwênerên Dewletê re, rûniştin, û di wê çavpêketinê de dan û sitandina wan li ser rengê pêkanîna wê lêbihûrtina giştî ya ku Dewletê bangdêraye, çûnke hîn gelek ji wan kesên ku talanbûne û ji derveyî welat û Enedolê awarene û ev mercek ji yê meye û ji bo dil-pakîya xwe rastiyê bidin xuyakirin, divê hun van kesan li cihên wan vegerênin û her tiştên wan ji wan re vegerênin, û /550/ miterlyoz û pêncî /50/ balafirên cengawerî[1]. Ev hêza leşkerî di Araratê de roja yazdehê (11) cezeran, li sala /1930/, di şerekî de bi hêzên ku ji sê mehan ve xwe amadekiribû êrîskir, vî şerî ta bîstê /20/ cezeran dirêjkir, û şerekî gelek dijwar çêbû. Û netenê leşkerê (Tirkî) tu serketin bi dest nexist, belê şikest û gelek xisirî û Kurdan gelek talan birin û bi hêztirîn û dijwartîn şerên çêbûn, ew şêrên ku ji bîstê /20/ cezeran ta bîst û heftê /27/ tîrmeha /1930/ li devera pişt gelîyê zîlan çêbûn. Rojnama (taymiza Lendenî) di roja /24/ ê tîrmeha /1930/ de nivîsiye: «jimara leşkerê Tirkîyê ewê ku êrîşbiriye ser Araratê digiha şêst /60/ hezar serker. Lê tirk gelekî xisi-rîn. Û heşt sed /800/ ji wan hatin kuştin, û birîndar /2000/

---

1 - Kendal di lêgerîna xwe de dibêje di şerê mehekê de hêzên Kurdan karîn hezar û heft sed /1700/ leşkerên tirk bidîl bigrin û destê xwe danîne ser /600/ mitilyoz û /24/ top û /12/ balafî.

, û heftsed /700/ ji bi dîgirtine, lê pêmayî û talan gerekiyên cengawerî gelekin. Lêbelê leşkerê Tirk ê şikestî û sedema vê bû serekê wezîran (Ismet Îneno) doz li komita niştîmanî kir ji bo derxistina destûra lêbihûrtina giştî, û berî derxistina destûra lêbihûrtina giştî, fermaneke birêveberî derêxistin û li gora wê awareyên kurdan vegerin cihên xwe yên berê. Herweha girtî jî ji bendîxanan berdin, ceneral Ihsan Nûrî paşa ji vê yekê sûdwergirt û hêzên xwe xurtkirin· û bi rengekî weha ku hêzên wî mezintirîn hêzbûn, ji lewra dewleta tirkî hêzên xwe hemû û bi jimareyeke mezin bire Kurdistan da derba kuştinê li şoreşa Kurdî bide, piştî ku di salên berê de (1928 - 1929) herivandina hêza leşkerê xwe dîtibû, Qedrî beg di bîranînên xwe de dibêje: «Gava dewleta tirkî şivîla Araratê dît, bê çawe rêxistineke birêveberî û hêzeke leşkerî amadekiriye, lez berê xwe dayê û xwast wan nehêle, berî ku rengekî pêşketîtir û xeter mezintir belo bibe. Leşkerekî mezin û dibin serokatiya (salih paşa) de rêkir ev leşkerê mezin pêkhatibû ji çil /40/ hezar peya û deh / 10/ topên betarî revok berê xwe da gelê bêst û pê da tora xwe ji wan bistêne, ji devera Araratê sed û sih /130/ gund şewitandin û bihtir ji du sed /200/ gund dîse li devera zîlan ew ji şewitandin û bihtir ji deh hezar /10000/ mirov kuştin.

Di anîya cengê de û ji hemû rexan ve şer dijwarbû ji sêzdeh /13/ cezeran sala /1930/ ta sêzdehê /13/ tebaxê /1930/ vî şerê xurt, dirêjkir(1) û li pêşya van serketinên

mezin yên hêzên şoreşa kurdî di Araratê de şahê Îranê dilê wî ne teser bû û ev serketinên ha ji wî re tirsbû, wî didît ku hokarekî xurte ji bo herivandina darê wî li Kurdistana Îranê, nemaze di rojên bên de (jiber ku tevgera simko axayê Şikakî hîn hebû û li ser piyê xwebû;. Lewra ji bo daxwaza tirkan ya ku (Îranê) kir li ser sera stkirina sînor erêkir û bi hesanî li hev hatin. Û sozên ku bi Ihsan Nûrî paşa û bi (xoybûnê) re û yên ku bi Ermenîyan re dabûn pişt guhê xwe avêtin û rê ji hêzên (Tirkî) re di axa Îranê de vekirin û li şoreşê zivirîn, sinor birîn û ji rojhelat ve yanî ji Îranê ve, li şoreşê dan û rê li wan teng kirin û ji hemû alîyan xelek girtin . Û çend heftî pêve çûn, ji birçîbûn bêzar bûn, neçarbûn ji tirsa mirina zarokên xwe û mirovên xwe, Ararat hiştin û pena birin Îranê, di êlûna sala /1930/ de.

Ji bo lihevhatin û serastkirina rewşa herdu dewletan Tirk û Îran di nav xwe de li ser rêkevtinekê di roja /23/ yê çilê paşî ji sala /1932/ de morkirin û li gora vê rêketinê, Îranê hinek ji axa Kurdistanê ya dikeve rojhelatê Araratê, bi dev Tirkîyê ve berda û beramberî wê tirkan ji devera li nêzîkî (wanê) dikeve bi Îranîyan sipartin.

---

1 - (Kêşa Kurdî) Dr. Bileç şerko: Sedema wan şikandinên pêrgî leşkerê tirkî bûn, bê çarbûn ku ew kesên zayina wan di van salên ha de ye (1901, 1902, 1903, 1904) ji ba leşkerî xwestin, û ji ber vê bû xişkandina êrîşberî guhestin destpêka meha êlûnê ji sala /1930/.

Bi vî rengî şoreşa Araratê domahî pê hat, piştî ku serokê wê Ihsan Nûrî pena bire (Îranê). Û balafirên Tirkan bêvebir bi dirêjahîya çend mehan gundê Kurdan dişewitandin û şoreş pelixandin. Rojnama Millet ya tirkî wêneyê gorekê derêxist û li ser kêla wê nivîsîbû: (Ev gora wê Kurdistana ku di guman de ye).

# BIRYARA ÊRÎŞDANÊ

Ev biryar ji heft bendan pêkhatiye û bi zimanê Kurdî hatiye nivîsandin, ev deqê wê ye:

1 - Di roja (11) yazdehê cezeran, sala (1930) an de, dijmin êrîşkire ser Agrî û kopê (Qabak - tepe) ewê ku li rexê bakurê rojavayê Agrî dikeve, dagîrkirin. Û di vê êrîşê de şeş firokan havpişkî dikirin û ji roja (11 - 18) balafirên dijmin di asmanê Agrî re bilind dibûn û dever bumbebaran dikirin.

Hêzên Agrî nemerdî nekirin, şerê wan kirin û bi agirê xwe sê firoke hingavtin, yek ji wan li Bayezîdê di Balafirgeha wê de ket û firokevanê wê hate kuştin.

2 - ji hêzên Agrî re, pêwiste ku destekên guhêzok li binkeyên dijmin yên ku li rexê Agrîne, bidin. Herweha birê navendî agedarkirin ku hêzên xwe bi çiyayê tendirok ve rêkin da li ser koçên supayî rê bibirin, li çuxê çûn û hatin. Fêleqek supayê tirkî ji başûrê rojavayê Enedolê ve rûkire Agrî û ber pê diçû, da êrîş bi ke ser hêzên me, belê nekarî bi pêş de biçe ji ber wê lebat û xwe amadekirina mezin ya ku hêzên me li Dêrsim, xerpût û deverên başûr yên di sînorê sûrîyê de, hebû.

3 - Melbenda damezrênî ya xogbûnê: Bi destûra xwedê.. destpêbikin û êrîşbidin hêzên tirkî:

A - Temer axa pêşevanê giştî yê hêzên derekan li Agrî: divê bi xwe û hêzên bindestê xwe ve û bi alîkarîya eşîra

xwe - şimika - di Qolpê de li roja (3) sisîyê tîrmeha 1930 an de rabe û li ser qeza Qolpê êrîşbike û piştî ku deşi deyne ser bajêr, pêwiste hêzên pêşmerge berdewambin û ta ji wan bê deverên din di bin destê xwe kin ta ku bigihin gundê Bernafotê.

B - Di şeva çarê tîrmehê de pêşevanê devera Qorxanê serheng - welî beg - bi piştgirîya hêzên xwe û hin kes ji herdu eşîrên Girikan û zîlan êrîşek ji nişka ve bidin ser bajarê Exderê û bigirin. Û her di wê rojê de hêzên Agrî rabin û li geraxê Agrî êrîş bidin binkeyên dijmin.

4 - Serekên eşîran yên ku li gundê Dêrnê hûn li roja înê çarê Tîrmehê, hêzên xwe agedarkirin ku bilebitin û êrîşkin ser binkeyên hêzên tirkan yên ku li deverê, li nav wane û têde cihgirbibin, bi rê ve ji berîya ku deverê ji dest wan derêxin û bi vî rengê ha bi rê ve bibin:

A - Devera Ercîşê, alîkarî ji Gelîyê zîlan bistînin û bi ser binkeyên dewleta tirkan de bigrin û ta bajarê (Adil ciwazê) vegirin, û piştî ku dest deynin ser vî bajarî, ev hêzên ha biçin kopên çiyayê sîpanê li bin destê xwe kin, herweha bilindcihên ku dikevin başûrê (Adil - ciwazê) wan jî bigrin, paşê siwaran bi rexê Axlat, tatuwan û çiyayê Nemrûd ve rêkin.

B - Serokê Gelîyê Zîlan; Divê tu devera çiyayê Aladaxê dibin destê xwe bikî, piştî ku tu devera xwe ji hêzên tirka paqijkî di pey re destikên siwaran ên jêhatî û bikêr, bi rexê (Melazgirtê) ve rêkî da bi hewara eşîra Hesinan ve biçin, û divê hun rêyên ku diçin bajarên Qerkose (Tirk

niha ji vî bajarî re dibêjin Agrî), Melazgirt, Batnos û Ercêş, hemûyan bigirin.

C - Pêwiste ku eşîrên Heydeeran yên ku li devera Batnosêne bi peyayên eşîra Melazgirtê, ku li tayê me ne, bajarê Batnosê û kopên ciya yen ku dikevine bakur û rojavayê çiyayê sîpanê, li bin destê xwe kin, paşê destekên siwarî bi rexê çiyayê Nemrûd, Mûş û kobî, bigrin û çavên wan li ser lebata dijmin vekirîbin.

Ç - Devera Bargirê: pêdivê ku hêzên we herdu deverên, Bargirê û Ernis vegirin û rêyên ku ji bajarên, wanê Ercîsê û serayê ve tên, bigrin.

D - Devera navendî: BI ALÎKARÎYA CELALÎ Û Milan digel wan eşîrên ku li cihê Alga dijîn, hemû bi hev re rabin û paşê ev hêzên ha yekser û dibin çavdêrîya min de rabin, melbendên herdu bajarên Bayezîd û Agrî dibin destê xwe kin, paşê sêsed çekdar bi çiyayê tendirok ve rêkin ji bo piştgirî û bihêzkirina şergehên şervanên Bargirê ev hêzên ha hemu ji bajarê wanê û serayê re li ser dijmin tirsekbin û ji van bajarên ha; wanê, Tarb Serayê, Başeqlê û Hekarî, çi dibê nabê bizanin.

E - Devera ercîsê: Ta ji te bêt alîkarîya devera Navendî bike.

Ê - Serokê eşîra Ademan, Qayimqam Birahîmê axê: Bilezîne, destê xwe bide destê Elî begê Mîrza axa Resûl begê zilî û serokên eşîra Qotan û Hese sorî. Pişta hev bigrin û di roja înê de, çarê tîrmeha /1930/ êrîş bidin ser bajarê Diyadîn û rêya Qerekose û Bayezîdê baş bigrin û

çavbelbin û li ser lebata dijmin agehdarbin, remaze li Qerekose û bi alîkarîya Hemîd beg, rêya ku diçe Tahir, tev bikin agir!.

H - piştî van deverên ku min destnîşankirin, ku we girtin bila hêzên Ercîş, batnos û zîlan rabin û bihtirên hêzên xwe li pişt xîşka Dotax Melazgirtê komkin, herweha şergeha Bargirê hemû hêzên xwe di Ernês û Nortaşê de komkin.

4 - Melbenda serkirdayetîya giştî di agrî de li ser kargêrîya şerî ku hun çi jê dizanin ji mere rêkin vê melbendê.

Û Ihsan Nûrî bi xwe hin talîmat ji peyayên xwe re derêxistibûn bi navê talîmatên giştî ku pêwiste di kargêrîya şeran de bikarbênin. Û ev jî deqê wan talîmataye:

1 - Her melbendek ji xwe re serdarekî helbijêrê û navê wî ji min re rêkê!


2 - Her melbendek ji xwe re birêveberîyek li deverê pêkbîne, li gora jimara şoreşgêran û xwarin ji wan re peydake.

3 - Talanên ku şoreşgêr bidestdixin, wekû, çek û fîşek û top û hemî cor ji tiştên leşkerî. Û malê dewletê û yê supa giş dibin yên dewleta Kurdî. Û di embar û îsiran de kombikin û divê ku jêre berpirsiyarekî destnîşankin, bê ku kesbikare pê bilîze û destdirêjîyan bike, ji ber ku ev malê gele!.

4 - Eger hatû efser, leşker û kargêrên tirkan bi me re

rawestan û alîkarî bi me re kirin, divê em ji dest xwe bernedin lê ta ji me bê em haj xwe hebin û em ji wan ne pişt rastbin. Divê haya me ji cihên lasilkê (bêtêlê) bebê, telefon, têlxirafan sasikarkin. Û em ji wan kargêrên ku bawerîya me bi wan bêt, em ji şehrezayiya wan sûd wergirin. Tenha xetên pêgirêdana di navbera me û dijmin de wan bibirin.

Divê ku balafir û balafirgeh, xetên lasilkê û pêgerên lasilkê bêxin jêr siha çavên xwe û awra we jê nekevê, û hun nehêlin ku kes bikarê lê nêzîkbibe.



Ehsan Nûrî paşa digel hin Çekdaran


MUHAYYEL
KURDISTAN
BURADA
METFUNDUR
AGRI

## 2 - PIROJEYA ŞOREŞEKÊ JI BAŞÛR:

Lê ka melbenda serkirdayetîya xaybûnê a giştî, berambe rî vê rewşa perîşan li Araratê çikir?

Piştî damezrandina xoybûnê, serkirdayetîya wê bi hemû xurtîya xwe berê xwe da tirkîyê û gelekî zû li hemû deveran, li hundurê tirkîyê û derveyî tirkîyê, Evropa û Emerika, hevalbend ji xwe re peydakirin.

Ihsan Nûrî paşa di bîranînên xwe de dibêje: «ji bo danîna rêkxistinên (xoybûnê) di kurdistanê de û pêkanîna berxwedaneke giştî; min bi gerekî zanî ku ez destekên pêşmergeyan rêkim hundurê kurdistan, da ku tirkan mijûlkin, ev ji rexekî û ji rexekî din ve hinek ji destekên xoybûnê rabin[1]. Û serkirdayetîya xoybûnê gereha da rê bibîne ji bo dan û sitandin li navber melbenda giştî û deverên din de çêbibe. Mela Ehmedê şûzî dibêjê ku ew (şûzî) û şêx Ebdirehmanê Garisî gelek xwe westandin û bi arîkarîya Ermenîyan, karîn rê vekin û di nav parçên

---

1 - Di vê demê de serkirdayetîya xoybûnê hinek guherîn di nav de çêbûn, ji damezrêneran: Elî Rida kurê şêx seîd, Emînê Ehmed serokê Rima, ew lêbihûrtina giştî ya sala (1928) di destê xwe de bi ferzend dîtin, ji ber vê qasê ji / Xoybûnê/ derketin û xwe bi dewleta tirkan sipartin, lêbelê Cemîlê paşê Qedrîyê cemîlê paşê û Osman Sebrî serokê hoza Merdîsan li sala /1929/ hatin hundurê serkirdayetîya Xoybûnê Her weha Mehmûdê Birahîm paşa serokê hoza Milan ji serêkuniyê ew jî derbasî nav serkirdayetîya Xoybûnê bû.

kurdistanê de (tirkîyê, Îraq û sûrîyê) girêdan û dan û sitandin pêwiste ku hebe û li gora dîtina serkerdayetîya xoybûnê peywendiyên xwe girêdidan. Li nav hoz û xêlên kurdan digeran û ji serokan dixwestin ku hevalbendîya xoybûnê û alîkarî pêre bikin, nemaze li maweya berî şikestina şoreşa Agrî, ji ber serkêşiya Agrî bi alîkariya Ermenîyan, karekî weha kir, şahê Îranê destê alîkarî ji şoreşê re dirêjkir û rê ji wan re vekir ji bo gihandina xwarin û çek û hemû gerekîyên şoreşgêran.

Gava fen û fîtên tirkan ne çûne serî, bi hildêrana lêbihûrtina giştî yan (Destûra paşxistin) li sala /1928/. û dît ku şoreşê ji vê lêbihûrtinê sûdwergirt, ji ber ku girtî berdan û yên dûrkirî vegerehan. Û bihtirên wan kesan çûne nav rêza şoreşê eva ha ji şoreş bihêz û xurtkir. Lewra Hikûmeta Tirkan bi şivîleyek eşkere hêzên xwe civandin û êrîş bire ser şoreşê Herwekû berê me gotiye Gava serdestîya van hêzan belobû Ihsan nûrî paşa serokê şoreşê nameyek ji serkerdayetîya xoybûnê re rêkir pirsa alîkarî dike da wê êrîşê ji ser xwe sivik bike.

Li vir serkirdayetiya xoybûnê bîr li wê kir ku ji xwarê tirkîyê (sînorê tirkîyê - sûrîyê) şoreşekê pêxin. Û herweha li hin deverên din. Û ji ber vê yekê komîta navendî ya civata (xoybûnê) civînek li roja dehê /10/ cezeran ji sala /1930/ li bajarê Helebê (sûrîyê) kirin, û di wê civînê de li ser nama serdarê şoreşa Agrî rêkiribû, ku doza alîkarî li wan kiribû, bi hev re lêkolînek kirin û basa barê xwe ê giştî kirin û li dawîyê biryardan ku xwe ji

şoreşê re amade bikin û şeva sisê û çar (3 - 4) ji tîrmeha sala /1930/ nişan kirin ku gava pêşî bavêjin û di biryara wan de eva ha hatibû: Li gora serdarê leşkerî yê (xoybûnê) Ihsan Nûrî paşa didê xuyakirin, herweha rojnameyên tirka didêrin û belavdikin ku êrîşeke berfeh ya leşkerê tirkî li ser hemû devera Araratê heye û ji yazdehê /11/ cezeran /1930/ despêkirine û mebesta wan qirkirina gelê kurde. Ev babetê ha yê ku nû peydabûbû, taybetîbû. Ji gotinên rojnaman me zanî. Û dîse deng û basên taybetî ji niwênerên me yên li kurdistanin ji mere hatine, bi vî rengê ha: «Ev êrîşa ha li ser devera Araratê, ew bi xwe qelandina gelê kurde li deverên: Agrî û wanê, Betlîsê û Erderomê. Li gora gotinên rojnameyên Tirkî dibêjin, leşkerê Tirkan çi gundên di rêya xwe de dibînin dişewitênin û gundiyan qirdikin. Û di dilê wan deye eger li rojhelatê welat, di vê êrîşê de serketin, wê êrîşbidin rojava û xwarê rojava û wek li vir kirin, li wir jî bikin, bi rengê ku yekî kurd nemîne da bi kare kêşa kurdî ji hev belavbike».

«Civvata xoybûnê dibîne ku em hê negihane, ji bo em serhildaneke giştî li hemûyê welat bişarênin û ta vê gavê rêkxiraweke xurt pêknehatîye da ku pêşkêşîya wê serhildanê bike. Lê eger me rastiyek xiste ber çavê xwe; eger hatû Tirk di vê êrîşê de serkevin, damû dezgehên birêveberîya Araratê dê bi pelêxin. Ya ku em dibînin nûkirina kêşa kurdî a neteweyî di laşê wê de şîndibe. Herweha ji me jî hêvîyeke, em bikarin rê li ber dijmin

bigrin da Kurdistan xopan nebe. Komîta navendî neçarbû, biryarek da ku ji hêzên Kurdî êrîşekê rêkbixin, ji xwar destpêbikin û bi jor ve biçin da hêzên Tirkî nekarin pêşve biçin û nehêlin bi armanca xwe bighin û ji bo ku Tirk dest ji qirkirina Kurdan berdin».

«Û bi vî rengî biryara Komîtê ew bû ku bi destûra xwedê dest bi êrîşeke çekdarî bikin, roja duşemê şeva (3 - 4) ê tebaxa /1930/ xîşkebazek roşin ji xwere danîn û ji bo rêberîya kargêrîya leşkerî dibin siha serkirdayetîya nû de bikare bi armanca xwe bigihe»—

(Xoybûnê) bi Ferensayê gihandibû, ku serkirdayetîya xoybûnê ji bo agirê şoreşê di Tirkîyê de pêxe. Û Ferensayê bi vî rengî bersiva wan dabû: «Eger şoreşa wan serneket û li sûrîyê geraneve, Ferensa dê wan bigre û wan bavêje ben dîxanan» serkirdayetîya xoybûnê li ser mercên Ferensayê herêkir û xwe ji şoreşê re amadekir ku di şeva /3: ser - 4/ ê Tebaxê ji sala /1930/ êrîşbikin. Serkirdayetîya xoybûnê anya şer ji cerabulsê ku li ser ava Feratê dikeve, ta (Indîwerê) li ser ava mezin (Dicle); li ser pênc deveran ji rojava ta rojhelat bi ser endamên Xoybûnê de levakirin[1]:

1 - Devera Kobanê (kaniya Ereban), Bozanê şahîn begû birayê wî Mistefa beg, herdu serokên hoza (eşîra) Barzan

1 - Qedrî beg di bîranînên xwe de dibêje: (Anya şer şeş dever bûn. Lê bi rastî di warê karde ji pênc dever û pênc serkirdayetîyan me nedîtin. Lê em nizanin kîjan dever ya yekê bû, paşê ya diduwan.. H. T. d.

û berê wan li Orfayê û Mereşê bû. Bi wan re jî Osman Sebrî diçû da paşê ber bi eşîra xwe Merdîsanê here.

2 - Serêkanîyê hêzek bi serokatîya Mihemed begê Birahîm paşa, ber bi Wêranşehrê êrîşbike.

3 - Devera Derbasîyê: Ekrem Begê Cemîlê paşê û pêre jî Qedrîyê cemîlê paşê, ber bi Mêrdînê biçin.

4 - Devera tirbesipîyê: Bi serokatîya Haco Axa serokê eşîra Hevêka, bi hêza xwe ve ber bi cihê Hevêrka biçin da ji wir êrîşbikin.

5 - Devera Dêrikê: Celadetê Bedirxan beg serkêşiya vê hêzê dikir û pêre Mihemed Begê cemîlê paşê û hinek ji begên devera botan weke (Resûl axayê Mihemed) serokê eşîra zîlan û bilî wî jî hebûn.

Belê bi hevre rêkketin ku hêzên (celadet) jî, ta sînorê tirkîyê bi rex hêzên Haco re biçin û paşê ava mezin (dicle) bibirin û ber bi cihê Botan herin û li wir agirê şoreşê pêxin.

# DESTPÊKIRIN!

Ji roja hivdehê /17/ ê cezeran despêkirin ji bo şeva êrîşê xwe amade dikirin û ta şeva /3: ser - 4/ ê tebaxê ku şeva êrîşê bû, lê ka encam çibû:

1 - Li devera Kobanê (kanya Ereba) di şeva /3 - 4/ ê tebaxê de, destek ji hêza Bozan beg berê xwe dane (Orfa) û bi serokatîya Osman sebrî[1], êrîşkirin ser du binkeyên (mexfer) leşkerî li devera (Nahiya) serûçê û paşê rawestan û li benda serdarên hêzan, Bozan beg û birayê wî Mistefa beg man, belê herdu serdar negehan peyayên xwe. Û sedema vê bû zilamên wan bi şûnde li melbenda despêkirin (Kobanê) vegerehan.

2 - Dever Serêkanîyê: Ne hêz û ne serokên hêzê ji cihê xwe nelebitîn.

3 - Devera Derbasiyê: Em werin guhbidin Qedrîyê cemîl paşa di bîranînên xwe de çi dibêje: «Di wê maweya ku ji êrîşê re xwe amade dikirin, bi serokên eşîran re li devera ku dikevê navbera wilayeta Mêrdînê û Nahiya Dêrikê[1] peywendi kirin û bi hevre dan û sitandin. Sozdan, bi wan re rabin û bi hevre êrîşbikin ser Mêrdînê û şoreşê li wir pêxin. Lê gava hêz gihane ser sinor serokên

---

1 - Wê çaxê li Reqayê dûrkirîbû, bazda û xwe gihande hêzên Bozan beg û birayê wî da biçe Tirkîyê û paşê biçe nav eşîra xwe û li wir agirê şoreşê pêxe.

eşîran ji soza xwe vegeran û li gotinên xwe poşmanbûn (bilî hin ji wan). Lewra hêzên çûbûn neçarbûn dest ji êrîşa ser Mêrdînê berdan û vegerhane sûrîyê.

4 - Li devera tirbesipîyê Haco Axa serokê hêzê bû bi peyayên xwere gihane tirkîyê û li gundê (Dêr - Hebabê) Haco bi Hisênê çelebî re ewê ku yek ji mirovên wî bû û yek ji wa kesên ku di ber Haco re serokatîya Hevêrka ji xwe re dixwest, peywiendî kir, ji Hisênê çelebî xwestin bi wan re rabe xwe amade bikin, dijê tirkan şoreşekê pêxin, lê bersiva wî; doz li Haco kiribû ku mala xwe, jin û zaroyên xwe ji sûrîyê bîne û li tenişt xêzanên wan li tirkîyê deynin, yan jî xêzanên wî, jin û zarokan ji Tirkîyê biguhêzin sûrîyê, bila bi hevrebin, li xerabi û destdirêjiyên tirkan nêzîkbin. Û eger ji Tirkan dûrbin, bila bi hevre dûrbin. Û wê çaxê em amadene pişikdarîya şoreşê bikin. Lê Haco axa bi ya wî ne kir, nebir û ne anî. Lewra Hisênê çelebî di rûyê Haco de sekinî û havpişkî di şoreşê de ne kir û çek di rûyê wan de bilindkir û bi xurtî rê li ber wan girt û ne hişt pêş de herin . Haco axa bi şûn de li sûrêyê vegereha, bê ku karê ser milê xwe pêkbîne. Bi vî rengî celadetê Bedirxan beg bi hêza xwe ve ya ku hêzên (Haco) ji pêre bûn, hemû vegerehan û şer destpênekir û berê şer herivî.

Bi vî awayî hêzên hemû deveran di karên xwe de serneketin û şoreşa Araratê bi serokatîya Ihsan Nûrî paşa bi tenê û bê alîkarî ma da çarenûsa xwe ya berbî mirinê bibîne, û dawîya şoreşê bi vîrengî hat.

# GUNEHKARÎYÊN TORANÎYAN DI PEY HERIVANDINA ŞOREŞÊ RE

Dektor Beleç şêrko di pertoka xwe (kêşa kurdî) de li ser hin ji hovîtîya leşkerê tirkî ê serketî dibêje:

Hêzên Tirkî dijê Kurdan hovîtîyek kirin ku anya mirovayetî jêre nişûv dibû. zarok, jin, yên pîr hemû dane ber devê dasa şer û hemû karên hovîtî û nelibarî bi wan kirin, û ji wan karan:

1 - Du sed û bîst /220/ gund kavil kirin û gundîyên ku deh hezar /10/ kes bûn, hemû di gelîyê zîlan de komkirin û topbaran kirin û tev kuştin.

2 - Bihtir ji sed /100/ kesên roşenbîrên kurd û welatperwer, bi saxî li hundurê gûnîyan (çewalan) kirin û başê derê gûnîyan girêdan û di nav gola (wanê) de berdan.

3 - Li dora çolemergê ji melbenda hekarîya, sêsed /300/ gund şewitandin û bihtir ji pênc sed /500/ kesî, ji pîrek û zarokan bi hovîtîyeke bê havta, kuştin.

4 - Li rexê çiyayê Agrî çarsed /400/ gund wêran kirin û bi agirê top û tangan gundî şewitandin.

5 - Hêzên Tirkî bi serokatîya (cewad) paşa ji wilayeta Hekarî ta (Beytşebabê), paşê ta Şemdînan, di rêya xwe de ew gundên alîkarî kiribûn û piştgirîya şoreşê kiribûn; hemû şewitandin û giha sed û bîst /120/ gundî ku tev wêrankirin.

6 - Hêza Tirkî a êrîşber ji wilayeta wanê ta Çildêranê bi serokatîya Kemaledînê Samî paşa heştê û sê /83/ gund wêrankirin û pênc sed û not /590/ mirovên Kurd yên ku ketin di rêya wan de, hemû kuştin.

7 - Mufetişê giştî yê wilayetên rojhelatî ewê ku li Asîtana bû, bi serokê komarê (Xazî) û bi serokê wizaretê û wezîrê navxweyî re civîn kirin, û di civînên wxe de li rêçik û şivîleyên hovîtî digeran ji bo ku bikarin bi çi rengî bazikê hemû şoreş û serhildanên Kurdî ku di Kurdistanê de hene, bibirin. Û bi kurtî ev çend xalên xwar didin xuyakirin:

1 - Biryar dan ku jiyana eşîrtî nehêlin û kurdan bi ser wilayetên tirkî de belavbikin.

2 - Wilayetên rojhelatê bê çek bihêlin.

3 - Gundîyan ji gundekî biguhêzin gundekî bi rengê ku binemala mezin kesên wê bi hevre li gundekî nejîn.

4 - Bi kotekî û bi darê zorê kurdan bikin Tirk, ne axavtin û ne nivîsandin û ne xwendin bizimanê kurdî nekin. Rojnama (Ehwal Beyrût) li roja 13 tebaxê li sala 1930.

Lê serkirdayetîya xoybûnê ya ku dibin bar de ket û nekarî wî karê pê rabûbû pêkbîne, dardestên Ferensî li Sûrîyê ew hemû girtin û bi hundurê Sûrîyê ve birin, dûrkirin[1], li Şamê (Dîmeşq) û cihên din maweya salekê dûrkirî man, ta li cezeran sala /1931/ azakirin.

1 - Bilî Osman Sebrî ku wî bi tenê xwe bi dewleta Ferensî ne sipart û pena bire Îraqê, li wir ingilîza ew girtin û sipar tine Feresa, ev jî di sala /1931/ de bû, paşê bi girtîyên din re li sala /1931/ li meha cezeran berdan.

Bi vî rengî serkirdayetîya xoyabûnê ji destçû û nekarî pêta şoreşê li xwarê Tirkîyê geşke da ku bi kare alîkîrîya şoreşa bakur ya. Araratê bike û hate xuyakirin ku peywendîyên wan bi serokê eşîran re sereserebû, piştgirtineke xurt nebû û xoybûnê nekarî bi rêya rêkxistin wan bêxe jêr serkirdayetîya xwe. Û nekarîn bikevin nav gel û rêkxirawên xoybûnê di nav komel de cih ji xwe re çênekirin. Û nekarîn rê ji xwe re bibînin ku ew bixwe birek ji Derebeg û ji birjîwezîyan bûn.

Evaha jî belgeyekbû û nekarîna wan belo kir ku ji wan nehat serkirdayetîya gelê kurd bikin û ji dest wan dernakeve ku rêberîya şoreşek bikin, ya ku armanca wê serxwebûna Kurdistane.

Bi raya min, li ser çend hoyan vedigere:

1 - Serkirdayetîya (xoybûnê) li encamên şoreşa Şêx Seîd gelek şehreza nebûn. Û pêkhatinek giştî û amadekirineke baş nekiribûn û demê pêwist helnebijartibûn. Û gelo mercên heldêrana şoreşê kokbûn? Gelo ew dema gerek û baş ji bo heldêran, yan ji bo pêxistin û xurtkirina agirê şoreşa Agrî, dîtbûn, ta ku ji xwar ve dest bi serhildanekê bikin.

Di beyanameya xwe de gava dest bi serhildana xwarê kirin û li ser zimanê xwe eşkere kirin ku ne wext bû û têde hatibû: (ne çaxe û hê dem ne hatîye ku şoreşeke giştî li seranserê Kurdistan pêxin û ta roja vê rojê Rêkxiraweke xurt çênebûye, bikaribe pêşkêşîya şoreşê bike).

Lê ev gotin guneh ji ser milê wan nahilîne, û ew şaşîya ketnê gelekî giranbû û encamên dijwar dan, movikên Kurdistan bi xwere hêrtin.

Naxwe ji boçi ji berî çend salan agirê şoreşa Araratê û bi xurtî şarandin? Lê îro û piştî çend sal bisere çûn, hê jinû dibêjin rêkxiraweke xurt ku bikare pêşkêşîya serhildanê yan şoreşê bike, hîn peydanebûye û hîn dem ne hatiye û bizava me ne gihaye. Lê naxwe çima wê çaxê barê şoreşê hilgirtin û û agirê wê gurkirin?

Evaha dihêle ku li ser serkirdayetîya (Xoybûnê) em bikevin gomanan û em dikarin bêjin gera mezin ya Ermenîyan bû û destên wan têde hebû û karkire ser xoybûnê û ew germ dikirin û berê wan dane Araratê û ji hemû cihan Ararat helbijartin, agirê şoreşê şarandin.

2 - Serkirdayetîya xoybûnê li wan gunehkarîyên ku Mistefa Kemal dijê gelê kurd kiribû bi çavê roşin û bîreke kûr nenêrîn, û li tenişt vê jî tirseke bê sînor ketibû dilê serokên eşîran de, sedema vê bû li çaxê pêwist û gava saeta kar lê da, serokên eşîran di hundurê Kurdistan de pişta şoreşê ne girtin û havpişkî têde ne kirin. Ta ji wan hat xwe dûrkirin.

3 - Serkirdayetîya xoybûnê, sedema ku xwe lawaz didîtin û Ermenî xurt didîtin, ji lewra giringîya mezin bi xîşk û pêşniyarên wan didan.

4 - Ya ji hemŷwan mezintir peywendîyên nehênî, hin ji endaman di nav serkirdayetîya xoybûnê de hebûn ku bi tirkan ve girêdayî bûn. Ji bo mînek ew biryarnama ku

pêkhatibûna şoreşê belodikir piştî derxistina biryarê yekser bi destê tirkan giha.

Weha bû ku bi vî awayî hemû şoreşên me dê biherivin û bişikin, eger dan û û sitandin û biryarên şoreşê ji banî bin û ne ji binkeyeke şoreşgêrîbin û hemû şoreşgêr di avakirina wê de hevpişkî nekin. Û wisa pêşkêşîya wê (qiyade) destikek ji girêdanên berjewendîya jor be û ji bo çewsandina cemawerê gelek ji şoreşgêran be.

Gava şoreşgêr têgiha ku armanca şoreşê şoreşgêre, û şoreş ji bo xweşîya wî û ji bo pêşketina komel xebatê dike, bê guman hingê şoreş serdikeve.

Berê me got bê leşkrê Tirkî bi çi hovîtîyê dij bi welatîyên bê dest û pê dikirin, û bi çî awayî gund wêrandikirin. Vêce ji bo veşartina van kêrên bêrê û gunehkarîyên niwênerên dewletê, dikirin, rabûn Benda /1850/ li roja /29/ Tebaxê li sala /1931/ derêxistin û di rojnama dewletê de belavkirin. Û maweya vê bendê, ji dawiya şoreşa Araratê destpêdikir ta digiha piştşikandina şoreşê bi çend mehan. Û ev bend bi vî rengî bû: (Li deverên serhildanê ku li ber dewletê asêbûne, eger çi çêbûye ji destûrê dûrneketiye û ji rêbaza wê cihênebe û çi gunehkarî û kuştarên ku eger kitkite û yan jî bikome, niwênerên dewletê kirine û leşker pê rabûye, kê kirîye, bi destê kêye, dardestên navwelatbin mîlîşya be, yan polîsbin, ji roja /20/ tebaxê sala /1930/ û ta /10/ berçileye her ji wê salê û di rêya nehiştina serhildanê debê, ew serhildana ku li Ersîs û Zîlan û Agrî (Araratê) û qeraxên

wê û devera teftîşa pêşî ku (Diyarbekir, Îlzix, Wanê, Betlîs, Hekarîya, Mêrdînê, Sêrt) hemû digirt, ev kirên ha ji gewara destûrê dernakeve û bi gunehkarî nayin danîn.

Ev destûra ha berê hovîtîya Tirkan ya Toranî dide xuyakirin ku dijê gelê kurd kirin, di êrîşa (Vegerana aştîyê ji bo Kurdistan)[1].

Mehmûdê Bozhort, wezîrê dadgeha Tirkî li wê çaxê dibêje[2]: (Em di welatekî de di jîn ku ji hemû welatên cîhanê bihtir serbestî têde heye, û ew ji navê wê Tirkîyê ye) û dîse dibêje: (Dewleta Tirkî xwedîyê vî welatîye û bili wê kes nîne. Û ew kesên ku ne ji tuxmê Tirkîbin, mafên wan nînin, bilî yek maf, ew jî ku xadim û bende bin).

Ji vê bîra tuximperestî, Tirkên dardest bi kurdan re karkirin. Li roja pêncê /5/ gulana sala /1932/ Benda barkirin û awarekirina kurdan û ji hevbelakirina wan derêxistin û li gora wê Bendê ew kesên ku ne ji tuxmê Tirkîne (mebesta wan kurd bûn) li ser dirêjiya Tirkîyê û ferehiya wê, van kesan yanî kurdan belabikin û ew kesên zimanê tirkî wekû zimanê neteweyî ji xwe re na deynin, rê li ber wan bigrin, navê gundan ji nûve ji xwere avakin û nehêlin bajarok û cihê pîşe û dezgehan ji xwe re damezrênin .

Li gora xişka ku wizareta navxweyî deyne ewa ku

---

1 - Kendal: jêdera berê.

2 - Qedrîyê cemîlê paşê.

wezîran li ser herêkirîye li Tirkîyê çar deverên cihnişîn wê hebin[2]:

1 - Devera yekê ji bo welatîyên ku ziman û roşinbîrîya wan bi Tirkîye, da jimara kesên wê zêdekin (mebesta wan Kurdistan bû).

2 - Devera diduwan: Ew zeviyên ku ji kurdan re danîn yên ku cihguhestî û bi darê zorê awarekirin û di deverên Tirkî de rûnandin. Armanca wan ku kurdan di qewara Tirkî de biheşêvin.

3 - Devera sisêyan: Baştirîn axa Kurdistan helbijartin û bê pere ji tirkên aware re diyarî kirin, ku ew kesên bi ziman û xwendina Tirkî dizanin serbest û li gora ku ew dixwazin, di van devera de bijîn, bê ku dewlet tiştek li wan bimezêxe.

4 - Devera çaran: Hin deverên ku gereke bi darê zorê dagîrkin ji ber hoyên tenduristî û yên abûrî, roşinbîrî siyasî û leşkerî. Armanca wan ji vê yekê; parastina rijîmê bû, da nehêlin welatî, xwe bilebitênin, yan jî cihekî xwe biguhêzin cihekî. (Ev cihên ha di Kurdistan de ew deverên kêm çiya bûn).

Li gora vê bendê kurdên awarekirî û yên dûrkirî li ser gund û bajaran belvkirin, bi awayê ku di nav xelkên birêveberîyên şarewanî de 10% deh ji sedî ne bihtirbin.

Û di zivistana /1932/ de destpêkirin û li gora benda /1850/ darê zorê bilind kirin û sedên hezaran kurdên

2 - Qedrîyê cemîlê paşê û kendal herdu dibêjin.

perîşan neçarbûn ji gund û ji axa xwe derkevin û ber bi biyabanên Enadolê biçin. Ji bo mînek: ji Bayezîdê ta Ezmîrê, yanî ji dawîya rojhelatê ta biçe herî herî rojava. Û dibin darê leşker de û peyade di nav badev û berf û seqema zivistanê de diçûn. Û dehên hezaran di rê de mirin, berî bigihin cihên ku ji wan re danîbûn.

Berî darê Mistefa Kemal û hevlên wî, dewleta (Hevgirtiyan) bendek bi mora siltan Mihemedê pênca derêxistin da Kurdan ji cihên wan biguhêzin û di Enedolê de wan ji hev belakin bi awayê ku di Enedolê de 5% pênc ji sedî wan deynin û bi awareyên tirkan Kurdistanê avakin. Sedema vê bû hef sed hezar (700000) Kurd guhestin Enedolê. Û li ser vê bendê bû gava (Civata Xoybûnê) di roja /16/ cezeran ji sala /1932/ bangewazîyek da kurdan û agehdar kirin ku berxwebidin û rêya xebatê bernedin. Û têde bi vî rengê xwarê hatibû(1):

Welatperwerên serbilind û hêja.

Îro gelê me yê kurd berengarê mezintirîn xeter di dîroka xwe de dibe. Dewleta Tirkan ya ku herdem li qirkirina kurdan digeriha, lê wisa armanca xwe a berberî weke vê carê aşkere ne dikir. Bê guman we dîtiya û xwendiye ew benda çewt ya ku desteka patoxwerî xwe dibin reşperda Komîta niştîmanî a mezin de veşartîye, derêxistiye, li vir bihtirîn biryarên wê ên gunehdar û sitember em dê belokin, ewên ku di nav rojnama millet

1 - Bileç şêrko (Kêşa Kurdî) çapa sala /1930/.

a Sitembolî, jimara /2237/ li roja pêncê /5/ gulana sala / 1932/ belakir, dibêje: «Ew kesên zimanê Tirkî bi zimanê xwe ê neteweyî nebînê, nabê rêbide wan da ku gund û bajarokên xwe avakin û ji wan re çênabe destekên dezgeh û cihên pîşe damezrênin».

Gelo ma ev çiye? Ji hevbelakirin û awarekirina wan kesên zimanê wan ne yê Tirkîye û ji Tuxmekîne ku ne tuxmê Tirkîye, yanî qirkirina milyonan ji wan kurdên ku ji çar hezar sal ve û ta roja îro her û her di welatê bav û bapîrên xwe de rûniştine, û ewên niha bi wan û xêzanên (zarok û pîrek) wan ve, di nîrekî birçîbûn û hejartî, de wan davêjin Enadolê. Gelo ne roşine? Û hun nabînin, gava dewleta Tirkî poşmanîya xwe derdixe, sedema hun hemû, hîn di guhestina pêşî de, ne kuştin û hun neqelandin, lê di vê rojê de, dewlet dixwaze di nêçîrê de, yeke yek we bigre û tîra xwe di pişta we de biçikîne. Herwekî bi welatîyên Ermenîyan re kirin!! Gereke çi rengê hovîtî û dirindayetî hebe, hun di neynika zordarîya dewleta tirkan re bibînin.

Welatîyên bi rêz û hêja!!

Dîrokê dizanî û te xwe daye naskirin di nav komelê kurdî de tu endamekî jîr û jêhatîyî. Li pêşya neteweyê xwe û ola xwe, barê mezin û gunehê mezin di sitûyê te de ye. Li bin siha durişmê parastin, me nekarî ji hêza karîn û hunerên xwe û ji xurtîya xwe em sûdek bi destxin. Û li encamla wê yekê, vaye careke din em têne xapandin. Dewleta tirkan ya ku îro dikare êrîşeke dirin-

dane û bi hovîtî bêne ser me û bi dengê bilind badike ku kurdek tenê li ser piyan, sax ne hêle. Û di vî nîrî de gereke hemû dubendî û durayî û berberîya di nav me de heye em bidin rexekî û bi niwênerê gelê xwe re em çek hilgirin û bi vê rêça ha em dikarin van karên hovîtî yên dewleta tirkî ku li dijê gelê kurd dike, sînorek jêre deynin, bi hêza xwe a ragirtin û em dikarin Kurdistana pîroza ji nav destên sitemkaran rizgarkin.

«Agehdarbin, hinekî çavbelbin, bibînin! Çawe em dikarin li pêşya kotekî, direndayetî, birçîtî, hejartî, xwe ragirin. Kurdên gelê me ên dûrkirî, awarekirî nemaze birê pêşîn gelek talî (Tehlî) û nexweşî û sixêfên çewt û pîs ji destê cendirman dîtin. Bilî gotina (Kero!) ji wan re nedigotin. Gelo ji mere ne baştire ku bergirîya welatê xwe bi hêza milî û bi xwîna xwe em bikin. Ev welatê ku laşên bav û bapîrên me dibin axa wî de veşartîne. Newe bîra we û xewnê pê nebînin ku hun ji gunehkarî û hovîtîya wan bêne parastin, ji ber ku ew destûra derêxistine roşine û hemû berdikevin. Di Kurdistan de kurdek tenê namîne û cotyarekî sakarê bê pirgal namîne.

Gelî birayan! rabin, çek hilgirin.

Divê em ji gişî cîhanê re bidin xuyakirin ku em nevyên dilêrin û ji wan bavû bapîrên çelengin, em dê bi serfirazî şehidbibin û bi çelengî şer bikin. Kurdistan dê azadkin û kurd rizgarkin. Gelo ji were ne şerme eger Kurdistan dibin pîyê zordaran de wêrandibe? Eger em bi mêranî û nebezî bergirîyê nekin, ji birçîya em dê bimrin.

Wê ji bîr nekin û xemlîsnebin, li tenişt birayên xwe rolê neteweyê xwe bixebitin, nemerdî nekin û serî ji kes re nivz nekin û bixwe bawerbin. Bawerbikin eger serhildanek çekdarî di welatê me de destpêbike, dê gelek ji efser û roşenbîran arîkarîya wê bikin, û em hemû bixurtî û bi hemû hêza milê xwe di rêça xebatê de, em dê bibezin. Tu dizanî ku serxwebûna welatê me û neteweyê me, ji me tê xwestin ku em çekhigirin. Bila tu ê pêşîbe belên bide, bê erêna sozbide. Eger tu weke sexelekê hatî parastin bêguman gurên har yên tirkan li bîra wî ye ku diharî te jî bi jin û zaroyên teve bikujin çima ku tû Kurdî.

Divê tu ji bo qurbanîdan amadebî, qurbanîdan ji bo rizgarîya welatê me, da em mofên xwe yên neteweyî bi destxin û serfirazî û şerefa xwe biparêzin. Û me parek ji gelê xwe kire qurbanî jî, ne xeme, ji ber ku pişka dimîne dê bibe axayê welatê xwe û mezinê kozik û gundên xwe û jiyandka bê tirs, dilteser û wê di aştîyê de bijî.

Birayê xoştevî:

Ji dilsozî em rêya xebatê şanî te dikin, eger te bi ya me kir û eger tu xêrxwazê gelê xwe bî û eger te azadîya welatê xwe divê, bêguman gelê me û welatê me wê serbest bibe û ji benê bendayetî azad bibe, lê eger berovajî bû, divê em di wê bawerîyê de bin ku emê şerefa xwe ji dest berdin û windabikin, û tozik li ser nîne em dêne kuştin. Ho kurê gelê me ê hêja! Em hêvîdarin ku tu serfiraz û serketî bî.

Komîta Navendî (xoybûn) 16/Cezeran/1932

Piştî şoreşa araratê şikest û dawî anî, hin ji rojnama belavkirin û gotin ku civata xoybûnê herifî û xwe bi xwe dev ji kar berdan û gotin ku hin ji endamên civatê xwe bi dewleta Tirkîyê sipartin.

Xoybûnê li wan vegerand û nameyek nivîşî û ji rojnama (Doxrû yûl) re (Rêya rast) rêkir, ya ku li bajarê Helebê derdiket, li roja /12/ tebaxa sala /1933/.

Ew gotinên rojnama û govaran ku li ser xwe nehiştina (Xoybûnê) nivîsîbûn neweyî derêxistin. Û ev ji deqê nameya wa ye.

Di jimara şeş (6) Tebaxa /1933/ rojnama we, me xwend, gotarek li bin navnîsana (civata xoybûnê xwe herifand) û rojnama we paldabû ser deng û basên rojnama (Elfûbê) û ya (Bangewazî) û gotarê bela- kiribû ku endamên (Xoybûnê) civata xwe herifandin û nehiştin ji ber ku armanca wan, ew lêbihûrtina giştî ya ku dewleta tirkîyê heldêraye, ferzem deke û da ew ji berbikevin. Lê belê ev civata ku xebata wê ji bo aramancên neteweyîne û gelê kurd ji bo van aramancan gelek qurbanî daye û bi dirêjahîya gelek Salan ev qurbanî daye û niha jî amadeye her tişti û çiqas giron be, nemerdî nake qurbanî dide, da ku xwe ji bin nîrê zordarî û bendayetîyê rizgarke. Ev civata bûye pişkek ji canê gel û parçeke ji wijdana wî û jê parçe nabe. Lê serdarên pehlewan, mîna ihsan Nûrî paşa, Biro, Ferzende, Memo Nezîr û kesên dî ji kurên gel gên bi rêzû hêja, paldane ser rêkxirawa xwe û gelek serketin bi dest xistin û gelek xûpelên serfirzî di

diroka gelê xwe yê kurd de neqişandin. û cihên xwe di dilê gelê xwe de çêkirin. û eva ha îro weke rojê roşine,nemaze di vî nîrî de vê rêkxirawa niştîmanî ya ku ji bo azadkirina gelê xwe, ji xebqtê re terxankiribû, tucaran çavnêrî lêbihûrtina dewleta tirkan nakin, ew dewleta ku mafên jiyanê ji gelê kurd re nehiştiye. Û hemû rêbaz û şivîleyên hovîtî dijê gelê Kurd bikartênin û bi koman xelkê dikujin û diqelênin. Ma gelo ev ne dînîtîye ku ji vê rijîma xwînmiji ya ku her kuncek ji ya Kurdrdistan kavil û xopankiriye, em doza lêbihortin bikin. Bi hezaran gund şewitandine û herifandine, bi hezaran mirov, jin û zarok û pîr di nav kûrha cengê de şewitandin. Peyayên vê rêjîmê bun ku xelkên bê guneh deste û bir fi bir dibirin, destên wan girêdidan û paşê gulebaran dikirin. Û ev rêjîm bû gava ku Kemal Fewzî, Dektor Fuad, Mehemûd û Teyib Elî û kesên din bi sêpêyan ve helawistin, sedema ku ew kurd bûn. Û ta weke roja vê rojê her ev kirên ne mirovatî berdewamin. Û em dibînin ku derewên nelibar li ser lawêen kurd, tiştekî bêtûteyî û pîsîtîye. Û eger hat û mirovek ya dudo ji rêya berjewendîya niştîmanî derketin û dilê wan çûyê ku ji vê lêbihûrtinê sûd wergirin, bi çi awayî vê ya ha bi wê ve girîdidin; ku rêkxiraweke siyasî xwe hilweşîne. Tirkan berî pênc salan dîse lêbihûrtinek derêxistin, da xebata kurdan rawestênin, lê dîse ew bûyerên di pey re çêbûn, dane xuyakirin ku welatîyên kurd li pey doza xwe ne û ta bi armancên xwe ên pîroz ne gihin, jê na gerin û bi tu awayî nayên xapandin û

lingên xwe bi gavên pêbawerî bi pêş ve tavêjin. Û xortê kurd bawerîya wî bi rastîya kêşa wî û dadmendîya wê hatiye û pala xwe daye bingehekî xurt ku ew jî, hejêkirina welate. Înan bi armanc û bi ramanên neteweyî anîye û hêvîdare pêkanîne van mafan danîye ber çavên xwe û tucarî bê hêvî nabe û hemû hêza xebat û tevgera xwe ji bo pêkanîna çarenûseke mezin danîye. Ew roja ronahî ya dilêr û lehengên me di dilê xortan de cih girtîye û ji bîra wan naçe, her wekû belgenameyên dadgehên bêdad aşkere dikin ku di bin darê sêpîyan de badikirin: (Bijî Kurdistan). Ev şopa bê nimûne ya ku ev dilêrên hêja pê de çûn û canê xwe kirin qurban, van her du tiştan hişt ku bîra neteweyı ya ku ji bo wê surbanî dan, di ola xortan de risisî û ji wan re bû mafekî xweristî.

Bê guman li dawîyê nabe her divê gelê kurd jî wekû gelên cîhanê li jiyaneke aştî bizivirêve û em bi vê ya ha dilxweşin û omîdarin. Û gelê me hemû di vê hêvîyê de dijî û li benda roja aştîyêye, bigre ji zarokan, ewên ku nikarîne di xwendegahan de bixwênin û pîrên me yên ku rojên xwe yên dawî dihejmêrin, tev li hêvîya wê roja ronak û bextiyarin. Û her kes vêya ha dizane û dewleta tirkî bixwe ji giş gelên cîhanê bihtir vêya ha dizanê. Vêce di vî nîrîde bi çi awayî ew kurdên hêja yên dûrkirî, awarekirî ku hemû hêvîyên xwe bi azadîya welatê xwe ve girêdaye, wê vegere welatê xwe li wî çaxê ku dardestên Tirkan di siyaseta xwe a tuxumperistî de li dijê hebûna kurdan her berdewame.

Hêvîdikin vê ronkirina ha belavbikin. Û pêre rêzgirtin û dilsozaîya me ji we re.

# NAVNETEWEYÎYA DUDUYAN Û KÊŞA KURDÎ

Komîta tenfîzî a şosyalistî ya dewletî di komgirê xwe de yê ku li sihê /30/ tebaxê li sala /1930/ li ziwêrix girêdabûn, li ser hovîtîya tirkan dijê kurdan di Kurdistan de dikin, nerazîbûna xwe belo kirin. Ev jî partîya taşnak ya Ermenî ku endamê şosyalistîya dewletî bû û havpişkê nehênî yên kurdan di şoreşa Araratê de bû û di nivîsnama wan de hatibû: «Em komîta tenfîzî ya mekteba karkerên şosyalîstîya dewletî û me divê ku em cîhanê li ser wan karên hovîtî yên dewleta tirkan li dijê gelê kurd dike, agehdar. Terha gunehê wan jî ewe, ji bo ku kurdin û ji bo serbestîya gelê xwe xebatdikin. Hovîtî li dijê gelê kurd dike ewê ku bê dest û pêye, û aştîxwaze û di bizava çekdarî de beşdar ne bû ye. Wisa tirk dixwazin; ya ku bi serê Ermenîyan kirine, bi serê kurdan jî bikin. Û bê ku raya giştî ya neteweyî û ya dewletên mezin dengê xwe bilindke û nerazîbûna xwe bide xuyakirin. Û tişteke dî jî heye ku xeterek nûye. Û komîta me, we agehdar dike, li ser van xeterên ku bi aştiya cîhanê ziyan digehîne, ji ber ku dewleta Tirkan destdirêjî ser axa Farisan kiriye. Û ev jî belgeyeke ku komîta gêtî a dewletî, lawaze û nikare hêzên leşkerî yên ku êrîş dikin ser zvîyên xelkên bindest dagîrdikin, wan ragire. Komîta meya tenfîzî dozê

li dewletên cîhane dike ku li ser karesetên li Kurdistan çêdibin û gelê kurd di bin piyan de diperçiqe, dengê xwe bilindkin û ne razîbûna xwe eşkerekin»[1].

Ermenîyan (partîya Taşnak) piştî ku dîtin bê çi bi serê kurdan hat, ew gundîyên destevala û bê guneh di gundên Araratu nebez de û li deşt û gelîyên zîlana xwînawî de, çikirin û dîtin bê çawe Dewleta tirkan leşkerekî mezin û hêzeke xurt amade dikir, ji bo êrîşa ser Kurdistanê: devera ARaratê ciyayên bilind û ji Şahê Îrianê bihna xiyanetê kiribûn, û sozên biwan û civata xoybûnê û bi ceneralê şoreşê re dabûn, nebirin serî. Û bi Tirkan re li hevhatin ji bo pelixandina şoreşa ku hêvîyên xwe ên mezin li dahato, pêve girêdabûn. Ermenîyan (partîya taşnak) «yên ku xwe didîtin havpişkên şoreşa Araratêne û hebûn û nebûna wê giringîyeke mezine û barê ser milê waye, her wekû barê ser milê kurdaye, lewro ji bo wê gelek xebitîn û bi dilxwazî jêre kirin». Binêrîneke li şoreşê nêrîn ku gereke alîkarîya wê bikin û xwîna xwejî birijênin, nemaze di wan rojên teng de û li gora bendên peymana ku di nav kurd û Ermenîyan de hebû, xwe nedane paş. Herwekû Qedrîyê cemîlê paşê di bîranînên xwe de dibêje[1]: (Li ser Ermenîyan pêwiste bergirîya kêşa kurdî bikin, nemaze di nav weşanên xwe de, eger li Evropaye yan jî li Emerîkaye, herweha ji bo berjewendîya kêşa kurdî, piropakende bangheldêran bikin).

Li vir û ji bo sûdmendî divê em raya navneteweyîya duduwan li ser kêşa kurdî bizanin û ji bo vê em guhbidin civînên komgirên dewletan û gava li ser nameya Ermenîyan vekolîn (ew nameya ku li ser êrîşa hovîtî ya Tirkan li ser gelê kurd) me dît bersiva wan çibû! Em guhbidin serokê komîta tenfizî ya navneteweyî a duduwan[2], yê ku navê wî (Dî Biroxir) bû, helwista navneteweyîya xwe li ser kêşa kurdî eskere dike û dibêjê: «Berî em li ser kêşa kurdî vekolin, divê ez hinek têbênîyên xwe belo bikim; dijwarîya pêşî, rastîyeke divê em bêjin ku kêşa kurdî hîn li ser me nûye û divê em rastî bêjin ku çiqas em şehrezayê Evropane lê dîse dijwarîyek mezin di rêya kêşên ku ne Evropîne, em dibînin, û ser vê re jî kêşa kurdî û rengê xebata wan û rêbaz û warê cuda, ev ji rexekî û ji rexekî din ve em ditirsin kêşa kurdî ya ku li nav Tirkîyêye; ferehtir bibe û ta Îraq û Îran û sûrîyê vegire û dijwartir bibe û li dawîyê bibe kêşeke dewletî û li navbera wan dewletên ku peywendî bi kêşa kurdî re hene, nexweşbibe. Raste ev nameya ERmenîyan (Partîya Taşnak) rêkirine, rastîyekê belo dike, ku kes nikare bibêje ev kêşa ha wan dewletên bi navkirî navegire, û şerekî mezin li devereke fereh ji rojhelata nêzîk despênake û agirê wê geş nabe». Û (Dî Birox) dirêj dike û dibêje: Dijwarîya duduyan li gora

1 - Bîranînên zinar silopî.

2 - Qasimlo (Kurd û Kurdistan).

raya me di ser hemû tiştî reye û giringîyeke serekî û taybetîye. Navneteweyîya duduyan, ya ku rêbazeke siyasî girtîye û li gora wê rêzanê mafên çarenivîsî bi hemû neteweyan dide. Li heman wext dibêje ku ev mafên ha navê ku di rêya çek û rijandina xwînê de bêt, ji ber ku ne dûre zemîna şer ferehtirbibe ta hemû dewletên ku di nav ristikê de ne vegire û paşê cîhanê gişî bigre. Li vir rastîyek pêrgî me dibe ku niha kurd şerdikin û ji bo serbestî û serxwebûna welatê xwe, xwe didin kuştin. Gelo me ji armanca xwe a serekî ya ku ji bo serxwebûna welat ne geraye? nemaze eger me şer geşkir, weke ev roja ku Kurd şerê xwînawî dikin) Dî Biroxir li pey gotina xwe dîçe: (... di vê dema niha de ez dibînim ku yek rêça rast heye, ew jî ku em di sere biçin; ez tu giringîya hokar nabînim ku tevlîbûna me di kêşa kurdî de sûdberbe).

Bi vî rengî em dibînin, navneteweyîya dudoyan li ser zimanê serokê wê dengê xwe bi kêşa kurdî nade, ji ber ku xwedîyên wê dijê serdestan çek hilgirtine, da kêşa xwe ji nav pencên hovan rizgarkin. Ji bo kêşa kurdî tu çareyek bi destê, Navneteweyîya dudoyan nîne, ji ber ku dewletên dagîrkerî ên mezin hoyên bingehî ji peydabûna vê kêşe re danîne û ew naxwazin çareserkin û xwe tevlîkirina wan bi rêzana wan ya siyasî re rênagirê. Lê ji bo dilxweşkirina endamên Navneteweyîya xwe (partîya Taşnak) ya Ermenî ku ji me re daye xuyakirin, ew keşa ha tenha pey wendî bi Tirkîyê ve heye, lewra Navneteweyîya wan ew biryara berê gotibû derêxist.

Lê Ermenîyan li gora ku hin jêder dibêjin ku atîkarîya xwe ya ji bo şoreşêbû rawestandin û di pey şikestina şoreşê re dijê bizava azadî xwazîya niştîmanî ya kurdî rawestan.

# ŞÊX EVDIREHMANÊ GARISÎ

Ew Evdirehmanê kurê şêx Evdilaye ji gundê Medresê ye, li milê eşîra garisa, ji qeza esxêrê, wilayeta sêrtê. Pîrekî ayînîbû. Bi camêrî dinav gewmê xwe de hatibû naskirin û dilovanê berjewendîya gelê xwe bû. Yek ji kurdperwerên ku piştgirîya şoreşa şêx seîd ya sala /1925/ kiribû. Devera cihê şêx Evdirehman kungeha şoreşgêrî gurîgeşbû. Hîn ji tifka şoreşa şêx seîd piringên agirê wê li hin cihan mabûn, mîna çiyayê Ararat û çiyayê Fariqînê, çiyayê cabikcorê, çiyayê samsonê û yên dî jî. Paşê bi serokê eşîra Eruh (Aqûb axa) re serkêşîa serhildaneke li deverên Garisa û Eruh, diji dardestên Tirka (Toranî) li sala /1926/ kirin û heryek ji wan êrîş bire ser melbenda qeza xwe, şêx Evdirehman êrîş kire ser xesxêrê ku melbenda qezayê bû. û Aqûb axa êrîş kire ser Eruhê ku melbenda qezayê bû. Qayimaqamên herdu melbendan bi dîl girtin, herweha serdarê cendirme ew jî bi qayimaqaman re girtin û gelek leşker ji dîlkiribûn û destê xwe li ser çekên herdu melbendan danîbûn. Di peyre leşkerên dîlgirtî berdan.

Ev serhildana ha gelek nema, yanî dirêj nekir ji ber ku hêza leşkerê tirkî ya ku şoreşa /1925/ beravêtî kiribû hîn di Kurdistan de berdewam bû; ter û hişk dişewitand.

Van toranîyan malwêran dikirin, gund xopandikirin. Ev hêza, ha jimareyeke gelek ji leşkeran berê xwe dane serhildanê û êrîşkirin ser, ji neçarî ber bi sînorê Îranê ve çûn, û şêx Evdirehman berê xwe da sefîrê Engilîzî li Bexdayê û doza alîkarî lê kir, da serhildan li ser pê bimîne, lê serfîr doza wî pêkneanî û alîkarî pêre nekir. Şêx dilqermiçî bi şûnde vegerha û di pey re ji bêçarî, wî û Aqûb axa xêzanên xwe birin û pena birin Îraqê û di Mûsilê de rûniştin. Li ser gotina Mela Ehmedê Şûzî û Qedrî beg jî dibêjin ku şêx li Mûsilê nivênerê civata xoybûnê bû. Û xwe bi karên civatê ve girêdabû û kadirekî serwerî û niwênerê xoybûnê bû, peywendî li navbera serokên eşîran û serkirdayetîya xoybûnê, li Îraq û Tirkîyê û sûrîyê dikir. Û di hemû xebata xwe de û li maweya çend salan ku Mela Ehmedî Şûzî pêre bû nemaze, ji /1929 - 1932/ ta roja ku şehîd bû li cezeran sala /1932/ li ser destê xayinekî çewt û pîs, ewê ku bi çend pelikên zêr xwe firote toranîyan. Her û her Mela Ehmedê Şûzî bi Şêx re bû.

Û li ser karê dawî yê ku xoybûnê bi şêx sipartibû û di rêya wî karî de şêx şehîd bû. Li gora Qedrî beg di bîranînên xwe de dibêje: (Piştî civata xoybûnê pêkhat şêx Evdirehman bûbû niwênerê wê li Mûsilê. Û civatê biryar da û xwest rastîya wan dengûbasên li ser wê serhildana ku Arif beg li sala /1932/ li devera /Miksê/ û Hekarya, pê rabûbû, bizane. Herweha da ku rastîya bûyereke bizane, ya ku dibêjin. kurê Îbrahîm paşayê Xiskî - Dawid axa -

li pêşya hêze ku /400/ kes li devera Araratê zivirîneve. Dîse ji bo naskirina barê Tiracîdî yê deşta zîlan û çarnikarê wê, ew deverên ku bi leşkeşê tirkî re bûbû cihê şerekî xwînawî û serbirîn. Ji bo vê armancê û ji bo daneheva denag û basan li ser rastîya barê welat û ji bo agehdarbin û ji bo ku jimara wan kesên bi Îranê ve bazdabûn, bizane û da bikarin peywendî bi wan re bikin. Û civata xoybûnê rabû hêzek ji bîst /20/ hesan pêkanî û bi serokatîya welat perwerê kurd şêx Evdirehmanê Garisî bi deverê ve rêkirin.

Mela Ehmedê Şûzî van bûyeran ronîdike û bi tekûsî wan ji hevderke û çawe Şêxê xebatker şehîd bûye, di bîranînên xwe de bi zimanê kurdî dibêje: (Li meha cezeran sala /1932/ serkirdayetîya xoybûnê nameyek ji mere rêkir, têde dibêje, Arif beg û Adil beg bi hin hevalên xwe re hatin Tirkîyê û ew nêzîkî sînorê Îranê li rexê Miksêne, û hevalên Ermenî bi wan re ne, dive hun wan bibînin û ev nama ha ji, ji bo Arif beg û Adil begêye û bi rêya vê nameye hun dê hev binasin. (Name, li jora wê bi zimanê kurdî hatibû nivîsandin û li xwarê wê bi zimanê. Ermenî hatibû nivîsandin û bi muhra xoybûnê û muhra partîya taşnakê morkirîbû). Têde dibêjin «em dozê li we dikin ku hun tevgereke xurtbikin, herwekî me ji sala par ve ji were gotibû ku hun rêyekê vewejêrin, li navbera Tirkîyê û Îranê ji rexekî û ji rexekî dî jî li navbera Tirkîyê û Îraqê û Sûrîyê. Û li dawiyê em li ser tevgera we gelek supasîdikin».

Nih (9) kes û yê dehan /10/ Şêx Evdirehmanê Garisî bû, xwe jê re pêkanîn, herdeh evên ha bûn: 1 - mela Ehmedê Şûzî, 2 - Evderehmanê Mihê (mirovê Aqûb axayê Eruhî bû), 3 - Elî Qolçî, 4 - Lawikê Berwarî, 5 - Elîyê Hemîd, 6 - Mişrifê Hesen, 7 - Necmo, ji bajarê Sêrtê bû (Navê heştê û nehê li bîra wî nedihat). Şûzê pêve diçe, Me nameyek ji bo Lîvon paşayê Ermenî re rêkir. Ew bixwe li gundê Hûrizkê bû, yê ku li nêzîkî zaxo li devera Îraqê diketn, sedeme ku herdu peyayên xwe (yên ku berê xwe bi mere kar kiribûn) bi me re rêke, da em bi hev re, berê li pêşya xwe bibin serî. Û ji gundê (Baneqesrê) ji Sûrîyê em rabûn û me berê xwe da Tirkîyê. Em derbasî rexê Tirkîyê bûn. Bi şevê em bi rê ve diçûn û bi rojê me xwe diveşart çunke leşkerê Tirkan di pey şopa şêx de digeran û Tirkan bi xwe perûwek hezar lîreyên zêr ji wî kesî re terxan kiribûn, ewê ku bikare şêx Evdirehamanê Garisî bi saxî bi sipêre deselata Tirka, û pênc sed /500/ lêreyên zêr dabûne wî kesî, ewê şêx mirîtî bisipêre dewleta Tirkan. Em, bi rêya xwe de çûn ta em gihane gundê simbanis û me peyak rêkire rex muxtarê gundê Şahîn. Peykê me zivirîve û got ku Arif beg berî çar rojan, derketin çûme gundê (Arence) rex muxtarê gund (Osmanê Endelîb). Sibiha roja dî, em çûne ser kajîya gun û li wir Şêx ji me xwest ku di vê hinek ji me biçin gundê Arencê. Min ji Şêx re got: (Şêxê min ez hêvî dikim destûr bide; em hemû bi /hev re/ herin gund, rêya me hemû ji çar demjimêran ne bihtire, eger Arif beg û

Adil beg li wir bûn, ev doza meye, eger na emê bizîvirinve. Şêx bersiva min da, got: «Ji te pêve kes ji hevalan na axive». Min bersiva wî da. herdu eşîretên (xelîla û xavita) di nav wan de /du bendî/ û dujminahîye, kî ji me bi Arenc ve here û pêrgî wan bibe dê wî bikujin. Ez hêvîdikim tu me ji hev cudanekî. Bi xeyd bersiva mi da: «Ez ji te nerazîme, her ku min biryarek da tu dixwazî betalkî û ez vêya ha ji tere qebûlankim». Min jê re got: Şêxê min ji bo çi tu bihna xwe teng dikî, weke xwe bike. Belê ez di dilê xwe de gelekî bihntengbûm. Û Şêx pê zanî. Bi rêve em çûn ta em gihane çiyayê (Arnosê Miksê). Çiyayekî mezin û gelek bilinde. Nêzîkî demjimêrekê em li wir rûniştin. Di wê demê de Şêx bakir min û ji hevalan em paşketin û ji min re got: «Li min bibûre, min dilê te hişt. Min lê vegerand: Şêxê min eger tu çi ji min re bibêjî tucara dilê min namîne. Paşê em li hevalên xwe vegerehan û livir Şêx got kî dê here gundê Arenc? Evdirehmanê Mihê got: ezê herim. Şêx dudoyên din jî bi wî re karkirin. Û nameya serkiradayetîya xoybûnê bi wan sipart û got: vê nameyê bi Arif beg yan Adil beg bisipêrin û bi vê nameyê ewê we naskin. Ebdurehmanê Mihê û hevalên xwe birêketin, çûn, ta nependîbûn. Piştî bihnekê ewên Ermenî ji Şêx re gotin ku ne rastbû ev hersê bi tena xwe çûn û eger hat û dewrîyeke Tirkan pêrgî wan hat, nikarin bergirîya xwe bikin û dê bêne kuştin, em hêvîdikin tu destûra me hersêyan bidî, da em bi wan ve bighin. Şêx bersiva wan da

û got nexeme tiştek nabê, lê careke dî jê hêvîkirin. Me hemîyan, yên ku mayî me ji Şêx xwest ku destuûra wan bide ji bo herin bigehin hevalên me yên çûyî. Destûra wan da, bûne şeş ewên ku çûne gund».

«Di peyre Şêx di nav min û xwe de got, dilê min ji vayên Ermenî netesere, tu jî di şopa wan de here, ji ber ku Ebdirehmanê Mihê, bi vê yeka ha nizanê û dibê ku Ermenî pîlanekê li me bikin».

«Vê carê min newêrî ez ji Şêx re bîjim: ez naçim, eger min jêre gotiba ez naçim careke din ji min dixeyidî. Bêdeng min dest avête tivinga xwe û min Tûrikê belavokan û muhra xoybûnê, min bi Şêx sipartin. Hevalekî me bi min re karbû, em çûn ta em gihane hevalên xwe li nêzîkî gundê (Arencê) yê ku li nav gelîyekî kûr diket. Me yek ji hevalên xwe rêkire rex muxtarê gund (Osmanê Endelib) demjimêr sisêyê Erebî bû yani demjimê nêzîkî nehê sibihê hû, navê wî Zewaliye bû - navê peykême - paşê Ebdurehmanê Mihê bi sê hevalan re me rêkirin pişta gund. Û ez bi her sê hevalên Ermenî re em li benda peykê xwe man».

«Piştî pênc demjimêran yanî demjimêr heştê (8) Erebî (nêzîkî demjimêr dudoyê nîvro) di pişt xwe re ji serê çiyê ve û ji rexê şopa em tê re hatibûn, me dengê teqêna berê tivingan bihîst, min daxwe ji pê rawestam, paşê dengê bereke dî hate guhê me, bûne du teqê beran. Li serê çiyê û li rêya ku em pê de hatibûn, bi dûrbînê me nihêrî, belê me tiştek nedî. Du heval bi kopekî bilin

ve yê ku nîzîkî me bû, me ew rêkirin, li rêya em pê de hatibûn, nêrîn lê dîse tiştek nedîtin di peyre nêzîkî demjimêrek û nîvê yanî ta nih û /nîvê/ Erebî (nêzîkî çarê êvarê) em di cihê xwe de man. Ji gundê Arencê, peykê me ziviri û bi me gihand ku muxtar ne li malabû, û ez li hêvîya wî mam ta vegereha, û got: Silafên min bi Şêx bigehêne, ez destê wî maçdikim, Arif beg û Adil beg li rex minin û piştî rojava bi hevalên xwe re têne gund û bila Şêx vê êvarê mala me pîrozbike, keremke rex me, da ew hev bibînin».

«Em ber bi cihê Şêx û hevalên xwe yên din ve çûn, bi rojava re em gihane serê bilindahîyê ji bo bihnvekirinê em hinekî rûniştin, paşê me rêya xwe girt, deh mitran em neçûn hevalê me yê pêşevan bi tirs li me zivirî û got: Vaye laşê Şêx li vir di rê de avêtîye. Gava me laşê wî dît em hemû girîn, paşê me pirsî: Ka hevalê wî?».

«Li ser bilindahîya kopê çiyayê Ernos cihekî raste zevîyên çandinî li serin, bi navê (goristana şehîdan) hatîye naskirin. Li dora wê dîwarê sûriheke herifî heye. Laşê şêx nêzîkî sûrihêbû, me ji hev re got: dibê ku kuştîyê rê şêx di pişt sûrhê de xwe veşartibe, me hemîyan bi hevre êrîş da û em gerihan, lê me kes ne dît. Em li laşê Şêx zivirîn) me dît ku bê serîye. Yekî ji hevalan got: kuştiyar ne ji hevalên me ye. Evdirehmanê Mihê got xwedê mala wî biviritêne yê ku şêx kuşt. Min ji wan re got, bi xwedê (Necmo) ew kuştîye. Çarnikarên xwe em

hûrik hûrik gerihan, li rex sukra wi me kêrik dît, hevalan naskirin ku kêra (Necmo) ye.

Bi vî rengî li ser destê rûreşekî ku ji bo gunehkari şermezarî û tiflêbarîna hermayî xwe firotibû, welat perwerê mezin û xebatkerê heja Şêx Evdirehmanê Garisî şehîdbû.

Mela Ehmedê şûzî pêve diçe û dibêje: «Gava em her heşt ji rex şêx rabûn û me berê xwe da gundê Arencê, çar heval bi Şêx re mabûn sisê ji wan gelekî westehabûn, Şêx destûra wan dide ku biçin gundê Ermişatê, Necmo bi tena xwe bi şêx re dimêne, şêx jî bi şopa me de rê digre ber bi gundê Arencê ku li wir em û wî, Arif bey û Adil beg bi hevre bicivin. Şêx li pêş diçû û di pey wî de necmo tivinga şêx hilgirtibû û diçûn. Necmo ev destkefta ha berneda, ji piştve tivin teqand bera tivingê pişta wî birî û di zikê wî re derket. Şêx li Necmo ziviri, tivingek dî jî berdayê, vê carê li zikê wî ket û di pişta wî re derket, li ser erdê xumiha, bi saxê serê şêx jêkir û bi xwe re hilgirt û bire şaxa Hekarya, li ber qayimeqam danî, ew ji bi walîyê wanê re axivî û çîrok jêre got. Walî bawernekir, ji wan xwest necmo girêdin û bi serî re rêkin gundê westanê, terembêlek li wire da wî biguhêze bajarê wanê.

Mela Ehmed pêve diçe û dibêjê: «paşê walî çi bi necmo kir nizanim. Lê tişta hatî xuyakirin û naskirîye ku Neçmo berdan û komek pere ji danê, vegera mala xwe li bajarê sêrtê. Demek bi ser ve çû hinekan êrîş birin ser

mala wî, ew Kuştin ü canê wî çû dozexê».

«Ji alîyê me, piştî me laşê şêx dît ku bi kêra Necmo serê wî jêbûye, çil mecîdiyên zîv me bi rêberê xwe dan û me jê xwest ku loşê şêx di goristana şehîdan de veşêre».

«Di peyre Ermenîyan xwestin vegerin gundê Arencê û ji wir biçin Îran û paşê biçin Îraqê, belê ez (Mela Ehmedê şûzî) razînebûn û em hemû bi hevre çûne gundê Ermeşatê rex hevalên xwe yên din, û ji wir çûne gundê Medrêsê ji bo şehîdbûna şêx Evdirehman, serxweşî li birayê wî kirin û ji wir ber bi gundê Baneqesrê devera sûrîyê çûn.

Lê ji bo çi Necmo bi vê gunehkarîya şermezarî rabû? Mela Ehmedê şûzî pêve diçê û dibêje: (Necmo zilamekî nesekinî bû, bêtore û gelek çewt û xerabû, ew girtin, kirin bendîxanê, lê ew bi hin kesên dî re, jê bazda. Û Necmo ji bo xwe ji destê Tirkan bi parêze hat giha şêx li gundê Baneqesrê li hundurê sûrîyê li sala 1932 û ji rex xalê xwe Yasînê Baleî ewê ku birêz û merdemêrîya xwe li bajarê sêrtê hatibû naskirin û hevalekî gelekî dilsozê şêx Evdirehman bû, bi xwe re qewetîyek anîbû».

«Di wê çaxê de «Birahîmê Teliî» mifetişê giştî yê Diyarbekrê, gelek ji tevera şêx Evdirehmanê Garisî ditirsa, û dizanî ku Necmo bi şêx re digere. Evê ha bidizîve hate rex Qayimeqamê (cizîra Bota) û ji wir diya Necmo xweste rex xwe û ji sêrtê anî û rêkire bajarokê Endîwerê li sûrîyê, û jê re got ku dewleta Tirka lê dibûre

û pêncsed (500) lîreyên zêr jî wê bide wî, eger şêx Evdirehmanê Garisî bikuje. Diya wî herêkir û sozda ku kengê ferzenda xwe bibîne wî bikuje».

Hevalên rêça xebatê bi dilsozî rêz ji şehîdê xwe re girtin û kurên welat, kurên gelê wî bi dilkovanî û gelek xemgînî ev roja ha pêşwazîkirin û hemîyan bi qencî, merdemêrî û welatperwerîya wi û ew canê neteweyî ê bilind ku hebû, pesend kirin. Ev yadê gulavdar di dilê gelê wî de her û her dê bimîne.

# NELEVKIRIN Û GUHERÎNÊN DI HUNDURÊ CIVATA XOYBÛNÊ DE ÇÊBÛN:

Piştî ku şoreşa Araratê di êlûnn /1930/ de herifî, serkirdayetîya xoybûnê, dest ji xebata çekdarî kişand û berê xwe da tevgereke piropakendî. Di sala /1930/ de pertokek bi navê (Kêşa Kurdî) ji danîna Bileç şêrko derêxistin, bi zimanê Erebî, Engilîzî û Ferensî, nivîsîbû. Di nav de dîroka Kurdan a kevn û nû û Kurdî û hoyên serhildanên wan, nemaze serhildana /1925/ û şoreşa Agrî û hin babetên din jî, hemû nivîsîbûn.

Qedrî beg di Bîranînên xwe de (zinar silopî) dibêje: (Civata xoybûnê gelek Nivîsname (Raport) ji komgirên cîhanê re rêkirin, ew komgirên ku dewletên mezin ji bo kêşên gîtî ên giring girêdidan. Û xoybûnê di wan Raportan de doza mafên xwe ên neteweyî dikirin û di rex vê re jî, ji bo gihandina hestekî neteweyi û hişyarikirina gel xebatdikirin, herweha ji bo yekêtîyek di nav gelê Kurdistanê de û ji bo xurtkirina wê yekêtîyê xebatdikirin.

Lê di pey re em dibînin ku van kesan bi hevnekirin û racudahî di nav endamên serkirdayetîya Xoybûnê de despêkir, nemaze li navbera Bedirxanîyan (herdu bira Celadet û Kamîranê Bedirxan) ji rexekî û yên dî (Mal-

bata cemîl paşa). Racudahî di nav wan de xurtbû, sedema vê bû komîta navendî doza civînekê kir û li meha tebaxê sala /1932/ li Libnanê di bajarê Bihemdûnê de kombûn. Û Komîranê Bedirxan li ser hin şaşiyên wî, gunehbarkirin û ji Xoybûnê derêxistin. Birayê wî Celadet Bedirwan li ser birayê xwe dixeyidê û ew jî dev ji civata Xoybûnê digere[1] û piştî maweyekê haco axa ew jî dest ji Xoyûnê diberde. Qedrî beg yê cemîl paşa di bîranînên xwe de li ser vî babetî diaxivê: «Li Tebaxa /1932/ Komîta navendî ya civata Xoybûnê civîna xwe girêdan û serwerên deverê yên mihelî û herweha Rêpêşendarê (musteşar) xoybûnê Kamîran beg amadebûn, û di wê civînê de û li encamê dubirekiyeke xurt di nav rêkxirawê de, Kamîran ji Xoybûnê derêxistin û ji ber vê yekê birayê wî ciladet ji dev jê ber da.

Herwekî belo dibe valehîyeka siyasî di nav Xoybûnê de çêbû, ew jî li encamê serneketina şoreşa Araratê û pêrabûna serheldanek ji xwar ve û bi wan re neçû serî, vê valehîyê û serneketina wan hişt ku xwe bi ser hev de bikîsênin û li kêmahîyên hev bigerin û hev bivêvirin, û

1 - Piştî herdu birayan «Celadet û Kamîranê Bedirxan) dev ji civata xoybûnê berdan û berê xwe dane ziman û tora Kurdî û di rojnamegerîya Kurdî de, ji bo berjewendîya gelê xwe gelek xebitîn, û ev jî pêveçûnek li ser şopa xebata wan ya berê bû. Di vî bergehî de xebateke mezin û bilind kirin, ku cihê şanazî û pesindarî û supasîye, li ser wan berhevên ku di demeke gelek dijwar di jiyana gelê me û dî rêya xebatê de, pêşkêşkirin. Û bihûnandineke edebî, komek berhevên toreyî û zimanzanî û rojnamegerî ku semyanekî xebatgêrî yê gelê me ye, nivîsîn.

van hoyan ew kişandin civîna (Bihemdûnê) ya ku li tebaxa sala /1932/ girêdan.

Piştî racudahî, nelevkirin di nav civata xoybûnê de belobû û kete rû, hin ji endaman ji rêza civatê derketin, tevgera serkirdayetîya siyasî lawazbû. Di bûyerên ku di sihan de li Kurdistanê çêbûne, wekî serhildana Dêrsim û ya samsonê û yên din, em tu xebat û tevgera xoybûnê û rola wan di nav de nabînin. Bi rengê tevgereka siyasî di bin çavdêrîya qiyada Xoybûnê de tiştek berçav neketîye, nemaze li maweya cenga diduwan ya ku li ser wê murahene gelekbûn û hêvî pêve girêdayîbûn û li bîra kesê Kurd bû ku ji bo berjewendîya bizava Kurdî encamên baş wê hebin. Bi çeşnê ku Sêvera diduwan ji a yekê ve kêmtirbe. (Herwekî Sêvera yekê tiştek neda Kurdan, bilî hinek maf di belgenameyek a dewletî de neda) serkirdayetîya Xoybûnê li sala /1938/ tevgera xwe nûkir û di wê demê de pêkhatibû ji: Ekremê cemîlê paşê û Qedrîyê cemîlê paşê, Dektor Ehmed Nafiz, Hesenê Haco, Osman Sebrî û Evdurehmanê Elîyê ûnis û Memdûhê Selîm û Arifê Ebas). Lê tu pê neçû Osman Sebrî devjêberda, piştî ku dît hîn xoybûn bi partîya taşnak a Ermenî ve girêdayîye her wekî ew bixwe dibêje:

Em dibînin şerê cîhanê ê dudoyan li ber derîye ku nemîne, xoybûn dixwaze tevgera xwe nûke û b partîya (Hîwa) ya îraqê re didêdistîne ji bo xebata xwe yekbikin û ava wan di coyekê re biçe, peywendî bi hev re kirin û name ji hev re rêkirin û li encamê vê dan û sitandinê,

neqîbê rikin şehîdê nemir Izet Evdilezîz hate sûrîyê û bi serkirdayetîya xoybûnê re rûnişr û li ser bizava neteweyî a Kurdî û li ser çawebûna peywendî û hevdîtin hûrik hûrik bi hevre axivîn.

Herweha peywendîyên xwe bi şehîdê mezin (Mela Mistefayê Berzanî re nûkirin û li çaxê tevgera wî ya /1943 - 1945/ ala Kurdi jêre rêkirin da li ser kopê çiyayên Kurdistana azad bilidbikin[1]. Berî wê jî, Xoybûnê Ala Kurdî ji ceneral Ihsan Nûrî re jî rêkiribûn, û li ser kopên çiyayê Agrî bilindkiribûn.

Serkirdayetîya Xoybûnê pêşniyarek bi partîya (Hîwa) dabû li sala /1945/ ji bo ku bi hevre raporteke havpişkî rêkin komgirê sanfiransîsko, doza mafên Kurdan yên neteweyî bikin.

Basîl Nikîtîn di pertoka xwe (Kurd) de dibêje: (Li sala /1945/ gava komîta yekêtîya dewletî li Sanferansîsko rûnişt, destek ji Kurdên xebatker ronahî dîtin, rabûn û nexşa Kurdistan û xîtabek û raportek ji Komîte re pêşkêşkirin û dozên xwe yên niştîmanî di Kurdistaneke azadkirî de belokiribûn). Bê texepaşî, herwekî di raporta wan de hatibû ku bêçareserkirinekê ji kêşa Kurdî re, ev rojhelata navîn aştî nabîne.

Di ser vê re jî di çavên partîyên Kurdistanî yên din de, xoybûn gelek lawazbûbû. Ji bo nimûne (mînek) em dibîbînin li heyva hefta ji sala /1944/ civîneke giring li ser

1 - Mesûdê Berzanî û tevgera azadîxwzî ya kurdî.

sînorê sê dewletan (Îran, Îraq û tirkîyê) li wî cihê ku bi navê (sêsînor) hatîye nasikrin li ser ciyayê (Dalanpîrê)[1] çêbû. Û ji tirkîyê Qazî wehab û ji Îraqê şêx Evdilayê zînoyî û ji partîya J. K. ya Îranê Qasimê Qadirî amadebûn û tevan bi hevre rêketin lihevkirin û herêkirin ku Kurd yekbin û pişta hev bigirin û bi can û mal arîkarîya hev bikin. Û Hesen Erefe serokê komîta bingehî ya leşkerê Îranê li sala 1945 dibêje ku di wê civînê de biryarek dan ku dewleta kurdistana mezin çêkin.

Di vê civîna giring de, em dibînin çavên xwe ji Xoybûnê digirin û yek ji endamên Xoybûnê naxwazin û wan nabin wê civîna binavkirî.

Di vê maweya paşî de, piştı derketina Osman Sebrî ji Xoybûnê helbestvan «Cegerxwîn» û mitîyê Qamişlo Mela Ehmedê zivingî ev herdu diçin rêza civata Xoybûnê û dextor Ehmed Nafiz dibe serokê civata Xoybûnê.

Jê tê xuyakirin ku li maweya dawî yanî di sala /1945/ de navê wê kiribûn «partîya dîmuqratîya Kurdî li sûrîyê» çûnke muhra niwênerê wan di bin navê (partîya dîmuqratîya kurdî li sûrîyê) de bû, li ser wê nivîsnama ku ji bo pêşewa şehîdê nemir serokê komara Mihabadê Qazî Mihemed pêşkêşkiribûn. Ez bi xwe jî baş li bîra min tê, gava ez piçûkbûm ji bavê xwe û hevalên wî endamên civata Xoybûnê, navê partî li sûrîyê, min dibihîst.

Piştî ku komara dîmuqratî a Mihabudê damezra,

---

1 - Bîranînên Qedrî beg.

Qedrîyê cemîlê paşê yek ji endamê civata xoybûnê bû, û ji sûrîyê berê xwe da Mihabud ji bo pîrozkirina Komarê û li wir pêşewa şehîdê nemir Qazî Mihemed dît û aoz a alîkarî kir da bikarin di Kurdistana tirkîyê de bixebitin. Û niwênerê xoybûnê di wê raportê de gotibû[1]: «Ez û hevalên min yên ku ez niwênerîya hemûyan dikim, em gihane rastîyekê, ji bo azadkirina gelê Kurd û gelên deverê yên din, û ji bo ku em xwe ji bin nîrê sitemkaran rizgarkin çare nîne divê rêkxiraweke rast ewa ku bikare rêzaneke dimuqratî bigerêne, em çêkin, da ronahîya kar û xebata xwe bide hemû parçên welat û li Kurdistana tirkîyê û jêre karekî nehênî rast gereke, û ji bo wê ez bi hemû karînên xwe ve amademe, û hemû tiwana û kartêkirina min li ser kesên ku nêzîkî minin, ezê bikarbînim. Û ez bixwe dizanim û piştrastim ku kesên wir baweriya wan bi min Tê û li ser vî bingehê bawerpêkirî ez vê dozê dikim. Û ji bo vî karê neteweyî, eger ev raman û pêşniyarên min û hevalên min we rast dîtin û we bawerî pê anî, wê çaxê ez hêvîdarim hun jêre karbikin, da ev karê giring biçe serî».

Li dawiya raportê dibin navê partîya dîmuqratîya kurd li sûrîyê, muhra zinar silopî li ser bû.

21/ êlûna 1946

1 - Kerîmê Husamî (Mehabad) Hesen Erefe (Kurd).

Û bersiva pêşewa Qazî Mihemed li ser vê dozê, gotibû ku niwênerên sofyêtan gereke naverokê vê raportê bibînin. Paşê yek ji berpirsiyarên Sofyêtan dît û di pey re qunsilê Sofyêtî li tebrîzê raport siparte wî da ku bi rêya xwe bigehîne heval sitalîn. Di nav de ji sofyêtan xwestibû arîkarî bi kurdên Mûsilê re bikin da Kurd bikarin bigehin mafên xwe yên neteweyî, nemaze li tirkîyê. Lê mixabin ku li dawîyê bê encam yerayeve.


serkirdayetîya Xoybûnê, berî ku Qedrî beg rêkin Mihabadê bi maweyeke kurt niwênerên partîya Taşnak (Robîn paşa) û niwênerê Ermenîyên sûrîyê û Libnanê (Hiratiş papazyan) pêşwazîkiribûn, û ev herduyên ha ji bo karekî hatibûn rex civata xoybûnê. Û li ser vê yekê Qedrî beg dibêje: (tayê li navberaxoybûnê û partîya Taşnak, ziravbûbû, gihabû mûyê paşî ku ha ha bibire, lê ji nişkave niwênerê taşnak (Robîn paşa) û niwênerê Ermenîyan yê sûrîyê û Libnanê (Hiratiş papazyan) li melbenda xoybûnê peyabûn da bi hevre danûsitandinên xwe bi kurdan re bibin serî û di wê çaxê de van herdu niwêneran ji beroirsiyarên Xoybûnê re belokirin û gotin ku nêzîkbûna wan li sofêtan ne ji berjewendîya kêşa kurdîye, û danxuyakirin hemî kêşên ku giringiyk û renge kî xwe yê cihanî hebe, bê guman eger ne bi rêya Emerîkan be, naxwe ew ji xwe re çare nebînin. Û bi pêçevaniya wê eger dewleta Emerîkan kêşa Kurdî pişt guhê xwe avêt, tozik li ser nîne, tirk wê gurandinekê ji Kurdan re deynin, herwekû çawe ji Ermenîyan re danîn».

Qedrî beg pêve diçe, dibêje, di wê çaxê de me ji kenarê xwe kir û me bersiva wan bi vî rengî da: «Di vê çaxa ku dewletên koledarî bi hemû xibata xwe li pey berjewendiya xwe ya taybetî digerin. Lê Hevgirtina sovyêtî alîkarîya me dike û komara Mihabadê di parçeyekî ne piçûkê Kurdistanê de pêktîne. Û eger em vê helwistê birêz negrên, em dê li ser du layîn dijayetî bi berjewendiya gelê xwe yê Kurd re rawestin û em şer jêre dixwazin, eger me negot ku me xiyanet pêre kir».

Û di pey re em tu şûnkarên peywendî yê Kurd û Ermenî (xoybûn û taşnak) nabînin, sedema ku xebata xoybûnê bi yek carê rawesta, nemaze piştî Komara Mihbadê ya kurdî li Îranê, çileyê pêşî sala /1946/ herifî.



Endamên civata Xoybûn Disala /1931/ de çaxa ku ji dûrkirina xwe vegerehane



Mele Ehmedê Zivingî
(Miftîyê Qamişlo)



Dr Ehmed Nafiz

## CIVATA ALÎKARÎYA BELENGAZÊN KURD LI HISIÇA:

Li sala /1930/ Hesenê Haco, Arifê Ebas û cegerxwîn ji dardestên ferensî xwestin ku destûra wan bidin civateke alîkarîya hejarên Kurd damezrênin. Qedrîyê cemîlê paşê di bîranînên xwe de (civata alîkarîya belengazê Kurd) binavkirîye. Ev civata ha melbenda wê bajarê Hisiça bû. Û vê civatê alîkarîya hejarên Kurd dikir, nemaze xwendekar.

Li tenişt wê jî em dibînin, xortên welatperwer di wê maweyê de tevgera wan bi çend rengan hebû mîneka: Damezrandina civateke roşinbîrî û cevangehên werzişî û hînbûna xwendin û nivîsandina Kurdî, û belavkirina tîpên latînî di nav xwendevanan de. li encamên van karan:

1 - cevangeha (Nadî) Amûdê:

Xortên neteweyî yên Kurd li cezîrê di Amûdê de civangeheke (Nadî) kurdî bi alîkarî Haco axa damezrandin. Li dawiya bunara sala /1939/ Haco axa karî destûra wê nadiyê li ser navê Mihemedê Elîyê şiwiş, ji Ferensa bistîne û bi destxe. Belê serokatî û kargêrîya rastî di bin çavdêrîya helbestvan (Cegerxwin) de bû, û êberê tevgera Nadîyê Cegerxwîn bû.

Li ser sînorê tirkîyê û li ber çavên wan, Nadî dibizivî, jibo canê neteweyî û bîrên welatperwerî li nav lawên kurd belavbike. Û helbestvanê kurd cegerxwîn bi marşa xwe xort germdikirin û keşafên Kurd li peyhev birêz li ser awazên gotinan piyên xwe davêtin û birêveçûn dikirin.

Herweha vê civangehê (Nadî), xortên kurd li ser tîpên latînî hînê xwendin û nivîsandina Kurdî dikirin. Û elîfûbêya Kurdî ya ku celadet Bedirxan bi tîpên latînî danîbû, govara Hawar belavkiribû. Û di jimarên berê de govara Hawar ji xortên Kurd xwestibû ku hînî wê elîfû bayê bibin û di nivîsandin de bikarbênin. Û ji bo hînkirina hevûdû, û hînkirina zaroyên xwe kîberînek di nav wan de çêbûbû, weyliwî xwe û zarokên xwe û yên hevalên xwe li xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî serbestbike. Û li Amûdê hin ji welatperweran mîna (Fexrîyê Mihemed) xwendegah di malên xwe de vekirin da kurd li tîpên latînî hînbibin û pê binvîsin.

Bi vî awayi lawên Kurd bi dilşewat rû kirin edeba neteweyî û civandina wan di Nadîyê de, leyistik û yaribazî û keşafa kurdî, canê neteweyî di xwîna wan de gurkir û li encam de bû hoyeke serekî ji bo pîkanîna tevgereke neteweyi li Amûdê û ji gelek rexên cezîrê xortên welatperwer berê xwe danê.

Lê belê şerê cîhanî ê dudoyan û gotgota Tirkan di serê Ferensa de, li ser vekirina Nadîyê li Amûdê, ev herdu hoyên ha hişt, Ferensî piştî çend mehan ji vekirina

Nadîyê, derê wê bigirin, bi mehana ku cenga cîhanî a dudoyan wê rabe, li eylûla /1939/.



Arif Beg

## 2 - NADÎYA KURDISTAN LI ŞAMÊ:

Di sala /1938/ de lawèn kurd yên welatperwer li tara Kurdan li şamê Nadîyeke roşenbîrî damezrandin. Herweha Osman Sebrî her li wê salê /1938/ li Şamê, bi hin xortên welatperwerên kurd re civatek bi navê yeketîya xortan pêkanîn û di pey re (Nadî) civangeh û civata xortan tevlîhevbû binava (Nadîya Kurdistan) hate naskirin. Gelek xort gihane wan û jimara wan gihabû çend sedekî. Xebata wan jî belakirina bîra neteweyî û hînkirina zimanê kurdî (xwendin û nivîsandin) bû.

# TOŞA AMÛDÊ (1937)

Di sihan de sûrîya di warekî xebatgêrî de dijî û şerê Ferensîya dikir, ya ku ji rexê (Esbetilumem) û bi nav çavdêrî hatibû sûrîyê, û welat li bin darê xwe kiribû. Ji şoreşên çekdarî destpêkirin û paşê xebata siyasî, wek: xwepêşandan û damezrandina partîyê reng reng û hemû şoreşgêr û hemû gelê sûrî havpişkî di vê xebata ha de kirin.

Ev salên ha /1935 - 1936 - 1937/ ji wan salên navdarin, ji ber ku di van salan de hêza niştîmanî ya sûrîyê di xebata xwe ya siyasî de bilindbûn û bi wê mangirtina şêstrojî ku dijiê hêza dagîrkerî ya di hundur de kirin, bihin li Ferensa cikandin.

Ji parêzgeha hisiça, bajarokê Amûdê ê leheng roleke welatperwerî a mezin para wan bû, û dijê dagîrkerîya Ferensa û peyayên wan de berxwedaneke pêlewanî kirin, û Amûdê ji welatîyên sûrîyê ên xebatker têne hejmartin.

Ferensa ya ku bê dilê xwe, serê xwe ji daxwezên welatqerwerên Sûrîyê re nivzkir di peymana /1936/ de (ewa ku ne di astê hêvîyên xebatgêran de bû). Û bi sozên xwe re ne rastbû, nemaze piştî ku (hikûmeta berê gelêrî) li Ferensa guhertîn. Û xwe sistkir û bendên peymanê nebirin serî, û ta jê dihat kelem û pîjik di rêya hikumeta niştîmanî de peydadikirin, da bikin xuyakirin ku hikûmeta niştîmanî di sûrîyê de bêkêre, û nekare

birêveberîya welat bike[1]. Serdestên Ferensî li Sûrîyê li ser darê niştîmanî pîlandikirin, û destê xwe dirêjî nav milet dikirin û rêçikên gelaçî û xerabî şanî wan dikirin. Ji mezin û serokên gelek bajaran re li cezîrê dozkirin, nameyan ji (niwênerê Samî) re li Beyrûtê rêkirin û di nav de li ser kêmahîyên hikûmeta nû binvîsin ku nekare karûbarên welat birêvebibe. Û ji niwênerê Samî bixwazin darê welat ji destê welatîyan derêxe, û wî hikmê bi xwe bispêre û yekser karûburê welat bi rê ve bibe. Lewra em dibînin fermandide, destek û komîtên birêveberî di bajarên cezîrê de pêktîne da li cihê hikûmeta niştîmanî karbikin û birêveberîya devera cezîrê bikin.

Ferensa ji Kurdan xwestibû û pêşniyara wê ew bû ku ji xwe re xwemuxtarîyek ji xwe re avakin lê Kurdan eva ha nekirin û nexwestin sûrîyê parçebikin û bi xurtî li dijê vê bîrê rawestan. Û li bajarê Amûdê bi Ferensa û bi

---

1 - Li roja 3/4/1937/ Xalid begdaş sikertêrê partîya Komonîst ya ka li sûrîyê bû, raportek da (Efîfî salih) sikertêrê Girûpa niştîmanî a herdemî, û tê de hatibû: «ji we nayê veşartin ku girêdana peymana (Sûrîyê, Ferensayê) û pêkanîna hikûmeta niştîmanî derbeke bi êşbû ji mûçexwerên dewleta faşist a Ferensî, yên ku di welatê sûrîyê du bûn Darê wan şikest, û berjewendiya wan a taybetî nema û destdirêjîya wan a sitemkarî bi ser welat de bêkêrbû. Ji bo serdestîya xwe bi ser welat de bi parêzin, ev ji rexekî û ji rexekî dî dijminahîya wan bi Berê gelêrî ê Ferensî û hikûmeta Bilom re. Rabûn di hundurê welat de pîlan ristin, ji bo ku bikarin li ber serdemê nû rêbigrin û nehêlin pêşde biçe. Gelek nexweş? peydakirin, ji ber ku hêvîya wan hebû pêvebigihin, nehêlin peymana (Sûrîya, Ferensa) ji rexê berlemana Ferensî bête morkirin. Û bidin xuyakirin ku gelê sûrîyê hîn negihaye, niwênerîya Sûrîyê bike û darê dewleteke birêve bibe. Lewra em dibînin, li ber bayê nexweşî û gelacî, beredayîkirin û serdemê nû li ber çavê gel reşkirin û bê hêvîkirin...».

peyayên wan re ketin şer. Ferensîya ji Kurdan gelek dûrkirin û gelekan bazda û ji sûrîyê derketin.

Li parêzgeha Hisiça, Ferensîyan hinek ji serokên eşîreyên (Ereb û Kurdan) û hin ji tayîfeyên Filehan dehfandin ku xerabîyan bikin û nexweşîyan bidozin da mehaneyek be ji hêzên çekdurî yên Ferensî re, xwe pê bavêje nav gorê û lawazîya hikimdarîya sûrî a niştîmanî belobike û destê xwe dirêjke ser barê navxweyîyê wêlat û bi ser de zalbibe.

Li meha tebaxê sala 1937 dûvikên Ferensa li Amûdê hinek nexweşî û xerabî peydakirin û êrîş dane ser hêzên niştîmanî yên ku pêkhatibûn ji: Eşîra Deqorîya bi serokatîya Sêîd axayê Deqorî, eşîra Gabara bi serokatîya şêxmûsê Hiso, û eşîra Temikan bi serokatîya Tahir axayê Mehmûd, û welaperwerên serbixwe jî bi wan re hebûn û hin kesên din jî nemaze xebatkerên Kurd ewên ku ji ber zora Mistefa Kemal û hevalên wî ên toranî, revîbûn, û pena biribûn Amûdê, piştî şikestina şoreşa şêx seîd.

Dema ku binav hev ketin û dabezîne hev, welatqerweran karîn dûvikên Ferensa ên yayîn ji bajêr derêxin. Roja pey re hêzên Ferensî yên çekdar û bi wan re tang û top û balafir, ji Qamişlo û Hisiça derketin û berê xwe dane Amûdê ji bo alîkarîya hevalbendên xwe bikin. Û li gora ku hêzên niştîmanî bihev re gotibûn, divîbû eşîra temika a kurdî bi hinek ji eşîrên Ereb re di rêya li nik gundê Hîmo, li hêzên Ferensî bidin, ewên ku ji Qamişlo dihatin. Lê hêzên eşîran yên Ereb soza xwe

nebirin serî û nehatin cevanê xwe û evaha jî hişt eşîra temika di kêlîka dawî de şaşbibe û bi karê xwe ranebe. Rêdane Ferensa û hêzên wan bi top û tang û balafiran li bajarê Amûdê dan. Xelkê bajêr revîn û bi hemû rexan ve çûn û li gundê cirnikê yê sûrîyê kombûn, li ser sînorê Tirkiyê, beramberî Cirnika ku dikeve hundurê Tirkîyê, û bi çend sedên mitran dûrî wê. Û bi vê Topbarandinê hin kes hatin kuştin û gelek mal, xanî, herifîn û kerîyên pez hatin kuştin.

Ferensî û peyayên xwe derbasî Amûdê bûn, bajarekî vala û dûkizênbû, dişewetî, serokên wê ên welatperwer, wek, sêîd axayê Deqorî bazdan çiyayê Şingalê li Îraqê. Lê Ferensiyan gelek xelk girtin û dûrkirin, weke, Qedrî begê Cemîlê paşê, ku yek ji serkirdayetîya civata Xoybûnê bû û serê xwe ji Ferensa re nedanî. Lewra bi xêzanê wî re dûrkirin û birin tedmurê[1].

Kuştarên xwînawî ku Kurdistanê dîtin, jicenga cîhanî a yekêve, bûyerên bi ser Kurdistan û deverê de bihûrtin û bizava kurdî ji nav wê bê encam derketin. Dewletan di deverê de li ser axa Kurdistanê musaweme kirin û li gora berjewendîya xwe û li ser hisabê windadakirina mafên neteweyî yên Kurdan, terazû xwarkirin.

1 - Qedrî beg di bîranînên xwe de dibêje ku rojnama Misrî, ji mara /3255/ li sala /1946/ çavoêketinek pêre kir û belavkir. Tê de dibêje: (Li maweya dawî Ferensa xwest li dijê Surîyê wan (Kurdan) ji xwe re bike destik û wan bikarbîn, lê ev bîrên wan ên çewt serneketin).

Ku hêza civakî ya gelê kurd ewa ku di rêça xebata xwe a neteweyî de gur û germbû, demarên wê sistbibe û dibin giranîya xwe de bikeve, û bêhêvî bibe û bawerîya milet bi serkirdayetîya derebegî û burjuwazî û ya ayînî nemahat û li derîyekî digeran ku ji wê bergeh teng derkevin û di encam de têgehiştineke neteweyî bi xurtî belabû, û di nav wî komelê ku li pêşberî serokên eşîranû rîsipîyên ayînî ji gotina - belê ezbenî - pêve nedîbûn, niha guherînek çêbû û bi pêş de diçû.

Û vî komelî dît, bê çawe dewletên Koledarî ji bo berjewendîya xwe bi çarenûsa miletan dilîzin gava gel bixwe ne hişyarbin û ji tevgera xwe dûrbin, û çawe galte bi mafên gelan dikin û di bin pêyên xwe de diperçiqênin da berjewendîya wan neşike. Û komelê Kurd dît ku serkirdayetîya derebegî û berjewazî û ya ayînî ji bo pêkanîna armancên neteweyî di rêya serbestî û serxwebûnê de serneket.

Destikek biçûk ji wan, xwe da pêş û di bergeha siyasî de xwest ku dîwarê serkirdayetîya begîtî, ayînî û ya birjewazî bişkêne, lê mixabin ew destek lawazbû hindik bû, û di tevgera xwe de hêmin bû di berê pêş de nekarî xwe ji bin serdestîya wan derêxe û ji bin kartêkirina bîrên kevin nekarî xwe rizgarke, ta ku giha pêncîyan ji vî sedî, çaxê civat û partîyên siyasî damezran û ji bin serdestîya serkirdayetîya seyasî a kevin xwe dûrkrin û ji benê hevsarê serokên eşîran, sitûyê xwe derxistin.

Di naveroka xwe de tevgereke nûbû, di xebata xwe

de paldabû komelê gelêrî, çunke ji dilê gel derketibû, ji binkeyeke gelêrî, niwênerîya armancên civakî dikir û ji bo serbestkirina roşenbîrî û gelêrî û siyasî kardikirin, û serkirdayetîya kevin bişûn xwe de hişt, ewa ku hilehil bi ser dilê wê ketibû, di pey xebata civakî de diçû, lêbelê cih di wê rêyê de jêre nemabû bîrên siyasî yên hilgirtibûn, di pêşketineka civakî de jê bihûrtibû, lewra dibin bar de ket û ev ketin di berjewendîya bîra siyasî a nû de bû.

# Jêder


1 - D. Evdirehman Qasimlo, Kurd û Kurdistan
2 - Basîl Nîkîtîn, Kurd
3 - Celîlê Celîl, ji dîroka Mîrnişînên Kurdan li dema Osmanîyan
4 - Celal Telebanî, Kurdistan û Tevgera neteweyîya Kurdî
5 - Xalifîn, Kêşa Kurdî di peywendiyên dewletî de li sedê nozdehan
6 - Kendal, vekolînek li ser Kurdan ji (Mekteba dîrrasat) ya Rêkxit wa Felestînê re
7-Malmisanij û Mehmûdê Lewendî, Rojmmegerîya Kurdî ji (1908 - 1981)
8 - Kemal Ehmed Mezher, Kuristan di salên cenga cîhanî a pêşî de
9 - Cihad Salih, Toranîya Tirkî li navbera (Usûlîyan) û Faşistan
10 - H.S. Ermistronx, Mistefa Kemal
11 - Zinar Silopî, Di rêya Kurdistan de
12 - M.A. Hesretyan, Serhildana Kurdan li sala 1925 Wergerandina Bavê Nazê
13 - Bandêt Nehro, Hinek ji dîroka Cîhanî
14 - D. Bileç şêrko, Kêşa Kurdî

15 - Mesûdê Barzanî, Barzanî û Bizava Azadîxwaziya Kurdî
16 - Kerîmê Husamî, Komara Mehabada dîmuqratî
17 - Mela Ehmedê Şûzî Bîranînên wî «Ne çapkirîye»
18 - Siyamend Osman, Kovara Lêgerînên Kurdî
19 - Nîqola Îvanof, Kovara Elwehde
20 - Mihemed Emîn Zekî, Diroka Kurd û Kurdistan

ji weşanên Kovara «Zanîn» - 7 - Qamişlo